



ZEND

HEJMAR: 5
Sal: 3 Buha: 750.000 TL

Serokatiyek:

KYROS

■ MEHMET TURHALLI

Pêrkîten di Zaravayê

Kurmancî de

■ ZANA FARQÎNÎ

Derketina Tûrantiyê

û Armancê wê

■ HESEN İBRAHİM

Anatomiya Jinan

■ GÜLSEREN DENİZ

Kêşeya Kurd

■ FEHMÎ HUWEYDÎ

Şerefname Çwar

Sede ye Nemir e

■ Dr. CEBAR QADİR

Ziman û Siyaset

■ Z. ABÎDÎN ZINAR

Ziman û Çand

■ F. HUSEYN SAGNIÇ

Çend Têbinî li ser


Cînavkên Kurdi

■ SAMÎ BERBANG

Biwêj, Peyvê

Peşîyan û Gotin

■ ÇIYA MAZÎ



ÎHSAN NÛRÎ PAŞA

Bîranîna Îhsan Nûrî Paşa û Xoybûnê rêya me ronî dike



Bi pêşengiya Îhsan Nûrî
Paşa, serhildana Agriyê, di
sala 1927an de dest pê kir.
Vê serhildana ku di bin
serokatiya Îhsan Nûrî Paşa
de nêzikî çar salan
domand, di sala 1930 ê de
têk çû. Rêexistina Xoybûnê
ku di 5 ê Kewçêra 1927an
de li Lûbnanê ji aliyê gelek
rewşenbîrên kurd ve
hatibû damezirandin û
Celadet Ali Bedirxan jî
wek serokê rêexistinê hatibû
hilbijartin, di pêvajoya vê
serhildanê de roleke sereke
leyîstibû. Piştî têkçûna
serhildana Agriyê Xoybûn
jî bêyî ku bigihîje tu
encamê belav bû.

N A V E R O K

Kovara sê mehî ya lêkolîn û

lêgerînên zanistî

(Üç ayda bir yayınlanır)

Li Ser Navê Mezopotamya

Basın Yayın A.Ş.

Xwedî:

Yıldız GÜLTEKİN

Gerînendeyê Giştî yê Weşanê

Hasan KAYA

Berpirsiyara Nivîsaran

Zeynep YAŞ

Berpirsiyarê Teknîkê

Turabi ŞEN

Cihê Kargeriyê:

İstiklal Cad. Turhol Han

No: 373 Daire: 2

Beyoğlu / İSTANBUL

Navîsana Kovarê:

Atatürk Bulvarı.

Ceylan Palas Apt.

No: 154/12 Aksaray

Tel: 527 19 11

Fax: 527 61 49

Çapxane:

KAYHAN MATBAASI

Sala Weşanê:

Payîz 1998

Di Rastiya Rojhilata Navîn de Serokatiyek: KYROS

Mehmet Turhallî 3-7

Pêrkîtên di Zaravayê Kurmancî de

Zana Farqînî 8-11

Çend Raman û Dîtin li Ser Ziman û Peyvîn Kurdî

Zagros Zerdeşî 12-16

Derketina Tûrantiyê û Armancênen wê

Hesen İbrahîm 17-21

Anatomiya Jinan (II)

Gülseren Deniz 22- 28

Kêşeya Kurdî

Fehmî Huweydî 29-31

Gelê Kurd Çima ji Dîroka xwe Fêr Nabe

Dr. Kemal Sido Kurdaxî 32-38

Serafname Çwar Sede ye Nemir e

Dr. Cebâr Qadir 49-44

Şahidek Komkujiya Geliyê Zîlan

I. İşler 45- 50

Ziman û Siyaset

Zeynel Abîdîn Zinar 51

Di Pêvajoya Pêşveçûnê de çanda Kurdî û Rewşa wê ya îroyîn

Mehmet Bayrak 52-60

Ziman û Çand

Feqî Huseyn Sağnic 61-64

Raman û Ziman

Şefik Beyaz 65-67

Başûrê Kurdistanê û Guft û Goyê Dewletan ên li ser vê Beşê (I)

Hesen Mihemed 68-73

Çend Têbinî li ser Cînavakêne Kurdî

Samî Berbang 74-76

Çend Şîretên Seîdêne Kurdî

Seîdê Kurdî 77-79

Biwêj, Gotinêne Pêşiyân û Gotin

Çiya Mazî 80-83

Li ser Gelşen me yên Vekîteyê

Zana Farqînî 84-87

Ber Cahê Serekê Encumana Rastnivîsa Zimanê kurdî re

Feqî Huseyn Sağnic 88-92

Ji Encama Rastnivîsa Zimanê kurdî re

Nevzat Sağnic 93-95

Derbarê rastnivîsîna herfîn -î, -û, -ê berya -y, -ye de

Ali Karadeniz 93-95

Xwendevanê hêja!

Piştî demekê dîsa em li pêşberî we ne. Di vê demê de, Enstîtuya Kurdî li ber xwe da, ji bo ku ku bikaribe kar û barê xwe birêkûpêktir bike. Helbet hinek pêşveçûn pêk hatin. Di barê serhildana ku bi navê "serhildana Şêx Seîd" tê zanîn de, di barê jînenegeriya Celadet Bedirxan de, li ser dîroka berxwedanê ya kurdan Enstîtuyê semîner û panel lidar xistin. Ji bo şehîdê nemir yekemîn serokê enstîtuyê li Îzmîr, Mêrsîn û Stenbolê me hinék çalakî pêk anîn. Pênc heb pirtûk me diyarî gelê xwe kirin. Xebata Kovara Zendê û xebatê Enstîtuyê ji hev ne cihê ne. Hevûdu temam dikan. Hêvî û armanca me ew e ku em bikaribin nûnertiyyê Enstîtuya kûrdî li Amed, Enqera û Îzmîrê bidin avakirin. Ji xwe a niha li van deveran gelek hevalên me mîna nûneran dixebeitin. Mînak li Enqerê, li ser navê enstîtuyê qursên zimanê kurdî têne dayin, li van cihan endamên enstîtuyê kar û barê berhevkarî û lêkolînê dikan. Em hêvîdar in ku avahiyêne me jî dê li wan deveran bêne vekirin.

Wekî din ji hêlekê ve jî xebatê têkuzkirina rastnivîsa zaravayê kurmancî hatin domandin. Me di vê hejmarê de cih da hinek raporê di barê rastnivîsa çend xalên ku dubendî li ser wan heye. Nivîsarên di dawiya kovarê de, yên Zana Farqînî, F. Huseyn, Nevzat Sağnîç û Ali Karadeniz di civînê rastnivîsê de weke rapor hatine pêşkeşkirin. Me ji aliyê rastnivîsê qet destê xwe neda van nivîsaran. Mînak birêz F. Huseyn Sağnîç daçeka ku redaksiyona Zendê bi awayê "di.....de" bikartîne, bi awayê "di.....da" bikaraniye. Ji bo ku xwendevanê me cûdahiyêni di navbera bendant de rind bikaribin bibînin, me weke îstisna ev her çar nivîsar, ji hêla rastnivîsê ve rast nekirin.

Banga me ya li hevalên di zindanan de û xwendekarêni zankoyan bi awayekî erênî encam da. Bi dehan xwendekarêni zankoyê serî li enstîtuyê dan, ji bo perwerdehiya zimanê kurdî. Her wekî tê zanîn ku ji bo şes mehan perwerdehiya zimanê kurdî di 15ê kewçêra 1998an de, li avahiyâ enstîtuyê destpêkir. Ji zindanan gelek name û nivîsar ji me re hatin. Em wan dinirxînin, yên ku hêjayê çapê bin, emê biweşînin.

Hevalê me Mehmet Turhallî yê ku di zindanê de ye, di nivîsara xwe ya bi navê "Kyros"de, li ser mîtolojiye ku para me kurdan jî tê de heye rawestiyaye. Jenosîda Geliyê Zîlan a ku li herêmê jê re "Siyaseta Gelî" tê gotin, ji devê Xalê Heyder hatiye vegotin. Di dema qirkirinê de, Xalê Heyder di pêçekê de bûye. Ew di bin laşan de, ji mirinê rizgar bûye. Lê laşê wî ji derba singoyê Roma Res nefelitiye. Endamê enstîtuyê i. İşler hevpeyvîn di gel wî çêkiriye. Di hejmara pêşıya me de jî li ser Tevkuiya Gelî em dê xebateke i. İşler biweşînin.

Nivîsara Hesen Mihemed a di barê Başûrê Kurdistanê de, dê weke du beş were weşandin. Di vê hejmarê de anatomiya jinan ku domahîka nivîsara Gülsêren Deniz e, cih girtiye. Di hejmara pêşıya me de, em dê cih bidin nivîsarên di heqê anatomiyyê de yên nivîskarêni cihê.

Heta hejmareke din, rojêñ tijî ronahiya zanistê û kelepora kurdî yên we bin...

DI RASTIYA ROJHILATA NAVÎN DE

SEROKATIYEK

K Y R O S

MEMET TURHALLI

(Ji tirkî: Kawa Nemir)

Di dîroka Rojhilatanavîn de, çawa ku gelek desthilatdarî kumişîne, gelek kesayetî û serokatî jî ketine nava hev, di mercen berçav de xwe dane pejirandin. Ji ber vî hawî, carinan nav û pênasên cuda girtine, carinan bûne efsane, bi hin kesan bûne leheng, li gorî hinan jî bûne dijmin.

Ev tiştê navbûrî, encama rewşa Rohilatanavîn ya ev çend dewlemend û aloz, bitaybetî jî ya dewlemendiya erdnîgariya Mezopotamyayê, ya eşîran û ya tevlihevbûna gelan e. Kyros jî wek encameke erdnîgariyeke bi vî rengî û kumişînê derketiye holê û di dîrokê de bûye efsane; carinan wek efsane, carinan wek Keyxusrev, carinan wek Kyros derbas bûye û bi vî navî hatiye nasîn. Çavkaniya ku herî zehf çêli Kyros dike û di barê wî de heya iro agahî râgihandiye me, Dîroka Heredot e. Bi qasî ku jidayikbûna Kyros bûye efsane, jiyana wî

jî bûye efsane. Mercen beriya jidayikbûna Kyros, mercen zor dijwar in: Di wê heyamê de, piraniya herêmê di bin serdestiya Medan de ye, Med ji bo desthilatdariyê ketine şerê navxeyî, binemal, qebîle û eşîretên din û nemaze qebile û eşîretên Pars di xebata serdestbûnê de ne. Kyros, têkşikîna serdestiya Med, destpêka desthilatdariya Pars e. Di Şahnameyê û hin berhemên dîrokê yên din de, weha neyê qalkirin jî, di dîroka gelên Aşûrî, Babîl û Cihûyan de, bi vî rengî jê tê behskirin û ev agahiya dîrokê rastî wê heyamê tê.

Kyros kî ye? Ji Mandaneyâ keça Astîages bûye, kurê Kambyesê ji qebileyên Pars e. Mercen zayîna Kyros leqayî heyameke têrbûyer û laleşe tê. Pêvajoyeke ku di nava serayê de, pevçûna desthilatdariyê tûj bûye û ji bo ku desthilatdariya malbat û êla xwe têkûz bike, Astîages xwe ji kuştina lêzimên xwe yên herî

nêzîk nade alî. Astîagesê ku di bin bandora dek û dolabêni li hundirê serayê û mirovên olê de ye, xewneke ku dîtiye dide şîrovekirin û ji bo ku ji desthilatdariyê nebe, di heqê zarokê Mandaneyê yê hîn jidayiknebûyî de biryara kuştinê digire. Li jêr vê, keça xwe di serayê de, di bin sehîtiyê de digire. Rewşeke weha, tundrawiya pevçûna ku ji bo desthilatdariya serayê rû daye, dide der. Çawa ku Kyros ji dayik dibe, Astîages wî dide yek ji mirovên xwe yên herî nêz, Harpagos û jê dixwaze ku, zarok bikuje. Ev rewş her diçe pozberiyê hîn tûjtir dike. Harpagos, bê hemdê xwe be jî, zarok nakuje, wî dide mirovên xwe. Û ji wan dixwaze ku, misoger wî bikujin. Ev mirov zarok nakuje, ji dêlva vê wî didin gavanekî ku keriyên Astîages diçêrîne. Bi rasthatiniyekê siûda zarok dişixule: ji ber ku jina gavêngiran bû û zaroka ku çêbû mir, dergehê jiyanê ji Kyros re vebû. Gavêngiran ku xemgîniya jina xwe dit, Kyros da jina xwe. Jinikê bi bextewariyeke mezin zarok hilda û mezin kir. Erdnîgariya ku Kyros lê jiyaye, Akbenetan (ango herêma ku iro jê re Hemedan dibêjin) gelekî çiyayî bû, li wî zozanê bilind bi newalên kûr, deşten bilind ên mezin û çeregehê fireh hebûn. Mercen civakî yên ku ew tê de bû, dijwar bûn. Mirovên vê deverê xizan bûn, debara xwe bi gavanî û şivaniya pez û dewarêne keysêr û dorhêla

serayê dikirin. Kyros di mercên gelekî çetin de, mezin dibe. Mercên weha dijwar, gelekî bandorê li Kyros dikan û dihêlin ku, ew hînî xisletên hîn erêni bibe. Ev merc dibin sedem ku ew, besên civakî yên herî xizan û jêr binase, bi wan re têkiliyan dayne û mercên civakî yên civakê fêm bike. Digel temenê xwe yê biçûk, bi pêşk û behreya xwe zarokan li dora xwe vedihewîne. Ne bi tenê zarokên ji beşa xwe ya civakî, belê zarokên zadeganê wê heyamê jî dixe dû xwe. Û bi gewşinênen xwe yên rêberiyê wan bi rêexistin dike, li pey xwe dikişkişine. Hê di deh saliya xwe de, lîstikên ku bi zarokan re dilist û behreya wî ya birêvebirinê, nasnav û kesayetiya wî didin der. Rojekê, dema ku li gund bi hemşalên xwe re dilist, ji alyê wan ve wek keyser hat hilbijartin. Ew jî hevalên xwe kom bi kom vediqetîne û peywrekê dide her yekî. Hinan dike leşker, peywira serayê dide hinan, hinan dixe beşa istixbarat û nûçevaniyê, yekî jî wek Çavê Keysêr bi peywir dike. Ji van zarokan yek jî, kurê yek ji zadeganê Medî, Artanbares e. Rewşa ku zarok peywira xwe bi cî nayne, hêrsa Kyros tîne û emir dide zarokan ku, li vî zarokê guhnedér, li vî zarokê ku peywira xwe neaniye cî cezayekî giran bibirin û cezayekî giran lê dibire. Zarok diçe vê rewşê ji bavê xwe re dibêje, ji bavê xwe dixwaze ku, Kyros ceza bike. Artanbares derdikeve

pêşberê Astîages û dibêje, "kurê gavanê te, kurê min kuttaye. Ji ber vê, divê tu ji heqê zarok û malbata wî derkevî". Di demeke kin de, Kyros û malbata wî ya gavan derdixin pêşberê Astîages. Astîages vedigere ser Kyros û jê re dibêje: "Te li kurê vî mirovê li cem min xwedî qedrekî giran, him jî te dizanibû ew ji kîjan çînê ye, heqaret kiriye." Li ser vê, Kyros: "Ezbenî, tiştê ku min kir, dadperwer e. Zarokên gundi, ew jî di nava wan de bû, dema ku dilîstin, ez ji xwe re kirim keyser. Wan di nava xwe de ez ji vê peywirê re guncaw diditîm. Zarokên din emirên min bi cî dianîn, lê ev beredayî derket. Û bi van ki-

rinên xwe jî nesekinî, dawiyê min jî ew sezand. Heke pêwîst be ez ji ber vê bêm cezakirin, fermo ezbenî." Li milekî ji vê helwesta Kyros a birtyardar re kêfa Astîages dihat, li milekî din jî tengezar bû. Rê nedan ku, Kyros ji serayê derbikeve, ji gavanan pirsa vî zarokî kîrin bê ka zarokê kî ye. Gotin ku, yê nebêje wê bi mirinê bê cezakirin. Bi vî awayî, Astîages tê derdixe zarok ê kî ye. Û guhlênekirina Harpagos bi awayekî giran ceza dike. Astîages zarokê Harpagos dide kuştin, pê dide xwarin. Bermayıyan jî dixe selikekê, dide destê wî û pê re dişîne mala wî. Harpagos ji ber vê rewşê gelekî sil dibe; ji bo tolhildana vê dest bi şerekî dirêj dike. Astîages ku bi vê rewşê dihese, li Kyros dibore. Pişti ku Kyros bi demekê li ba xwe digire, wî li gel çend mirovîn xwe dişîne ba Parsan, li ba dê û bavê wî yên rastîn. Pişti ku dê û bavê xwe yê rastîn dinase û hînî wan dibe jî, malbata gavan a ku ew mezin kiribû ji bîr nekir. Bavê xwe yê gavan Mîtriadates, dayika xwe Kyno an jî Spako bi hurmet bi bîr tîne. Gel, nemaze jî Pars, jiyana zarokatiya Kyros dînepixînin. Dibêjin ku, Kyros bi demeke dirêj li çiyê şîrê dîlekê mîtiye, dîlê ew mezin kiriye. Ev rewş wî derdixe asta behîtiyê û gel wî dihewîne. Di vê qonaxê de, Kyros mezin dibe. Di encama behreya xwe, pêşk û jîrtiya xwe, nêziktêdayîna wî ya li hemberî mirovan û nakokiyê berçav ên domdar

Ev tiştê navbûrî,

encama rewşa

Rohilatanavînê ya ev

çend dewlemend û

aloz, bi taybetî jî ya

dewlemendiya

erdnîgariya

Mezopotamyayê, ya

eşîran û ya

tevlihevbûna gelan e.

Kyros jî wek encameke

erdnîgariyeke bi vî

rengî û kumişînê

derketiye holê û di


dîrokê de bûye efsane;

de, dikeve lêgerînekê. Bi vî awayî, bi balkêsiya xwe û bi taybetiyêن xwe dest bi birêxistinbûnê dike.

Kyros çavdêriya şerên li serayê yên ji bo desthilatdariyê, rêveberiya desthilatdariya Astîages a çewsandîner û despotik, di heman demê de xwînmij û xerab baş dike. Û ji van nakokiya bi awayekî baş sûd werdigire, bi riyên curbecur pêwendîyan bi Harpagos re datîne û bi pêş dixe. Bi vê me-bestê dikeve lêgerîna hevkariya bi Medan re. Azweriya Harpagos a tolhildanê ji Astîages, keyseke bêhempa dide Kyros. Kyrosê bi lawaziyê Medan hesiyayî, bi riya bikaranîna gewşînên xwe yên serokatiyê dest bi birêexistinkirina lêzimên xwe û dorhêla xwe dike. Harpagos her dem bi Kyros re di peywendiyê de ye û her cure rûdanêni li desthilatdariyê, der barê keyseriyê de radigihîne Kyros. Dawiyê Harpagos keyseriyê pêşniyarî

Kyros dike, ev yek jî danex-veyen Kyros ên desthilatdarbûnê û cehda wî zêde dike. Birêexistinbûnê hîn leztir dike. Gava ku vê dike, bi nimûneyen berçav dorhêla xwe li dora xwe dicivîne. Piştî ku Harpagos fermandariya Parsan dide Kyros, Kyros êlên Pars bi lez dide hev û bi alîkariya Harpagos jî hemî mercen desthilatdarbûnê amade dike. Êlên Pars vedixwîne kombûnekê, ji wan dixwaze ku, her yek bi xwe re dasekê bîne. Ev rewş nîşan dide ku, Kyros hewl dide xwe bi mînakêñ berçav bi rîexistin bibe. Hemî eşîret di demeke kin de, li erdekî fireh ê ku Kyros destnîşan kiribû û devî, kelemên wî bûbû belaya serê wan, civiyan. Emrê wî yê pêşîn, di rojekê de vekirina vî erdê fireh û berî ji çandiniyê re ye. Emrê wî yê duyem ew e ku, ewê hemî dotira rojê werin û pê re xwarinê bixwin. Roja duyem Hyros hemî derfetên xwe se-

ferber dike, ji hemî êlan re bergeşike dewlemend vedike. Di vê kirina Kyros de armanca wî ew e ku, bi awayekî şenber nîşanî wan bide ku, ew bi bikaranîna renc û danex-veyen xwe bi awayekî rast û birêexistinbûna xwe ya birêkûpêk wê bikarin serdestiyê bi dest bixin û ji serdestiya Medan rizgar bibin. Wî bi vî hawî hemî eşîret bi rîexistin dikirin û yekîtiya wan didamezirand. Hêsaniya rizgariyê vedibêje, ji wan re dibêje ku, ew jî dikarin bibin rêveber û dikarin ji desthilatdariyê sûd werbigirin. Ji bo pêkanîna vê jî, ji wan dixwaze ku, ew ji Astîages veqetin û bibin serdesten xwe. Kyrosê ku di vê de bi ser dikeve, di demeke kin de Parsan li dora xwe kom dike, piştî ku wan tîne radeya hêzeke şer a xurt, bi alîkariya Harpagos jî di serayê de hevkariyên girîng ava dike. Harpagosê ku ji aliyê Astîages ve wek serfermandar hat hilbi-



Kumbeta Kiryos ya li Pasargate

jartin, bi Kyros re ket hevkarîyê û di şerê li dijî Astîages de Astîages têk birin. Astîages dîl girt û tu nebaşî lê nekir. Bi vî hawî di demeke kurt de, him bi piştgiriya Medan, lê bi giranî alîkariya Parsan desthilatdarî hilda destê xwe. Di vê guherîna desthilatdariyê de, mirov nikare bi tenê behsa serdestiya eşretekê an jî qebîleyekê bike. Kumişîn û hebûna çandêñ hevpar; dê bêtir rûdanî û di cî de bibe ku, mirov vê guherîna desthilatdariyê wek di serayê de guherîna desthilatdariyê ya navxweyî şîrove bike.

Kyros li dijî gelên di bin serdestiya xwe de, bi taybetî jî li dijî Medan şerekî eşkere na-meşîne. Ji kevneşopiya desthilatdariyê ya Medan sûd werdigire, şarezatiya wan a di hunera şer de û taktikên wan hîn bêtir bi pêş ve dibe, van dide destê Harpagos. Berê pêşîn berê xwe da qiraxên Anatoliya û Egeyê. Bi mebesta dagirkirina wan deran û firehkirina tixûbêñ keyseriya xwe, derdiikeve seferê. Berî ku derkeve seferê, wî qasid dişandin herêmên ku wê dager bikira. Ji wan dixwest, ku ew serî bitewînin û li dijî wî dest daynin, wê tu xisar negihîje wan. Gava wan ev tişt dipejirand, wî ew der dager nedikir, rî di-da wan ew ji layê rîveberên xwe ve bêñ birêvebirin. Dab û nîrîten wan nas dikir, hurmet ji nîrxên wan ên gelêri re nîşan dida û bi wan re baş dida û distand. Ên ku li ber desthilatdariya wî radibûn, welatêñ

ku nedihatîn rayê bi riya çend peyamên hişyariyê hişyar dikir, paşê ew welat dager dikir. Rîvebereki ku ji aliyê gel ve dihat pejirandin, hildibijart; li gor awat û xwestekên gel tevdigeriya û bi vî awayî gel di-kişand aliyê xwe û ji wir derdiket, diket riya xwe. Bi vê ramyariya xwe ya zîrek û têgiha xwe ya rîveberiyê ya fireh, bê şer gelek welat xistiye bin destê xwe, hêz û serdestiya xwe bi wan daye pejirandin. Rîveberiya dewletê bi awayê satrapiyan saz kiriye, bi hîn firehtir sazkirina van jî derfeta birêvebirinê hîn hêsanter bi dest xistiye. Wî rîveberî her dem bi du rîveberan meşandîye. Di vê kirina wî de, armanca wî ev e ku, rîveber dest di aloziyan nedin û ku di rewşa nexweşî an jî mirina yekî de ciyê hevdu bigirin. Dijîtiyêñ her duyan jî dianî hev, ew di bingeha reqabetê de didan xebitandin, bi vî awayî bi girtina sehêtiyê di destê xwe de rîveberiya xwe hîn hêsanter dixe-bitand.

Kyros di demeke kin de herêmên heyâ Anatoliya, Ege, Zeryaya Reş û Qefqasyayê hilda bin desthilatdariya xwe. Pişt re berê xwe da Babîla ku şaristaniya Xalde ye. Armanca wî ya di vir de, him dagerkirina van herêmên dewle-mend him jî dixwaze dijmînekî ev çend dewlemend û hêzdar ji navê rake û guhê wî ji dijmînekî bimetirsî û nêzîk biqere. Tevî ku bajarê Babîle bi hêz hatibû zeximandin, Kyros bi xêra behreya xwe ya

xurt, bi taktikên rîveberî û leşkeriyê yên hêzdar artêşa xwe, di du baregehan de vedihewîne, çemê ku di Babîle re derbas dibe dike du felq. Di pey re bajêr ji bo salekê dorpêç dike. Babîlî difikirîn ku, wê av rabe û Kyros hêzên xwe bi şûn ve bikîşîne, lê Kyros bi azîneyêñ xwe fenekî li wan dike, ciyên avzêlk dike gol. Yekîneyêñ baregehê pê re, xwe dikişîne van golên navborî. Ji çemê ku di heman wexî de, hatibû zuhakirin û besterûbara wê hatibû guhar-tin bi awayekî lez avête ser bajêr û bi carekê ve bajar hilda. Tu zirarê nade bajêr. Ji edet û tore û baweriyêñ wan re hurmetê nîşan dide, diçe peristgehêñ wan û dibêje ku ew dikarin baweriyêñ xwe bidomînin. Dirav û her cure alîkarî pêşkêşî cih û mirovên wan ên olê yên ku hatibûn koleki-rin dike û wan dişîne welatê wan Filîstînê. Bi ser de jî, diravê peristgeha ku dê li Filîstînê bihata avakirin, ji gencîneyê da. Piştî ku rîveberen herî yên bajêr di ciyên wan de dihêle; welêt wek satrapiyan saz dike, ji Babîliyan dixwaze ku, ew bi tenê artêşa wî aş bi-kin û pêdiviyêñ artêşê yên din pêk bînin û ji wir vedikişe.

Kyros piştî ku Babîl dager kir, berê xwe bi Qefqasan ve dike. Nemaze Îskît an jî Mû-saggetên ku gelekî şervan û barbar e carinan êrîşen xwe heyâ welatê Pars fireh dikin, piştî ku her derê talan û wêran dikin, heyâ pişta Zeryaya Hezarê vedikişin. Ev gelê ku

jiyanekê koçerî didomîne bi van êrîş û nijdeyên xwe gele- kî zorê didin Kyros û di dawi- ya hemî şeran de, tu encame- ke misoger nayê wergirtin. Kyrosê ku vê rewşê dinirxîne zewac pêşniyarî keybanûya ku di vê heyamê de, li ser karê rêveberiyê ye dike. Ar- manca wî, vî gelî têxe bin desthilatdariya xwe, êrîşen a- rasteyî welatê xwe birawestîne û ji hêza wan a şer sûdê werbigire. Keybanû vê pêşni- yarê napejirîne. Hal û hewal weha, Kyros amadehiyeke şer a pir hêzdar dike û di demeke kin de, vê amadehiyê kuta di- ke. Ji bo ku di vî şerî de bi ser bikeve, bi hemî fermandarên artêşê re diaxive, ramanên wan hîn dibe. Dema ku vê di- ke, di heman wextî de, tu carê dev ji xebata kolektîv berna- de, ji bo ku besera artêşê û fermandaran xweş bike, her cure derfetê dide destêwan. Bi vî awayî, him fermandarên

wî jê yeqîn dikin, him jî ba- weriyê dide wan. Ev rewş di- ke ku şervan û fermandarêñ wî ji şeran biserketî derkevin. Kyros piştî ku ji Erezê derbas dike, artêşê vedihewîne û ve- kişîna Mûsagetan a domder Kyros û artêşa wî diwestîne. Li ser vê yekê, hemî fermandarêñ xwe li dora xwe dicivîne û ji bo çareseriya vê rewşê bi wan dişêwire. Piştî kurte- demekê, li hemberê Mûsage- tan feneke şer a mezin li dar dixe. Hinek erzaqê artêşê û bi tibabeke qewî zêde şerab li gel gelek şervanên xwe li wir dihêle û ji mirovan dixwaze ew bi şev êgir vêxin. Ew bi xwe bi roj ji wir vedikişê. Mûsagetên ku bi vê nizani- bûn, bi vê fena şer xapiyan, piştî ku êrîşî hêza li wê derê heyî kirin û ew tunekirin, dest bi vexwarina wê şerabê dikin. Di nava van de, kurê keyba- nûyê jî heye. Kyros ji nişkê ve davêje ser wan, serên pirî

wan bi şûr hildiqetîne û kurê keybanûyê jî dîl digire. Key- banû xeberekê dişine da ku Kyros kurê wê berde. Kyros kurê keybanûyê berdide. Kurê wê çawa ku serbest di- be, xwe dikuje. Li ser vê yekê, keybanû sond dixwe ku tola kurê xwe hilîne û hemî Mûsagetan dide hev û bi Kyros re dikeve şerekî çetin û bêeman. Artêşa Pars di şer de têk diçe. Keybanû ji bo ku sonda xwe bibe sêri, heyfa kurê xwe ji Kyros bistîne, di qada şer de li Kyros digere. Rastî cendekê Kyros tê. Digel vê, ji bo ku sonda ku xwaribû bi cî bîne, serê Kyros dixe e- yarê xwînê.

Kyros 29 salan desthilatda- riyyê di destê xwe de digire. Di demeke kin de, bi kesayetî, bi rêveberiya xwe ya rast û bi jîrtiya xwe ya leşkerî gelek herêman vedigire. Bi kesayetiya xwe ya zêde birtyardar û bi binyatiya xwe ya jixweba- wer hêz û bawerî daye dora xwe; dilnizmiya wî û nasîna wî ya çin û tebekêن civakî ew nêzîkî gel kiriye û bi gel ve bûye yek. Ji aliyê gel ve jî, wek rîberekî sirûstî, henûn hatiye pejirandin. Kyros di domahiya serdestiya xwe de, gelê nêzîkî xwe azad hiştîye, ji ber çand û dirûvgirtina ku pê mezin bûbû û bêhnfirehi- ya wî ya li bingeha rastiya ci- vakê û efsanebûna wî ew qe- wî zêde bilind û qedirgiran kiriye, di nava gelan de, piştî mirina wî jî bi qencî jê hatiye qalkirin û her dem hatiye bi- bîranîn.

Xwarina cinazeyê ya Persiyan



PÊRKÎTÊN DI ZARAVAYÊ

KURMANCÎ DE

ZANA FARQİNÎ

Zimanê me, zimanekî welê ye ku hem ji pêş, hem ji par û hem ji navê ve qertafan (lêkan, pirtikan) distîne. Em dê di vê xebata xwe de, li ser pêrkîtan (pêşgiran) û navkîtan (navgiran) rawestin. Di hejmara pêşîn a Zendê (Dahûrîna li ser parkîten di kurmancî de) de, ez bi awayekî berfireh li ser parkîten di zaravayê kurmancî de rawestiyabûm.

Hema em di destpêka vê nivîsa xwe de xalekê aşkere bikin ku, zaravayê me kurmancî herî bêhtir ji par re (ji paş ve) qertafan distîne. Ji ber ku mijara pirtikan, qertafan hîn bêhtir zelal û aşkere bibe, ez pêwistî bi ravekirina wan dibînim. Ji ber ku, di hin nivîsên li ser qertafan de, bi rastî ji ne zelalî û tevlihevî heye. Nehatiye diyarkirin bê ka ji çi aliyî ve dest avêtine qertafan. Ji lew re ji beriya ku ez dest bi raberkirina pêrkît û navkîtan bikim, min divê ku ez hinek li ser qertafan û terîfa wan bisekinim. Ji ber ku, çarçoveya xebatêni vî teherî nayê diyarkirin, tevlihevî derdikeye holê. Lewma pêwistî bi daxuyanîkirinê heye. Pêşî em qertafê rave bikin, bê ka ew çi ye, bi çi erkî radibe...

Qertaf

Ji wan hêmanan re tê gotin ku bi alîkariya wan, erka (wezîfa) peyvan di nav hevokê de, tê xuyakirin û her wiha dîsa bi alîkariya wan ji navdêran, an ji, ji peyvîn ji celebên lêkeran, peyvîn nû têن çêkirin. Em vê ravekê hîn zelaltir bikin. Em bi saya qertafan peyvîn nû çedîkin û di hevokê de ji erkên peyv û bêjeyan hîn dibin.

Di rêzimaniya (gramera) giştî û gelemerî de, sê cure qertaf hene: pêrkît, parkît û navkît.

Çawa di destpêkê de ji me dabû xuyakirin, di zimanê me de ev her sê çeşid qertaf ji hene. Qertaf ji, îcar li gorî bastûrî (binyadî, bunyeyî) û fonksiyonî ve li du besan lêk ve dibin.

Ji aliyê bastûrî ve qertaf

Ev qertaf di nav xwe de, li du besan par dibin:

I) *Qertafen sade*: Ji wan qertafan re tê gotin ku bi tena serê xwe ne û bi erka qertafen çêkirinê an ji çivanê/kêşanê radibin.

II) *Qertafen hevedudanî*: Ji wan qertafan re tê gotin ku bi alîkariya du qertaf an ji çend qertafan hatine pê û bi erka qertafen çêkirinê an ji çivanê radibin.

Hema em di destpêka vê nivîsa xwe
de xalekî aşkera bikin ku, zaravayê
me kurmancî herî bêhtir ji par re
qertafan distîne.

Ji ber ku mijara pirtikan, qertafan hîn bêhtir zelal û aşkere bibe, ez pêwistî bi ravekirina wan dibînim. Ji ber ku, di hin nivîsên li ser qertafan de, bi rastî ji ne zelalî û tevlihevî heye. Di rêzimaniya giştî û gelemerî de, sê cure qertaf hene: pêrkît, parkît û navkît.

Çawa di destpêkê de ji me dabû xuyakirin, di zimanê me de ev her sê çeşid qertaf ji hene. Qertaf ji, îcar li gorî bastûrî û forîksiyonî ve li du besan lêk ve dibin.

Ji aliye fonksiyonî ve qertaf

Qertaf, ji aliye fonksiyonî ve jî dibil du bes:

I) *Qertafa çêkirinê*: Ev qertaf têr pêşî û paşıya peyvê. Bi taybetî qertafen ku têr paşıya peyvê, divê ku bi rayek an jî gewdeya peyvê ve bizeqin. Bi alîkariya van qertafan peyvê dibe xwediyê wateyeke nû.

Bi van qertafen çêkirinê, mirov dikare bi hêsanî ji çar aliyan ve peyvên nû biafirine, ku her yek ji van xwedî erk û vatiniekê ye:

1. Qertafen ji navdêran navdêr çêkirin
2. Qertafen ji navdêran lêker çêkirin
3. Qertafen ji lêkeran navdêr çêkirin
4. Qertafen ji lêkeran lêker çêkirin

1. Qertafen ji navdêran navdêr çêkirin: Bi van qertafan, peyvên ji familyeya navdêran têr çêkirin: kurd-*i*, jin-*ik*, nêz-*ing*, ser-*ek*, keçel-*ok*, tirs-*onek*, deyn-*dar*...

2. Qertafen ji navdêran lêker çêkirin: Bi van qertafan, ji navdêran lêker têr çêkirin. Ev qertaf hem parkit û hem jî pêrkît in. Ji bo yên parkitan: Ji nav jî xuya dibe ku qertaf têne dawiya navdêr û jê lêker tê çêkirin.

Nimûne: nav-*andin*, hundir-*andin*, tep-*isandin*, rep-*isandin*, kel-*ijandin*, nerm-*ijandin*, nav-*în*, hundir-*în*, tep-*isîn*, rep-*isîn*, kel-*ijîn*, nerm-*ijîn*...

Nîşe: Bi parkitên -*andin*, -*isandin* û -*ijandin* lêkerên gerguhêz û bi yên -*în*, -*isîn* û -*ijîn* jî lêkerên negerguhêz têne çêkirin

Bi pêrkitan ji navdêran lêker çêkirin; ev qertaf têr pêsiya navdêr û wisa lêkereke din tê himatê. Nimûne: ve-rê kirin, ra-dest kirin, ra-çav kirin, ra-rê kirin, der-dest kirin...

3. Qertafen ji lêkeran navdêr çêkirin: Tiştê ku ez dikarim, der barê vê mijarê de bibêjim ev e; bi saya navkîteya “-a-”yê ji rayeka raweya fermanî ya lêkerê, navdêr tê çêkirin. Nimûne: bi-şewit-e; /bi-/ qertafa raweya fermanî, /şewit/ rayeka lêkera fermenî û /-e/ jî qertafa kesê yekejmar ê sêyemîn e. Eger em

/bi-/ û /-e/yê biavêjin, di destê me de tenê /şewit/ dimîne. Gava ku em /-i-/ya di /şewit/ de jî hilînin û /-a-/yê bixin şûnê, wê çaxê /şewit/ dibe /şewat/ û bi vî hawayî, ji lêkerê navdêr tê bidestxistin.

Peyvên mîna lebat, tebat, leqat, jiyan, geran, çivan, kêşan tev bi vê riyê hatine çêkirin.

Nîşe: Di hin lêkeran de di şûna (-i-/yê de /-i-/ derdikeye pêşberî me, lê eynî wekî /i-/yê muamele lê tê kirin. Nimûne: bi-jiyîn-e; ku em /bi-/ û (-e/yê biavêjin dimîne li rastê /jiyîn/. Em /-a-/yê bikin dewsâ /-i-/yê wê çaxê /jiyîn/ dibe /jiyan/...

4. Qertafen ji lêkeran lêker çêkirin: Di kurmancî de, em tenê dikarin bi alîkariya pêrkitan ji lêkeran lêker çêbikin. Nimûne: ber-dan, da-dan, der-anîn, hil-dan, ra-dan, ro-kirin, ve-dan, vê-xistin, wer-kirin, tê-gihîstîn...

II) *Qertafa kêşanê*: Ev qertaf di wateya peyvê de tu guherîn naynîn pê, tenê wateya “rewş” û “kes” didin peyvê. Bi gotineke din, bi alîkariya van qertafan têkiliya navdêr û peyvên ji familyeya lêkaran, di nav hevokê de, bi peyvên din re tê danîn. Ji van qertafan re vegetandek jî tê gotin. Ev qertaf jî di nav xwe de dibil du bes:

Qertafen çivanê yên navdêran û qertafen çivanê yên lêkeran.

Her wiha ev her du bes jî di hundirê xwe de li çend besêñ din par dibil. Lê ji ber ku em ji mijara xwe ya hîmî averê nebin, em dê li ser wan ranewestin û em dê vegeerin ser babet xebata xwe ya hîmî.

Me di serî de dabû zanîn ku mijara xebata me li ser pêrkîten di zaravayê kurmancî de ye, lê me pêwistî bi şîrovekirina qertafan dît, ji ber ku gava qertaf (an jî pirtik) tê gotin, çarçove fireh û ne diyar e. Nayê zanîn bê ka ji kîjan aliyan ve li ser qertafan hatiye rawestandin.

Ji bo ku mijar zelal û ronî be, me hewcedarî bi destpêkeke welê dît. Çimkî carinan ku em di gotar û pirtükên li ser zimanê kurdî de rastî

mijarêni li ser qertafan têñ, em ji xwe re heyirî dimînin. Hem mijar tevlihev û ne zelal e û hem jî, dahûrîna (analîza) li ser mijarêne xurt e. Em dikarin bibêjin ku, di wan gotar û pirtûkan de qertaf û peyv hatine tevlihevkirin.

A rast min dixwest ku ez yeko yeko li ser wan xebatan rawestim û wisa li ser mijara xwe hûr bibim, lê wê ev xebat pir dirêj bibûya, loma jî min dev jê berda. Ji bo ku mebesta me baş xuya bibe em dê li ser çend mînakan rawestin; bêyî ku em navê nivîskar bi lêv bikin.

Camêrek, di mijara ser pêrkîtan de ev nimûne dane: *dargwîz, dartû, rengdêr, rengpişê, wargeh, barkirin, bazdan, sazende....*

Di van nimûneyan de tu pêrkît nîn e; -dêr, -geh û -ende parkît in; dargwîz, dartû û rengpişê jî navên hevedudanî ne; barkirin û bazdan jî lêkerên hevedudanî ne. De îcar hûn bala xwe bidine ravekên zimanزان!...

Em qenc pê dizanin ku zimanê me ji bo pêkanîna navên hevedudanî gelek gunçan e. Peyv dikarin rasterast bêne cem hev û navekî hevedudan bînin pê, her wiha dikarin berevajkî jî, bêne nik hev. Nimûne:

rû + nivîn = rûnivîn
 der + pê = derpê
 ber + çav + k = berçavk
 bin + kirâs + k = binkirask
 nû + bihar = nûbihar
 xwe + ser = xweser
 xwe + ger = xweger
 dar + gûz = dargûz
 ser + xwe + bûn = serxwebûn
 bin + dest = bindest
 ser + dest = serdest
 nav + çav = navçav
 nav + ser = navser
 tev + li + hev = tevlihev

Ez dibêjim qey bi dana van mînakan hem mebesta me û hem jî rexneyêne me baştır zelal bûn. Pişti van gotin û agahiyen îcar em bêne ser parkîten di zaravayê me yê kurmancî de. Li vir hêja ye ku em tiştek bibêjin. Em dê parkîten ku me hebûna wan peyitandine (tespît kirine) û yên ku em wan mîna parkît bi nav dikin pêşkêş bikin, iştimateke pir mezin e ku parkîten ku hîna em leqayî wan nehatine hene.

Bi dû van daxuyaniyan re, îcar em bêne ser mijara pêrkîten xwe. Pêrkîten me ji aliye fonksiyonî ve bi du şêweyan derdikevine pêşıya me, yek bi awayê qertafêñ lêkerçêker û bi awayê qertafêñ navçêker:

Pêrkîten me yên lêkerçêker

Ev qertaf rasterast têñ pêşıya lêkera xwerû û jê lêkereke din tê himatê. Hema em yekser van

Ji bo ku mijar zelal û ronî be, me hewcedarî bi

destpêkeke welê dît. Çimkî carinan ku em di gotar û pirtûkîn li ser zimanê kurdî de rastî mijarêni li ser qertafan têñ, em ji xwe re heyirî dimînin. Hem mijar tevlihev û ne zelal e û hem jî, dahûrîna li ser mijarêne xurt e. Em dikarin bibêjin ku, di wan gotar û pirtûkan de qertaf û peyv hatine tevlihevkirin.

pêrkîten xwe derpêş bikin: *ber-dan, da-dan, der-anîn, hil-dan, ra-kirin, ro-kirin, ve-dan, vê-kezin, wer-gerandin, tê-koşîn*

Ligel van pêrkîtan, bi cînavkîn veşarî (ku tenê kesê sêyemîn ê yekejmar dinimîne) jî lêker têñ çêkirin, wekî jê kirin, lê kirin...

Ji ber ku em di hejmara çaran a Zendê de, bi navê “**Ji aliye binyadî ve lêkerên me**” bi dorfirehî li ser heman mijarê sekinibûn, em dê careke din wisa bi berfirehî jê çêl mekin.

Pêrkîten me yên navçêker

Ev pêrkîten me têñ pêşıya navdêr û rengdêr û wateyêñ nû didine wan. Em bi nimûneyan

roniyê bidin ser babeta xwe. Her wiha, bi şêweyeke alfabetîk.

bele + xwar = belexwar

bele + vîç = beleviç

bele + guh = beleguh

ber + dest = berdest

ber + hewa = berhewa

ber + malî = bermalî

bê + dest = bêdest

bê + xwê = bêxwê

bê + mal = bêmal

bi + av = biav

bi + dev = bidev

bi + xwîn = bixwîn

bi + kuj = bikuj

bi + kir = bikir

bi + bir = bibir

(Ev /bi-/ya hanê ji ya din cudatir e, bi-kir, ango muşterî ye; bi-kuj ango qatil, lê gava em dibêjin bi-av tê wateya av-darê. Bi parkîta /-dar/ê, em dikarin bi eynî wateyê di şûna pêrkîta /bi-/yê de bi kar bînin. Nimûne: bixwîn ango xwîndar, biçek ango çekdar....)

çele + xwar = çelexwar

çele + vîç = çeleviç

gû + stêrk = gûstêrk

gû + hesin = gûhesin

gû + sênc = gûsênc

hem + pa = hempa

hem + sal = hemsal

hem + dem = hemdem

hev + kar = hevkar

hev + beş = hevbeş

hev + par = hevpar

kele + şêr = keleşêr

kele + girî = kelegirî

kele + pîr = kelepîr

(Carinan em di şûna /kele-/yê de rastî /gere-/ û /kile-/ê jî tê. Mînak gere-hewr, ku navê cureyeke dara spindarê ango hewrê ye, û kilekor...)

man + ker = manker

man + ga + manga

(Li ser vê divê ez çend tiştan bibêjim, ev ne pêrkîteke xwerû ye, ji /ma/ û /n/yê çêbûye. Ma, beramberî peyvên /dê/ û /mê/ ye. Heta em leqayî peyva “maker”ê jî tê. Gava ev pêrkit tê pêşiyê, cinsiyeta peyvê diguhere. Çawa ku /ga/ peyveke nêr e, lê gava /man/ tê pêşiyê û dibe navekî nû, yanê ev nav di şûna peyva “çêlek”ê de tê bikaranîn. Ligel van, ji bo guherîna cinsiyetê, an jî diyarkirina zayenda mêtîyê peyvên mîna /mê/ û /dêl/ tê pêşîya peyvê. Nimûne: mî + kêw, dêl + e + gur)

ne + yar = neyar

ne + xweş = nexweş

ne + zan = nezan

ser + kar = serkar

ser + leşker = serleşker

ser + eşîr = sereşîr

tele + rîşk = telerîşk

tele + bext + telebext

xele + nêr = xelenêr

xele + xwar = xelexwar

zir + bav = zirbav

zir + keç = zirkeç

zer + gûz = zergûz

(Ev parkîta hanê carinan mîna /zir-/ û carinan jû nolî /zer-/ê derdikeve ber mirov, mîna zerbî, zerdêli)

Ji bilî van parkîtan, parkîten me yên din jî hene ku bi wan ji navdêran navderên din têne pê û her wisa wekî lêkerên hevedudanî têne çivandin. Lê ev ne zêde ne. Mînak: ra-dest (radest kirin); ra-çav (raçav kirin), ve-rê (verê kirin).

ÇEND RAMAN Û DÎTIN LI SER

ZIMAN Û PEYVÊN KURDÎ

ZAGROS ZERDEŞTİ

Dîrok xalek pir giring e, ji bo pênaşa her neteweyê. Dema ku hêzek an dewleteke koloniyalist radibe ji bo dagirkirina welitekî din, berî her tiştî dixwaze wî gelî an jî wê neteweyê ji zimanê wê dûr bixe. Bi vê rêkê jî dixwaze dîroka wê neteweyê tune bike, kultura neteweyê ji navê hiltîne, di şûnê de, kultura koloniyalist bi cih dike. Em iro vê diyardeyê (fenomenê) bi hêsanî li Kurdistanê dibînin. Wek tê zanîn, ziman yek ji xalên bingehîn e ji bo pênaşa hemû gel û neteweyan. Li vir naxwazim zêde li ser vî tiştî rawestim. Ziman kîlîta vekirina dergehan e, bi wesîteya ziman neteweyek dikare behsa xwestek û vîna neteweyî û xwe bike. Dîsa netewe dikarin bi hebûna zimanê xwe dîroka

xwe bidin nivîsandin. Bi egera zimên gel û milet dikarin dîrokê xwe dest nîşan bikin û rastiyêni ji dayikbûna hin belgeyê windabûyî yê dîrokî û nedîyar bi riya wateyê peyvê ziman vegevînin ji bo rastiya mêtûya xwe. Gelek caran jî dibe ku em bi peyvekê, rewşa aborî, civakî, ramyarî ya neteweyekê şareza dibin. An jî ku folklora gelan û paşmaya wan xuya dibin.

Dewletê ku Kurdistanê dager dîkin tim û tim pîlanan amade dîkin, ji bo nehêlana çanda kurdi. Li van gotinê serekşalyarên Îran Mîr Huseyîn Musewî binhîerin ku li kongreya çand û toreya kurdî li bajarê Mehabad kiriye: "Li gor agahdariyê min gelek zimanvan di vê dabasê de, bawer dîkin ku diyalektê zimanê kurdî resentirîn û çêtirîn diyalekt in. Ma kesek heye ku aligirê ziman û edebî farsî be û nizane diyalekta Hewremî yek ji diyâlîktê kevnare ya zimanê farsî ye. Hewramî ji aliye kî din ve diya zorbên diyalektê din ên kurdî yê mîna Soranî û Kurmancî, ye." Di Guzariştî yekemîn kongirey ferheng û edebî kurdî, Mehabad de, Reşîd Yasîmî dibêje "Em ger Kurd bi miletekî cuda û resen qebûl nekin û wan bi xêl û eşîreteka farsî bizanîn, tenê bi vî şiklî em dikarin bi hêsanî li ser dîrok û çand û zimanê kurdan lêkolîn çê bikin."

Ziman kîlîta vekirina dergehan e, bi wesîteya ziman neteweyek dikare behsa xwestek û vîna neteweyî û xwe bike. Dîsa netewe dikarin bi hebûna zimanê xwe dîroka

bikin û rastiyêni ji dayikbûna hin belgeyê windabûyî yê dîrokî û nedîyar bi riya wateyê peyvê ziman vegevînin ji bo rastiya mêtûya xwe. Gelek caran jî dibe ku em bi peyvekê, rewşa aborî, civakî, ramyarî ya neteweyekê şareza dibin.

Genatê Kurdo "Bê guman hindek peyv bi riya peywendiyê bazîrganî û aborî û konevânî û teknîk ji hev tê standin û bi karanîn. Ev rastiyekê û jê re guftûgo gerek niye. Lî dema ku peyv bêne nirxandin û şîrovekirin pêwîst e, ji bo zimanê resen bêne vegevîn. Nimûne: "Robot" peyveke Rûsî ye lê mîna peyveke navneteweyî tê zanîn. Ji bili aletê ku xwe bi xwe dilive peyvê "Glasnost" û "Prestroyka"

hema hemû gel dixebeitînin. Lê rewş li Kurdistanê cuda ye û zimanê kurdî ketiye ber êrîşa dagerkeran, bi mebesta helandina sîma û nîşanên neteweya kurd e. Bêguman ev dizîn ji taybetiyeke koloniyalîzmê ye.

Tîstê ku ez dixwazim bibêjim ev e ku destnîşaniya hin peyvên Kurdî bikim bê çawa Tirkan ji xwe re kirine mal û saman. Hêvîdar im ku ev kar gaveke biçûk be, ji bo xizmetkirina zimanê Kurdî û bi dagerkeran bide ragehandin ku zimanê me hebûna me ye û em ne razî ne peyvên Kurdî bi mebesta çekêن xeternak bêñ dizîn û li hemberî Kurd û helandina gel bêñ bikaranîn.

Niha hinek peyvên Kurdî bi belgeyên selmîn ji dizînê rizgar dibin û ew li zimanê xwe yê şîrîn vedigerin.

Sûrahî: Nav e û ji du peyvê hevedudan pêk hatiye. Sûr + Ax. Wek tê zanîn peyva “Sûr” di Kurdî (Soranî) de navê rengekî ye. Peyva “Ax” peyveke Kurdî ya resen e, di Kurmanciya Jorîn de di wataya zeviyê de dibêjin. Di zaraveyê Kurmanciya Naverastê de dibêjin “Xak”. Êdî em dizanin ku ev herdu peyv di Kurdiya resen de hene. Di zimanê Tirkî de, ji bo rengê Sûr dibêjin “kirmizi, kizil” û ji Ax re ji “Toprak” dibêjin. Mesele ronî dibe ku Tirk ev cotpeyv bi çewtî bikaranîne. Di eyînî wextê de, dîroka vê peyvê ta serdemâ şaristaniya “Gotî”, “Lolo” û “Mîdi Lûrî,” herêma Lûristanê diçe. Çend bermahiyêñ kevn hatine dîtin ku ji “Herîqur” hatine çêkirin û dîrokeke wan a kevnare heye ku diçe heta dema civakêñ seretahî yêñ li Kurdistanê. Ev yek bi xwe belge ye ku li dîroka neteweya Kurd dûr û dirêj e û xwedî şaristaniyek û zimanekî ye. Gotina “Sûrax” ji wê serdemê ye û belgeyeke ji bo resenetîya Kurd û şarastaniya wî.

Cerçeve: Ji du peyvan “çîwar + çêwe” (çêve) pêk tê. Gotina çîwar di Kurdî de hejmarek e. Di Tirkî de tê beramberî hejmara “dört”.

Bêjeya çêwe di Kurmanciya Naverast de bi mebesta “Dar”ê ku hatiye jêkirin, biring û hişk û ziwa bûbe. Di Kurdî de, zehf nimûneyên peyvên hevedudanî (cotpeyv cotwişe) hene. Çil û çêw, “Çêwekut”, li Erdelanê, li Silêmanî bi “dardest” tê. “Çêwekari” li Erdelanê, li Silêmanî bi wateya “darkarı” tê. Ni-mûne “çil û çêw” Şairê mezinê Kurd Mehwî dibêje:” kê min miştêk çil û çêw bim beçî bim keçkî ci degrim”. Peyveke din ji “çêwekut” di diyalekta Erdelanî de, ku bi zaraveyê Kurmanciya Naverast li Silêmanî bi wateya “têlakutan” tê.

Bi ronîkirina jorîn xuya dibe ku ne “çarçeve” ye ku Tirkan kirine samana xwe. “çîwar-

Tîstê ku ez dixwazim bibêjim ev e ku destnîşaniya
hin peyvên Kurdî bikim bê çawa Tirkan ji xwe re kirine mal û saman. Hêvîdar im ku ev kar gaveke biçûk be, ji bo xizmetkirina zimanê Kurdî û bi dagerkeran bide ragehandin ku zimanê me hebûna me ye û em ne razî ne peyvên Kurdî bi mebesta çekêñ xeternak bêñ dizîn û li hemberî Kurd û helandina gel bêñ bikaranîn.

çewê çarçeve” bi wataye Çar aliyeñ yeksan (wekhev) tê gotin, bêguman teşeyê endaziyariyê” hendese” yê dixe bîra mirov. Ew ji rastiyeke din e, li ser pêşvexistina endaziyariyê di civaka Kurdî de. Ev peyv ji aliye Erebî devoka Iraqê û Farisan ve ji tê bikaranîn. Her çiqas Ereb ji Çar re dibêjin “erba” û ji çêwe re ji “îtar” dibêjin Farisi ev gotin ji Kurdî wergirtine û wek serweta xwe dizanin. Lê ev peyva resen a Kurdî nîşana dîkorsazî û endezyariya gelê Kurd e.

Qîz: Di rastî de ev peyv li gotina “kj” a Kurdî hatiye wergirtin. Wek tê zanîn Tirk pît(herf)a “q” bi rêka Quranê ji zimanê Erebî girtine. Ev pît bi awayekî berfireh di zimanê Tirkî de, tê bikaranîn. Hinek car gotinê mîna “kompanî”, “Emerîka”, “Klînton”, ...htd. Herfa “k” li wan gotinan ji aliye Tirkan dibin “q”.

Bandora vî tiştî ji aliyê dewleta Osmaniyan ve gihiş ser zimanê Kurdî jî. Nimûne: "tekane = taqane, rik û kîn = riq û qîn,... htd. Wek tê zanîn dewleta Osmaniyan desthilateke berfireh peyda kiribû bi ser nevçe û herêmên Afrîka, Asya, Welatê Belkan û Rojhilata Navîn. Împeratoriya Osmanî li ser navê İslamyetê, lê di rastî de, dewleteke koloniyalist bû. Ne dewle teke kapitalist, belkî nîv feodal bû. Di bingeha xwe de, ev dewlet dewleteke Tirk bû û hemû gelên din diçewsand. Her bi vî şiklî jî bandora zimanê Tirkî li ser Kurdî çê bûbû. Bi watayeke din Kurdistan ji aliyê Tirkan ve hatibû dagerkirin.

Di zimanê Kurdî de, "tekane" bi wateya tekek" yek heb" tê bikaranîn, bi taybetî jî ji bo zarokek tê bikaranîn ku xuşk û birayên wî tunne be. Ev peyv bûye "teqane". Mixabin gelek nivîskar û hozanên me ev peyv bi şâşî bikar tînin û dibêjin "taqane". Nimûnen din: "rîxkune" ku ji herdû peyvên rîx+kun pêk tê. Rîx bi mana pîsahiya heywan" ajel" tê û kun bi mana cilê ku gû an pîsahî lê der diçe(qûn, pind) tê. Peyva"rîxkune" kirine "rîqne" zêdetir bo pîsahiya firinde û çivîkan tê bikaranîn. Ni mûnen din "rik û kîn, lik" kirine" riq û qîn, liq". Her bi heman şêweyê gotina kîj kirine qîz. Li gelek peyvan tîpa "j" jî kirine "ş", her wekî rojinbir" kirine "roşinbir" ku li vir de bandora koloniyalistên Farisan tê dîtin. "Newroz" bûye "Newroz". Peyva "roj" ku bi mana ronahî tê kirine "roş" ji ber vê jî "rojinbir". Hin kesan bawer dikir ku ev peyv" roşinbir" farisi ye, ji ber hindê bêjeya" ronakbir" di xebitînin

Farisan jî bi leyistina xwe rabûne û nîştiman û çand û her tiştekî me dager kirine. Her bo nimûne li beramber peyva"jin" a Kurdî peyva "zen" a Farisi bikartînin. Zana û sosyologê Tirk Dr. İsmail Beşikçi, dostê hêja yê Kurd dibêje: "Li ba Tirkan du car du dike pênc, lê belê Tirk hejmare 5ê wisa dinivîsin ku bişibihe hejmara 4ê".

Dukan. Peyv ji du gotinên Kurdî ên "du" û "kan" çê bûye. Du, hejmarek e, kan jî di wataya cur be cur de ye. Mîna "spor", "helken-

din", "çawig", "serçawé", "kanî". Li ser peyva "kanî" nimûne: kana hesin, an jî ev cih ku dartaş bi amûra'(haceta) eskeneyan ji dar çêdike, "dikole, hildike". Lê di Kurmanciya Jorîn de. Li hêla Cizîrê dibêjin kaneşikav = kuneşikaw. Wexta ku tîpa "w" piştî tîpa "a" tê dibe "v". Wek xuya dibe ev gotin jî Kurdî ye. Wek tê zanîn dergeha dukan heta iro jî li mîtaleke bihêz tê çêkirin. Herdu aliyêner dergeh li nav cihek"sporek"tên û diçin. Di wextê vekirina dergeha dukan de, vekirin bi xêweka glover tê dîtin "derabe" ku bi baweriya min ev gotin bi mana "derga labirdin" tê an jî vekirina dergehan. Peyve dukan peyveka resen a Kurdî ye. Ev bi xwe jî dikare bibe nîşanek ji bo şaristanî û bazirganî li nik Kurdan. Herwiha nabe ji bîr bikin ku Tirkan bo hejmara du "îkî" bikartînin. "Hafta", Peyveka resen a Kurdî ye. Ji hejmara heft hatiye. Lê çîma dengdêra "a" standiye. Çimkî di Kurmanciya Naverast de ji bo "nîr", tîpa "ê" bikartînin. Piştî tîpa bêdeng "heft" ku bi tîpa "t" yê lê dawî peyv diguhure dibe "hefte". Herweha di herdu zaraveyên Kurmanciya Jorîn û Naverast de ji bo peyva mî "ê" wek "xwîşkê", metê", "dayikê" bi kar

Farisan jî bi leyistina xwe rabûne û

nîştiman û çand û her tiştekî me dager kirine. Her bo nimûne li beramber peyva"jin" a Kurdî peyva "zen" a Farisi bikartînin. Zana û sosyologê Tirk Dr. İsmail Beşikçi, dostê hêja yê Kurd dibêje: "Li ba Tirkan du car du dike pênc, lê belê Tirk hejmare 5ê wisa dinivîsin ku bişibihe hejmara 4ê". Dukan. Peyv ji du gotinên Kurdî ên "du" û "kan" çê bûye. Du, hejmarek e, kan jî di wataya cur be cur de ye.

tênin. Ev destûr di Kurmanciya Jorîn de hatiye parastin. Ji bo mînak: Heftê û çar, heftê û pênc. Lê li Silêmanî ev tîpa "a" tê derbirîn û dibêjin hefta û çiwar, hefta û pênc. Di Kurmanciya Jorîn de bo nêr dibêjin: bavo, ev her du peyvan dawiya wan bi tîpa "o" tê. Straneka folkilorî wilo ye: "bo xom diwrim naygenê hey lîlê wey lîlê, lîlê". Ji bo nêr jî "lo lo lo" tê gotin. Di Kurmanciya Nawerast de bi "e" dawî dibe, nimûne; kur + e = kure, man + e = mame. Heft navekî tek û ji mî re tê gotin. Hefte navekî tek û ji nêr re tê gotin û bi "e" dawî dibe. Tirk ji hejmara heft re dibêjin "yedî"

Piştî van nirxandina tê fêmkirin ku "hefte" bêjeyeka Kurdî ye. Her weha zagona bingehîn û zimanê Kurdî tê de heye.

5- "Derbirî"..." derbirîn" rader e. (Ferhengî Xal).

Peyva "der" di zimanê Kurdî de, bi wateya çûna der ve li sînoreke diyar tê. Bo nimûne: Ème le mal derçûyin. Der bi mana" dergeh, derî" jî tê.

Di Tirkî de, der bi mana"dişar" tê. Derî an deregeh jî bi wateya "kapı" tê.

Hinek nimûne li ser peyva der: derbazbûn, derkewtin, derencam, derdî giran. Li gorî van nimûnan û destûra zimanê Kurdî xuya dibe ku "der" peyveke kurdî ye. Ev peyv hinek car bi wateyeke serbixwe û hinek caran jî mîna rengdîr tê bikaranîn.

"Der + be + der = derbeder". "be" amraza pêkve girêdan e, bi wateyeke din diçe ser nav

an du navêr wekhev û wan dike rengdîr. "be + hêz = behêz, mû + be + mû = mübemû, be + tiwana = betiwana".

Di vir de xuya dibe ku peyva "derbeder" peyveke kurdî ye. Çiwarşembe:çiwar hejmarek e, di Kurdî de. Di zimanê Kurdî de rojêr hefta ev in: şeme, yekşeme, duşeme, sêşeme, çiwarşeme, pêncşeme, heynî. Tirkan navêr hefta ji navêr Kurdî û Erebî dizîne.

Şeme bi Kurdî, bi Tirkî "Cumartesi", peyva Cuma Erebî ye.

Yekşeme Kurdî, bi Tirkî "Pazar".

Herweha peyva pêncşeme û yên din jî dizîne. Çiwarşema Kurdî dizîne. Tirk bo Çar dibêr "dört".

Hejmara çara Kurdî di zimanê Avêsta de bi mana "çêtur, çetvar" tê.

Di zimanê Hîndî yê kevn de "çetvar",

Di zimanê Farisi yê Naverast de "çehar".

Di zimanê Rûsî de "çitîrî".

Di zimanê Hîndî yê Nû "Çar".

Di zimanê Ferensî de "katir

Tirkan pêncşemeya Kurdî dizîne û kirine perşembe. Di Tirkî de ji bo pênc dibêjin "beş".

Peyva pêncâ Kurdî di zimanê Avêsta û bi

Di Kurmanciya Jorîn jî de bo nêr dibêjin: bavo, ev

her du peyvan dawiya wan bi tîpa "o" tê. Straneka folkilorî wilo ye: "bo xom diwrim naygenê hey lîlê wey lîlê, lîlê". Ji bo nêr jî "lo lo lo" tê gotin. Di Kurmanciya Nawerast de bi "e" dawî dibe, nimûne; kur + e = kure, man + e = mame. Heft navekî tek û ji mî re tê gotin. Hefte navekî tek û ji nêr re tê gotin û bi "e" dawî dibe.

Derbeder: Ev gotin jî Kurdî ye. Bila em li çavkaniya hinek peyvan mîzekin. Peyva Der bi Kurmanciya Jorîn û Zazakî bi wateya derive tê. Der di zimanê Kurd de bi wateya "derga = derî" jî tê.

Der + be + der = derbeder rengdîr e. Ev gotin li gor wateya xwe Kurdî ye.

Niha em têr ser radera" der ku li gor destûra gramatîk a zimanê kurdî wisa dest pê dike. Li pêş "n" ya lêker hiergav yek ji van pîtan têna: a, t, aw, î). Niha em lêkera "der" bi pênc şêweya werdigrin:

1- "Dera" lêker a derbazbûyî. Areq" derdan" rader e.

2- "derxist"...Xo" derxistin" rader e.

3- "Derparand"..." derperand" rader e.

4- "derçû"..." derçûn" rader e.

Nebûna rojnameya rojane bi Kurdî
sedemeke pir girîng e ji bo kêmbûn
an nebûna xwendevanên me. Bêgu-
man xetera zimanên Erebî û Tirkî û

Farisî jî li ser nivîsandin û zimanê
Kurdî tiştekî xuyayî ye. Pîten me yên
mîna "j, ç, v, o,.. û hinekên din" di zi-
manê Erebî de tune. Hinek nimûne li

ser bi şâşî guhastina gotinên biyanê
bo nav zimanê Kurdî: Pîkaso Bîkaso,

Gerbaçof kirine Gorbatşof, Pîpsî
kirine Bîbsî Zagros kirine Zacros....

wateya "pence" tê.

Di zimanê Hîndiya Kevin de "pence".

Di zimanê Hîndiya Nû de "panc".

Di zimanê Farisî û Naverast de "penc".

Di zimanê Belûcî de "penc, pec".

Di zimanê Rûsî de "payat"

Xoşaw: Ji du peyvîn "xoş + aw" pêk tê. Di zimanê kurdî de jî her wek hinek zimanên din hindek pît nahêن derbirîn(dengen wan derna-kevin).

Her bo nimûne li devera Silêmanî bo peyvîn mîna: mang, jeng, meng,... htd pîta deng dernabirin. Di zimanê Swêdî de jî ji bo peyva "pengar = pare" pîta "g"di wexta axaf-tinê de nabêjin an jî bi xêweka sivik dibêjin. Gelek gotin di zimanê Swêdî de hene ku di zimanê Kurdî de jî bi eynî mane û deng in. Mînak:râv, stor, lâpp, kart, âgg htd. Wek xuyaye Kurdî jî zimanekî Hînd û Ewrupî ye. Peyva "xoş" ji aliyê Tirkan ve hatiye dizîn. Ev peyv bi wataya "giyan û roha tiştan" tê. Herkes dizane ku "aw" jî gotineke Kurdî ye. Ji xwe Tirk bi aw= av dibêjin "su". Hinek nimûne li ser "aw": Mast + aw = mastaw, gom + aw = go-maw. Li ser "xoş" mirov dikare bêje: xoş + wîst = xoşewîst, xoş + bawer = xoşbawer, xoş + aw = xoşaw. Lewre em têdigehin ku peyva "xoşaw" peyveke Kurdî ye û çi girêdaneka wê bi Tirkî re tune.

Berî çend mehan rayedarên Komara İslâmî li Êran biryarek derkirin ji bo temîzkirina zi- manê Farisî ji gotinê biyanî "bêgane". Her- weha şaliyarê derve yê Ferensa jî di sala 1994an de tiştekî wisa xwest. Mixabin nivîskarêne me ne tenê zimanê xwe paqij nakin, lê belê gotinê biyanî jî bi kar tînin. Her na, ni- vîskarêne me dikarin wan gotinênu ku hatine talan kirin, carek din bigerînin nav zimanê xwe û medalyaya Xanî li sîng û beroka wan bixin.

Nebûna rojnameya rojane bi Kurdî sedeme- k e pir girîng e ji bo kêmbûn an nebûna xwen- devanên me. Bêguman xetera zimanên Erebî û Tirkî û Farisî jî li ser nivîsandin û zimanê Kur- dî tiştekî xuyayî ye. Pîten me yên mîna "j, ç, v, o,.. û hinekên din" di zimanê Erebî de tune. Hinek nimûne li ser bi şâşî guhastina gotinên biyanê bo nav zimanê Kurdî: Pîkaso Bîkaso, Gerbaçof kirine Gorbatşof, Pîpsî kirine Bîbsî Zagros kirine Zacros.... htd. Koloniyalîzm û gelên serdest û dagerker bi gelek şêwan kultur û zimanê me xirab kirine û dizîne.

Em hêvîdar in ku nivîskarêne Kurd ên hêja, di xema pîten Kurdî û zimanê xwe de bin û her tiştî bi zelalî bixin ber destêne xwendevanên Kurd.

ÇAVKANÎ

1- Govarî Roşinbîri Niwê, jimare 122, Sal 1989, lapere 149, zimanî Kurdî le nêwan zanstî û mêmüda, Dr. Cemal Reşîd.

2- Heman serçawê, jimare 124, lapere 96, Jimare wek yekeyekî serbexoy axawtin û corekanî ji- mare le zimanî Kurdî da, Dr. Ewrehmanî Haci Marif.

3- Zimanî yekgirtûy Kurdî , Cemal Nebez, Yekêtî Xwênkaranî Kurd le Ewrupa 1976.

4- Ferhengî Xal 1.2.3. Sal 1960.

5- Hembane borîne, Hejar. 6 Profisor Qenati Kurdo, wergêran û pêsekî Dr. Ewrehmanî Haci Marif, 1973 Ferhengî Swêdî Kurdî.

6- Profisor Qenati Kurdo "Kurdîov", wergêran û pêsekî Dr. Ewrehmanî Haci Marif, çapxaney Korî Zaniyarî Kurd 1973.

7- Ferhengî Swîdî Turkî.

8- Govarî guzarişti yekemîn kongirey ferheng û edebî Kurdî" Mehabad rezberî 1365".

DERKETINA TÛRANTİYÊ Û ARMANCÊN WÊ

HESEN İBRAHİM

(Werger: Celalettin Yöyler)

Tûranti çawa di berhemên felsefi yên ereban de hatiye, bi vî awayî ye:

Tevgerekî neteweyî a tirkîye. Armanca wê, tirkirina dewleta Osmanî û kesên ku ne ji nîjadê tirk in. Navê xwe jî ji cihê ku tirk lê jîne hildâye. Her wisa ew war ê Osmaniyan e jî. Yanî navê wî cîhî: Tûran bûye.⁽¹⁾

Di nasandina armancêن Tûraniyan de, Corc Entonyos di pirtûka xwe ya bi navê Yeqzetul Ereb de wiha dibêje: Ramana tûranî doza paqîjî û mezinahiya nîjadê tirk û doza lêzimiya tirkên di nava dewleta Osmanî û birayên wan ên ji nîjadên tirkî yên di asya na-vîn de dike.⁽²⁾

Hinekî ji lêkolînvanên dîrokê dibêjin: ramana tûrantiyê cara yekem di welatê terteran de derketiye holê, di dema hişyariya wan a bi ramana netewperestî de li hember îm-paratora Rûsî û yekîtî û pev-

xistina dewleteke bi navê Osmanî van di nava dewleta Osmanî de rolekî gelek mezin lîstine. Yek ji xebatkar û damezrînê herî mezin ê tûrantiyê, Yûsuf Ekteşûra ye. Ewê ku gotina wî di binê vê ser nivêse de (Sê rôexistin siyâsîne) di rojnameya tirk de hatiye weşandinê. Ew jî ji bo bernameyekî siyâsî ji tûraniyê re. Di wê bernameyê de gazi dike bal rizgarkirina nîjad û neteweyên tirkî û damezrandina împaratorekî tûranî ji dirêjahiya deryaya Egeyê, hetanî rojhilateh çînê.

Lê dîrokzanê Biritanî (înglîsî) (îlyod Xerînînel Mîrez) ew jî derketina Tûrantiyê di pirtûka xwe ya bi navê Tirkî-yel Hedîset Yanî Tirkiya Nûde, ji hinekî berhemên ku dewleta îngilîsî bi dizi li ser tevgera tûrantiyê civandiye girtiye û dibêje: Tûrandî di destpêkê de hatiye pevxistinê ji du besan; 1- Feniye 2- Ew-rûpiye. Osmaniyan ev raman

ji Farisan ji bo berjewendiyê xwe negirtine, belkî ji hêla Ewropiyan ve ji bo wan hatiye pêşkêşkirinê.

Yanî hinekên dinêni ji wan re vê ramana nîjadperestî ya tûranî amadekirine ew jî ji xwe re dixebeitînin.⁽³⁾

Li ser vê tevegera tûrantiyê, Dr. Salil Zuhreddin di pirtûka xwe ya bi navê El Ermen û wel Ereb, beyne Tûraniyetê wel Sihyoniyetê de, Yanî Ermén û Ereb di navbera Tûraniyan û Sehyûniyande, dibêje: Tûraniyî ne tevgerereke tirkîye tevgerereke biyanî ye⁽⁴⁾ Hem jî dibêje tûraniyî di dijwarî û gemariya xwe de, ji sîonizmê û faşizmê û nazîzmê bi xetertir e û dijwartir e... Lê bi sîonizmê ve bi peywendiyê rihamê, nîjad û xwînê girêdayi ye. Di dîroka cîhanê de wekî wî tune ye û nayê dîtinê... Ew jî ji ber ku kesên ev raman damezrandine ne tirk in belkî pirêwan ji sîonizmê nin û ji nîjadê cihû ne.

Di dû re tûranti, ji bilî beşekî ji sîonizmê û cihûtiyê tiştekê dinê nîne.

1- Ermén û Ereb di navbera Tûraniyan û Sîonîstan de Dr. Salih Zuhreddîn Bêrût 1994 s 7.

2- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s. 8

3- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s. 9

Dr. Salih Zuhreddin navên van kesên ku li dû vê ramana tûraniyê ne û damezrandine, yek bi yek dibêje û diyar dike:⁽⁵⁾

1- Rojhilatnasê cihû Erminyos Fambiri Ew jî ji cihûyên Hongryayê ye. Wî di navbera Sultan Ebdulhemîd û Teyodor Hertzel de, di sala 1901an de peywendî dabû çekirinê, ji xweşmîrên amadekarên sazkirina ramana tûraniye re. Dîsa yekî dinê ji damezrînên ramana tûrânî: Rojhilatnasê ji nîjadê cihûyên Elmanî Firanz Fon Wîzer wî jî di binê navekî mustear Veşartî de bi navê Mûrad Efendi pêwîstiyêن tirkên ciwan û programa wan a siyasi amadekir. Dîsa yekî dinê ji amadekarên programa tûranityî rojhilatnasê Cihûyê Polonî: Qustentin Biroceskî ye wî jî dema ku xwestiye ji programa tûrantiyê re binivîsîne, navekî veşartî li xwe kiriye û navê xwe daniye Mustefa Celâlettin Paşa pirtûkek di sala 1889an de bi ser nîvîsa (Tirkên kevin û yên nû) derañiye û pesnê tirkên kevin da ye û gotiye nîjadekî pir mezin û bêhempa ye. Dîsa yekî dinê ji rojhilatzanê Cihûyên Firesewî Liyon Kahon wî jî pêşgotinek li ser dîroka Asya bi navê (pêşgetinek li ser dîroka Asya) de wiha gotiye: Tirk û Moxol di destpêka wan de hetanî 1405an ew tûranî ne

û zekî û mîr bûne û ew nîjadekî qenc û paqîj bûne. Lê dema ku ji adet û çanda xwe ya berê dûrketine û ola îslamê pejirandine. Ji para çûne û kêm ketine.

Dîsa yek ji wan ên ku ramana tûrantiyê ji bo tirkan amade kiriye, cihûyê bi navê Elbîrt Kohîn ne. Vî cihûyî de-

Hevgirtina Îtihad û Tereqî

Bi eşkeretî û taybetî pêşveçûyîn û zeximbûna Tûraniyan di nava împaratora Osmaniyan de, ji hêza siyaseta îtihad û Tereqiyê ye. Lê rewşa wî ya aborî li gor hinex lêkolinvanan û pirên çavkanîyen di destê wan de çawa

Yek ji wan kesên ku ji bo tûranizmê nîvîsiye
nîvîskar Ziya Gökalp e. Wî jî pirtûkek di sala 1923an de li Enqereyê bi navê “Koka tirkîtiyê” weşand û tê de dîtinêñ cihûyan parast. Ew jî Suxteyekî pir baş e ji bo cihûyên sîonîst. Hem jî ji cihûyên tûranî Xalidet Edib û zanayê Olê yê ji nîjada Evxanî Ubeydullah e.

ma ku ji bo ramana nîjadprerestiya tûraniyê nîvîsiye navê xwe yê rastî nexbitandiye û navê veşartî yê bi navê Tekin Alp xebitandiye.

Yek ji wan kesên ku ji bo tûranizmê nîvîsiye nîvîskar Ziya Gökalp e. Wî jî pirtûkek di sala 1923an de li Enqereyê bi navê “Koka tirkîtiyê” weşand û tê de dîtinêñ cihûyan parast. Ew jî Suxteyekî pir baş e ji bo cihûyên sîonîst. Hem jî ji cihûyên tûranî Halide Edib û zanayê Olê yê ji nîjada Evxanî Ubeydullah e. Hem jî İsmail Ehmed Edhem yê tirkê cihû, ewê ku çû weletê Misrê û pirtûkekî bi ser nîvîsa Çima Ez Mulhidim di gel van İsmail Mezher jî mînanî wan e.⁽⁶⁾

jî ku dîrokzanê bi navê Sîton wetson di derbarê vê rewşê de wiha dibêje: Her bi rastî û eşkere endamên vê rîexistina îtihad û tereqiyê ne tirk in ne jî misliman in. Ji destpêk û damezrandinê bi navê îtihad û tereqî hetanê dawî tu kesekî di navbera serokatiya wê de û endamên wê de ji nîjadê tirk nehatiye dîtinê. Wekî çawa Enwer Paşa kurê mirovekî Polendî yê murtede (ji ola îslamê derketiye) Dîsa wekî Enwer Paşa Cawîd jî ji malbateke cihû ya bi navê Donne ye. Wisa jî Emanoîl Qeresû ji cihûyên İspanî ji niştecihê bajarê Salonêlê ye. Dîsa wekî wan Telet Paşa ji nîjadê Bulxarı yê....Weston gotina xwe di domîne dibêje: Kesên

4- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s. 9.

5- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s. 10-11-12.

6- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s 14.


ev rêxistina û tereqiyê didane meşandin û pêşve di-birin, cihû bûn û yên ku ji ci-hûtiyê misulman bibûn. Lê alîkarî desteka aborî û malî ji rîya mirtedan û ji kesên dew-le-mendêن cihûyê Salanîkê dihat.

Ev rastiya hanê ji yek ji belgeyên hejmara 3711010 li londonê ji hêla Sefirê înglisî ji bajarê stenbolê di meha E-yarê de di sala 1910an de ji hêla vî Sefirê bi navê Cîrald Loser ji wezîrê îngilisê deryare yê bi navê Hartînik re⁽⁷⁾ hatiye şandin. Di vê belgeye de Sefir dide xuyakirin ku di bajarê Selanîkê de 140 hezar niştecî hene, ji wan 80 hezar

ji nîjadê cihûyê ispanî ne. Ji bil wan 20 hezarên dinê ji nîjadê Şiptay lîfi an ji ci-hûyê batinî ne yanî bi dev misilman bi dil cihû ne. Weston lê zêdedike dibêje: Wê gavê tê zanîn ku kesên vê rêxistina û tereqiyê dimeşînin, di bajarê Salanîkê de ew ber cihû ne û di demekî kurt de, piştê ku vê rêxistinê navenda xwe di bajarê Qustentînê de bi cî kir, hate zanînê ku bi tevayî endamên vê rêxistinê Mason in û Qeresû dest bi rolekê mezin kir di nava vê rêxistina û tereqiyê de, hem ji cihûyan vê rêxistinê di warê aborî de pir zexim kirin û xistine destê

xwe û binê fermana xwe. Li ser hêla nasnameya vê rêxistinê, Dr. Hisan Helaq di pirtûka xwe ya bi navê Rola cihûyan û hêzên navnetewî di pe-yakirina Sultan Ebdulhemîdê 2 yan de, ji ser text dibêje: Serok û mezinên rêxistina û tereqiyê bi gelemperi suxteyên Qeresû bûne, di Salanîkê de. Li ser vê mijarê Seyîd Reşîd Rida⁽⁸⁾ di nivîsa xwe ya ku di kovara Elmus-teşriq de hatiye weşandin de dibêje: Hinekî ji mezinên û tereqiyê, dixwazin ku Dewleta Osmanî di destê wan de bimîne û ew çawa dixwazin wisa birêve bibin di navbera xwe de... Hem ji ev mezinên vê rêxistinê bi tevayî ji Masonan bûne. Ev ji her ser kevtin e ji bo tevgera Sionist-an ji bo dagirkirin û mêtandina welatê Filistîniyan, ew welatê ku sîonîst dixwazin dîsa têxine binê desthilatdiriya Îsraîliyan û welat ji bo vî nîjadî, wekî çawa ku dibêjin ew welatê me yê berê ye û bila kesên cihû bi milyonan li ser wê axê bi hêzanê û xweşî bijîn.

A bi van xebatêن cihûyan û sîonîstan di nava vê rêxistina bi navê û tereqiyê de bi navgîna wê qasê ku Emanoil Qersû û sionistên hevalên wî zor dane ser Sultan Ebdulhemîd ku bibe alîkarê avakirina Dewleta sîonîsta Îsraîlî lê dema dîtin ku Ebdulhemît vê yekê napejirîne, ev sîonîst li



Kovareke ku li ser fikra turanî tê weşandin.

7- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s 15.

8- Dîsa çavkaniya pêşîn 8. s 16.

emberî Ebdulhemîd ketine nav dijberiyan di sala 1908an de û di sala 1909an de Sultan Ebdulhemîd ji ser text dûrkîrin û desthilatdarî kete destê ïtihad û tereqiyê.⁽⁹⁾

Mustefa Kemal Atatürk:

Piştê jihevda ketina împaratora Osmaniyan û feşilandina wan di cenga cîhanêya yekem de û birêveberên ïtihad û terqiyê, rol kete destê Mustefa Kemal û dest bi avakirina dewleta tirkî kir. Mustefa Kemal di nava giştî masonên di salanîkê de di rade û hejmara 33an de bû. Hem jî yek ji wan ên herî pêşve bû di nava xebat û pêşvebirina ïtihad û tereqiyê de. Di nav wan masonan de, hem jî bi fermana cihûyê ma-

son Emaoil Qeresû, Mustefa Kemal wê demê bi nîşana (Raid) erkanê herbê bû berya wergerandina textê Sultan Ebdulhemîd.

Piştî destxistin û serokatiya tevgerê ya bi navê Kemalî piştê cenga cîhana yekem, di sala 1923an de wî pirêni zilamên xwe yên ïtihad û tereqiyê li dora xwe civand û bi wan zilamên xwe yên bi vî awayê xwe da dorpêçkirinê, nemaze;

1- Ji wan jî Ziya Gökalp ê ku her wekî manewî bû ji bo nîjadê tirk.


2- Yûsuf Ekteşûra ewê ku bingehê bernameya tûrantiyê amadekiriye, wî jî li ba Kemal cihê xwe girtiye.

Li ser vê yekê Mustefa Kemal karê ku bi sedan kesên di nava bîr û baweriyên tûrantiyê û sionîstiyê de cur be cur cî û meqaman de bi cî ke û bide xebitandinê. Bi vî awayî kesên ku xudanê ramana tûranî bûn di cîhîn dewletê herî bilind de hatine bicî kirinê û pêşî li saziya bi navê (Mala Tîrkan) bi giranî hante xurtkirinê û destekkirinê çawa jî ku di sala 1930an de bi emrê Mustefa Kemal bû saziyeke fermî û tûranî.

Saziya bi navê Mala Tîrkan dest bi sazkirina şax û beşen xwe yên cur bi cur kir kete nava xebata ders dayina bi zimanê tirkî û nivîsandina dîroka tirkî û da xuyakirinê ku yekem car tîpa ku hate peyi-vandinê bi zimanê tîrkiye û Hem jî (koka nifşa spî ya herî mezin pêşveçûyî) tirk in. Hem jî bingeha hemû medeniyetên di cîhanê de, ji medeniyet û şaristaniya tîrkan e. Di dûre zivirin ba peresvanî xudatiya ji bo rojê û gotin navê vê ramana me (Ramana Roj) e. Di dawiyê de Mustefa Kemal di guhertin reformên xwe de xelîfetî mehkemeya şer û luqebên Olli de qedehekiranê û nivîsa Qur'anê bi zimanê tirkî da serbestkirinê û dînê dewletê da rakirin⁽¹⁰⁾

Qurbanê Tûrantiyê!

Ji ber ku Tûrantî zaroka sî-onîstiye ye yanê sîonîstiye ew afirandiye, wî rûyê xwe yê nîjadperestiyê da nîşan bi birekî rengan û yekem qurbana wî bû împaratora Osmanî û gelên ku ji cur bi cur nîjadan di nav de dijîtin. Di 1909an de ïtihad tereqiyê Ebdulhemîd wergerandin û dest bi tevkuiya gelê Ermîn kirin. Dijwariya wan li pey hev domand, hetanî ku derbasê ba tîr kirina gelê Ereb kir çû pêşîya serbest raman Erebîtiyê û nehişt ku kesekî ji ereban bêjin em ereb in û dix-



9- Dîsa çavkaniya pêşin 8. Rûyê veşartî ji bo înqilaba tîrkiye Mewlanazade Rifat.

10- Türkiye nû Muhammed Elî Dirûze.

wazin serbest bijîn. Di belavokekê de ku Şerîf di 5 ê meha adarê de di sala 1917an de belavkiribû de tê bang li misilmanan dike û dibêje Hemî kesên musulmanên di welatê tirkan de, bi taybetî leşker û serleşker li hember desthilatdariya tûraniyan a kafir rabin, ji bo ku hûn welat ji destê çeteyên tûraniyên sionistî û cihûyên Donmet rizgarkin.

Dema ku Ermén û Ereb bûne qurbanê tûraniyan di destpêkê de, nemaze gelê kurd di dema Kemaliyê tûrani de, kete ber êrîşen li peyhev û li serhev û bûne qurbanê vê rejîmê û hatine kokbirkirin û li ser wan cengên hovane hatine meşandin, bi mebesta tovqelandina vî gelî ji bin ve di navbera salên 1925an û 1931an û 1937an de qurbanê gelê kurd gehîste sed hezaran û dest bi înkarkirin hate kirin û xwestin wanbihelînin bixine tirk û vî gelî bi navê tirkîtiyê bi navkirin û gotin (tirkên çiya).

Dawî li tûraniyan nehat herwekî tevgereke nîjadperesên tirk man û roj bi roj di ramana xwe de pêşve çûn. Di destpêka cenga cihanê ya yekem de, di sala 1944an de bi zelalî eşkereti perde ji ser Tevgera nîjadperesta tirkî rabû rûyên wanê nîjadî xûya kir, armanca vê tevgerê jî her ev bû ku tirkên Asyayê rizgarkin û bi dewleta tirkî re yekîtiyeke mezin avakin ji xwîn û tûrantiyekî saf. Vê

tevgera tûranî dixwest ku tirkîyê bikêşe nava cengê, ji bi destxistina van armancê xwe yên yekîtiya tirkan, nemaze di dema ku naziyan sitalingirat dorpêç kiribûn ji bo ku ew jî bibne alîkarê naziyan di êrîşen li dewleta Sovyetî û cî ji xwe re ber bi Asyayê fîrekin bigehîjine armancê xwe yê împaratora tirkî, di asya navîn de.

Divê dema ku em tê de ne û pişte jihevdaketina Sovyetê, dîsa mebestê tûraniyan eşkerebûn û derketine holê û hevalbendî bi cihûyan re pevxitin û tevgera bi navê Gurê gewr xwe diyarkir û got keski wekî nîjadâ tirk di cihanê de tune ye û serdestê hemû kesên di cihanê de ye.

Di sala 1973an de Yenîhal Etser de nivisa xwe ya bi navê Tûrancılık⁽¹¹⁾ de wiha dibêje: Tûrancılık armanceke pir pîroze li çem me, do dora Hatayê bû (wilayeta İskenderûnê) iro dora Qibrîsê ye sibe dora rojavayê Tiraqya û Kerkükê ye, di pêşerojeke nêzîk de dora Ezirbêcan û yên din e.

Bi van daxuyaniyan dîrokvan Mîxayîl Yatentşîyo kîrinên tûraniyan dide serhev û di nivîsek xwe de di sala 1989an de⁽¹²⁾ dibêje: Tûrancılık niha siyaseta dewletê fermiye.

Her wisa ev dîrokzan diyar dike dibêje: Rîşen tûraniyên tirkên nû di nava cenga bi qirkirin, koçberkirin, wêrankirinê de, ya ku li hemberî gelê kurd tê meşandin di kurdista-

na bakûr de, gelê kurd bi hesin û agir bide gerkirinê û li ser welat û warê wî (Kurdistanî) bide tirsandin û bêzar bike.⁽¹³⁾

Digel van ramanan Dr. Yehya Curcanî di sala 1995an de bi sernivîsa Tûranî di derbasbûna qonaxên dîrokî de wiha dibêje: Li ser her kurekî welat bênebê û ferz e, hem jî li ser herkesê xudan rûmet û xwenas, ji her netewî ku têkoshînê li hember vê ramana dijminahiya wekî vê ravê bikin, heta ku carekî dinê tevkujiyêni wiha neyêne dubarekîrin, di hinekî gavê din û cihîn din de.

Dawî li tûraniyan nehat

herwekî tevgereke nîjadperesten tirk man û roj bi roj di ramana xwe de pêşve çûn. Di destpêka cenga cihanê ya yekem de, di sala

1944an de bi zelalî, eşkereyî perde ji ser Tevgera nîjadperesten tirkî rabû, rûyê wan ê

nîjadî xûya kir, armanca vê tevgerê jî her ev bû ku tirkên Asyayê rizgar bikin û

bi dewleta tirkî re yekîtiyeke mezin ava bikin ji xwîn û tûrantiyekî saf.

11- Heman çavkanî


12- Heman çavkanî.

13- Heman çavkanî.

ANATOMIYA JINAN

Beşa 1.

AMEDEKAR: GÜLSEREN DENİZ




- 24- Sergirk, pirda mil, kolana navpîl
 40- Hestiyê kodikê, korta ber ran
 55- Gurzê jihêñ golimê û ran
 57- Xeza jihêñ gewr (kejî)
 59- Xeza jihêñ kevanê
 74- Masulkeya jorpîl (deltoit), masulkeya kolanê
 87- Masulkeya kujê, lêvê sê alî
 91- Masulkeya singê / mezin
 102- Masulkeya stûkur, pêleguhê, sergirkê û hestiyê sing
 139- Masulkeya çermê stû
 159- Hestiyê kemaxê (qîtê pêşin)
 160- Depa singê
 169- Xwîngerên pilikê / ser
 179a- Xwînhênarê (xwîncivanda) mil
 183- Xwînhênarâ (xwîncivanda) kolanê (ser mil) xwîn hênarâ qorê (hêtan)
 194- Xwînbera qorê/mezin

Beşa 2.




- 24- Sergirkê (kolan) pirda mil
 34- Betanê zik (diyafram)
 47- Kezeb (cerga reş)
 53- Gurzê jihêñ kezebê / Qilç
 56- Gurzê jihêñ kezebê / glover
 59- Xeza kevane
 74- Masulkeya jorpîl (deltoit)
 kolanê
 84- Masulkeya nav parxanê
 89- Masulkeya hestiyê zimê û
 bêrikê
 91- Masulkeya sing mezin
 92- Masulkeya sing pîçük
 99- Masulkeya pizî û junî
 102- Masulkeya stûkur peleguhê -
 sergirkê û estiyê sîng
 103- Masulkeya hestiyê sîng û
 hestiyê zimê
 104- Masulkeya kirtika tiroïd û
 hestiyê sing
 110- Masulkeya sîng serberî
 124- Şilava pîçük
 125- Hestiyê pasrû (parxan)
 139- Masulkeya çermê stû
 142- Tewêñ (lifêñ) navikê keviya
 hundir
 143- Tewêñ (lifêñ) navikê keviya
 navîn
 160- Depa sîng, kapasing
 169- Xwînbera pilikê/bin
 177- Xwîngerêñ sîng (hundir)
 183- Xwînbera kolanê / navpilê
 194- Xwînbera qorê / mezin

Beşa 3.





- 3- Şehdemar (Aort)
 16- Xwînbera pişikê
 34- Betanê zik
 35- Qenala zehfranê (sereke)
 45- Tila tiroïd
 47- Kezeb(cerga reş)
 50- Rûviya berik
 69- Masulkeya pîl / du serî
 75- Masulkeya kujê (berdev) sêkevî
 107- Masulkeya rageşîna nixumandina
 hestiyê hêtan
 111- Masulkeya kovik hestiyê patikê û hes-
 tiyê sergirkê
 113- Masulkeya hinarikê
 119- Rehên betanê zik
 123- Şîlava mezin
 124- Şîlava piçûk
 138- Parêzerê dil (perikart)
 146- Pişik
 165- Xwînbera zik/serete
 171- Xwîngerên şîlava gedek
 177- Xwîngerên sing/hundir
 178- Xwînhênera bin çeng
 179- Xwînhênera (mexanî) pîl
 180- Xwînhênera serî û pîl
 182- Xwînhênera jor / sereke
 188- Xwînhênera Stû / hundir
 195- Xwînhênera bin pirda mil
 196- Gedek (hûr)
 197- Malikên dil (rastê)
 198- Malikên dil (çepê)
 200- Kîsîkê zehfranê (zirafikê)

Beşa 4.



- 3- Şahdemar
- 16- Xwibera pişikê
- 19- Guhika dil/cepê
- 22- Mejikok
- 23- Mejî
- 28- Loxle serberî
- 29- Kepûya poz / binî
- 30- Kepûya poz navîn
- 31- Kepû poz / ser
- 32- Corpus colosmus
- 34- Betanê zik
- 35- Qenala zefranê
- 45- Tila tiroid
- 47- Kezeb (cerga reş)
- 50- Ruviya berik
- 51- Qirpik (gewrî) zimanê zenglorê
- 60- Ziman
- 61- Hestiyê çengelê / jêr
- 62- Hestiyê çengelê / jor
- 63- Pizavoka mejî
- 65- Gurzê sûnciqa roviyan
- 66- Gurzê sûnciqa loqlê / bewrarî
- 69- Masulkeya pîl / du serî
- 92- Masulkeya sîng piçûk
- 124- Şilava piçuk
- 144- Pons pirike mejî
- 153- Giçika (Sînûsê) enî
- 158- Giçika hestiyê sipanê
- 161- Pergiya mejîkok
- 170- Xwîngerê gedek (Hûr)
- 178- Xwînhênarên bin çeng
- 179- Xwînhênerâ (mexani) pîl (mil)
- 180- Xwînhênerâ serî û mil
- 181- Xwînhênerâ mexaniya sereke jêr
- 182- Mexaniya sereke / jor
- 183- Mexaniya sereke navpîlê
- 191- Mexaniya sereke/guçikan du niçik
- 192- Mexaniya sereke pişikê
- 195- Xwînhênera bin sergirkê
- 196- Gedek (hûr)
- 197- Malkên dil / rastê
- 198- Malkên dil / cepê
- 200- Kîsikê zefranê


Beşa 5.



5- Apandîst

- 26- Loqleya stûr ber bi jêr
- 27- Roviya sîmoît
- 38- Mêjî ,bûjeyê spî
- 55- Gurzê jihê golinê û ran
- 65- Gurzê sincûqê rûviyan
- 66- Gurzê sincûqê rûviya stûr
- 122- Sorîcih
- 136- Firşik (pankreas)
- 152- Navberika poz
- 155- Giçika rast
- 156- Giçika tirekî / bin
- 157- Giçika tirekî / ser
- 158- Giçika hestiyê xençerkî (sipanê)
- 159- Giçika tirekî kemaxê / qîte pêşin
- 165- Xwînbera zik (serete)
- 172- Xwîngerên sipilê
- 174- Xwîngerên Gurzê sincûqa rûviya
- 191- Xwînhênera gurçikan derîçeya duniçik


Beşa 6.



- 5- Apandisit
 25- Ruvira stûr (loqle) / bervi jor
 26- Ruvira stûr (loqle) / serbi jêr
 27- Loqle ruviya stûr (simoît)
 35- Qenala zefranê serete
 37- Ruviya devazdeh girê
 38- Meji / bujeyê sipî
 49- Îleum
 52- Spil (patereşik)
 62- Hestiyê çengela jor
 136- Firşik
 147- Devê hûr
 152- Nav berika poz (bêvil)
 153- Giçika enî
 155- Giçika (rast)
 156- Giçika tirekî / bin
 157- Giçika tîrekî / ser
 158- Giçika hestiyê xençerkî(sipane)
 172- Xwînbera sipilê
 173- Xwînberê sincûqa ruviyan / bin
 174- Xwînberê sincûqa ruviyan / ser
 191- Xwînhênera gurç"kan dericeya duniçik
 192- Xwînhênera pişikê
 194- Xwînhênera qorê(heta)mezin
 195- Xwînhênera bin sergirkê/navpilê
 197- Malikên dil / rastê
 198- Malikên dil / çepê
 199- Marîpişt (pirûsk)
 201- Mizzank (kisikê mîzê)

Beşa 7.

- 3- Şehdemar (aort)
- 6- Xwînbera binçeng
- 7- Xwînbera mil
- 8- Xwînbera sereke
- 9- Xwînbera heta
- 10- Xwînbera tengalê serete
- 11- Xwînbera tengalê / der
- 12- Xwînbera tengalê / hundir
- 14- Xwîngerê gurzê sincûqa loqlan / ser



- 15- Xwîngerê gurzê sincûqa loqlan
- 17- Xwînbera gurçikê
- 18- Xwînbera sergirkê/bin
- 20- Qaqircîg
- 22- Mêjîkok
- 23- Mêjî
- 29- Firnikên poz / bin
- 30- Qula poz / navin
- 31- Qula poz/ser
- 32- Corpus colamus
- 44- Tila ser gurçikê
- 51- Qırık zimanê zengelorê
- 63- Pizavoka mêtî
- 64- Mêjiyê marîpiştê
- 70- Masulkeya pîl (mil)
- 71- Masulkeya pîl û enîskê
- 73- Masulkeya ser bêrikê û pîl
- 77- Masulkeya zend rastkirinê
- 78- Masulkeya zend der ve anîn
- 79- Masulkeya tilorê navin
- 81- Masulkeya tenik
- 82- Masulkeya kemaxê û kunhesî
- 93- Masulkeya pîl ve anîn hundir/ glor
- 94- Masulkeya navpiştê / mezin
- 96- Masulkeya navpiştê / çarkevî
- 100- Masulkeya parsû (parxan) / pêş
- 107- Masulkeya nuxumandina hêtê/rageşin
- 112- Masulkeya pîl / sêserî
- 114- Rehênen hêtan (ran)
- 117- Rehê pîl / navin
- 120- Rehê enîskê
- 121- Rehêen vagus
- 122- Sorîcîk
- 135- Xezdan (hêkdank)
- 144- Pirika mej (pons)
- 148- Rûviya berik
- 149- Gurçik
- 158- Giçika hestiyê xençerkî (sipanê)
- 161- Pergiya mêtîkok
- 163- Zengelor
- 164- Xwînbera serî / mil
- 165- Xwînbera zik serete
- 166- Qenala mîzê
- 167- Malzarûk
- 168- Quz
- 175- Xwîngerên xerzdankê
- 181- Mexaniya (Xwînhênarâ) serete / jor
- 183- Mexaniya kolanê (navpîlê)
- 184- (Mexaniya) Xwînhenara heta qorê
- 185- Xwînbera bergolimê/serete
- 186- Mexaniya golimê / der
- 187- Mexaniya golimê / hundir

Çavkanîyen Anatomiyyê

- 1- Ana Britanika 12. Cilt
- 2- Kovara Enstituya Kurdiya Paris 6
- 3- Ferheng Izoli
- 4- Zimanê kurdi herêma Dersime

KÊŞEYA KURDÎ

FEHMÎ HUWEYDÎ

(Ji erebî werger: MELE REŞİT IRGAT)



Gava min di çapemeniyê de xwend ku hevala serokê Frensî Brêz Danyal Mîterand Xatûn li Parîsê civînek ji bo parizîna mafê Kurdên penaber ên misilman li dar xistiye û bixwe jî serokatiya vê ci-vînê kiriye, ji alîyekî ve şabûm û ji alîyekî ve jî gelek xemgîn û şermende mam.

Min got: Wey gelo dil cih û êwarêن misilmanan ew çend teng maye heyâ ku kesên ew-rupî dest davêjin alîkariya Kurdên misilman. Di pêşengiya vê helwesta mirovanî de jî ev Xatûna Frensî, em bivê an nevîn divê ku ji ber vê xebata wê ya qenc rêz û rûmetên xwe jê re diyar bikin. Min ji

xwe pîrsî ma qey pêwîstir ne-bû ku civata misilmanan vî karê hêja hildabana ser milênen xwe? Ji ber ku gelê Kurd misilman e û ji ola îslamê re jî xebatên bêhempa kirine. Pêwîst bû ku civaka misilmanan bi kurdan re biratiyê bi cih bianîna. Gava di derd û tengasiyan de li rex birayênen xwe yên kurdêñ misilman nerawestin, alîkari nedîn wan, ma wê kengê biratiya misilmanî bi cî bê? Ji xwe bîr û ba-werîya îslamê jî ev destgirtin û piştevaniya biratî ye. Di ola îslamê de ji bo parastina mafêni mirovan radeyek bilind û hêja heye.

Lê belê gava min serhatiya penaberîya kurdan di rojnameyên Brîtanyayê de, xwend, şermî û xemgîniya herî mezin li min peyda bû. Ew Kurdêñ ku ji welatê xwe koç bûbûn, revîbûn Îngiltereyê û dixwestin ku Hukumeta Îngilîz mafê penaberîya ramyarî ji wan re nas bike. Agahiyênu ku bi dest ketin, hejmara wan penaberên kurd gihiştiye 4 hezaran. Sosretek mezin e çawa yek ji wan penaberên belengaz nexwestîye ku xwe bispêre wenatek îslamî an jî Erebî. Ev rewş dilêş û balkêş e. Paşê jî min bihîst ku ev mijara penaberîya Kurdan li Îngiltereyê bûye, şede-

ma gengeşiyek mezin. Ji ber ku Hukumeta İngiliz ne amade bû ji bo cihkirin û dayîna mafêن penaberiya ramyarî ji bo wan Kurdên şeridî û şeqitî. Li gorê agahiyêن ku ketin destê min, Hukumeta İngiliz 200 kes ji wan Kurdan girtin û avêtin zindanan, yên ku mayîn jî xwest ku wan raqewirîne derveyê Brîtanyayê.

Di vê navberê de du penaberê Kurd yên girtî xwe şewitandin. Yek ji wan bi navê Şasiwar Aygûn (26 salî) jiyanâ xwe ji dest da. Yek jî bi navê Doxan Arslan laşê wî ji sedî 40 şewitî û rakirin nexweşxaneyê. Büyerek pir balkêş e, van herdu xortan mirin û şewatê bêhtir pejirandine ji vegera bi aliye wê zor û çewsîna ku jê revîbûn we latê biyaniyan li Ewropa.

Dibêjin ku sazgeheke Brîtanî heye xwerû ji bo dadî û mafan xebatê dike. Vê sazgehê berevanî û parastina mafêن kurdên penaberên misilman hilda ser milên xwe. Serokatiya vê sazgehê Birêz Daynîs dike. Wî gotarek dabû Rojnameya Obserfer a 8 Kewçêrê (jimar 8 October) û gotibû ku Brîtanyayê û tevlê hinek dewletên Ewropî derbarê pirsgirêka Kurd û penaberiya wan de gunehkariyek mezin dikan. Nîvê wan dajon bi aliye mirin û întîxarê ve, nîvê din jî ji Brîtanyayê diqe wirînin. Ji vê sedemê tewanbar in. Di gel vê rewşê we laten Ewrûpî li koçberiya El maniyêن rojhilat gelek germ dinêrin. Gelên cihanê jî di ek-

ranêن televîzyonê xwe de vê piştgiriyyê dibînin û seyr dikan. Ev kiryar bi rastî durûtiyek berbiçav e û ji bo mirovaniyê kirêt e.

Lê di heman demê de berpirsyarê Komela Mafêن Koçberan ê Giştî li Brîtanyayê birêz Anoyzer jî mîna birêz Daynîs piştgiriya birêz Mîterrand Xatûn kir û got ku; rayedarên İngilîzan pêşberên Kur dan nîjadperestiyê dikan, ev kiryar kirêt e û ew jî gunehkar in. Lewra ji bilî kurdan xwes tina mafêن penaberiya ramyarî li Brîtanya gelek hêsan e. Ev maf ji her kesê re tê dayîn, derveyê Kurdan di vî warî de tu pirsgirêk dernakevin pêş mirov. Gava ev dabaş li İngil-

tereyê dom dikir divîya ji bo çareserkirina pirsa Kurd û alîkariya wan di pêşengiya mi silman û Ereban de xebatek hatibûya kirin. Lê mixabin ew bi tevayı di vî warî de dûr, ker û lal mabûn. Lê bi devkî jî be piştgirî ji bo reşikên Başûrê Efriqa, Nîkaraguâ û Şîli diki rin. Di wan rojan de vexwendenek ji bo besdariya civînekê li Kolîna bajarê Elmanyaya Rojava ku çedibû girt. Ev civîn ji hêla Girêdana İslamiya Kurd (Rabîdedul İslamîyetul Kurdiye) ve hatibû lidarxistin. Bernameya civînê, pirsgirêka Kurd li gorî ray û dîtina islamê bû. Vê civînê gelek lêkolîner, lêgerîner û zanyarên kurdan yên li Ewropa, Yekîtiya Emriqa û li Qanada ku dijîn, dixebeitin û dixwînin civandibûn hev. Min ji vê civînê re bi erêni bersiv da û pejirand. Dîsa ez kûr û hûr poni jîm ev civîn lî Kolîn li Elman ya çima ne li Misrê ne li Riyadê, li Bexdayê û ne li welatek islamî an jî Erebî? Min ji ber du sedeman biryara besdariya vê civînê da.

Dibêjin ku sazgeheke
Brîtanî heye xwerû ji bo dadî û mafan xebatê dike. Evê sazgehê berevanî û parastina mafêن kurdên penaberên misilman hilda ser milên xwe. Serokatiya vê sazgehê Birêz Daynîs dike. Wî gotarek dabû Rojnameya Obserfer a 8 Kewçêrê û gotibû ku Brîtanyayê û tevlê hinek dewletên Ewropî derbarê pirsgirêka Kurd û penaberiya wan de gunehkariyek mezin dikan.

Ev civîn dibe fersendek mezin ji bo hevdîtin û bi hevre peyivîna min û Kurdên belave û beşkirî li nav pênc dewletan ku ev Tirkîye, İran, İraq, Sûriye û Yekîtiya Sovyetê ne. Ew kurdên ku ji ber zordarî û çewisînê revîne Ewrûpa an jî ji bo jîn, xwarin û xebatê û xwendinê çû bûn. Ji vê yekê min ev biryar da. Mebesta min ev bû ku ez bi Kurdan re rû bi rû bikaribim biaxivim, derd, kul û keserê wan ji devê

wan guhdarî bikim. Lewra di vê civînê de cûr be cûr xort, ciwan û zanyarêñ Kurdish ji her deverê dihatin rex hev. Hinek ji wan bi rengê nûneriya komeleyan amade dibûn, di vî warî de fersendek dîrokî ji min re derket holê.

Sedema duwem cara yeke-mîn bû minê di civînek bi vê rewşê de wê guhdariya ray û dîtina İslâmê li ser kêşeya Kurdish bikira. Nîqaş û guft û go û pêşniyarên besdarvanan li ser vê mijarê raçev û nîşe kirine. Pêşıya ez derkevîm rêuwîtiya wê civînê dosya kurdan a ku di nav gencîneyan

Gelê Kurd B.Z. bi salan xwedî dîrokeke kevnare ye li Asya Navîn û li Mezopotamîyayê. Ew gelê ku di wê demê de xwedî desthilatdar û xwedî şaristanî bû. Ew gelê ku bi cengawerî pêşberê Aşor û Persian şerîn dijwar kiribûn û paşê jî hêza xwe ya lehengî derbasê artêşa misilmanan kiribû. Ew gelê weke iro jî piştevaniyek ji welatên birayêñ xwe yên misilman dixwaze, lê vê biratiyê ji wan nabîne. Ew gelê ku iro hewceyê êwirge-hek e, da ku ji bin zilm û zordariyê bifilitê, lê dîsa jî vê hêviyê ji wan nabîne.

dike qurana pîroz(sûreta Hod ayet:42). Piştê daçûna Kurdish bi destê Împaratoriya Farisan Kurdistan pelişî, ji hev bela bû û ma mîna mîrityîyen biçûk. Ola îslâmê di dema Xelîfe Omer Binî Xetab de ket nav a-xa Kurdistanê. Ji wî şûn de Kurd di gel Tirk, Ereb û Fari-san bi hev re jîn. Kurdish piştê İslamiyetê jî gelek dugel damezrandine. Mîna dewleta Merwanî, Eyûbî, Hesnewî, Dostikî, dewleta Kirmanxanê Zendî û hwd. jî. Ev rasteqinî-yeke dîrokî ye. Çavkaniyêñ dîrokê, Selahedînê Eyûbî tenê mezinê Kurdish ewê bi nav û

Gelê Kurd B.Z. bi salan xwedî dîrokeke kevnare ye li Asya Navîn û li

Mezopotamyayê. Ew gelê ku di wê demê de xwedî desthilatdar û xwedî şaristanî bûn. Ew gelê ku bi cengawerî pêşberê Aşor û Persian şerîn dijwar kiribûn û paşê jî hêza xwe ya lehengî derbasê artêşa misilmanan kiribûn. Ew gelê weke iro jî piştevaniyek ji welatên birayêñ xwe yên misilman dixwaze, lê vê biratiyê ji wan nabîne.

(Xezanetu enzanîl Mislimîn) de bû di nûsingeha (büro) min de min derxist ber dest. Di belgedanga Kurdish de gelek nîqaş, wêne û lêkolînêñ ku bi rewşa Kurdish ve girêdayî bûn, hinek rûpel jî ji dîroka kurdan çak xemili bûn, hinek jî mixabin bi xwînê mewili-bûn, sor bûbûn. Bi komkujî, kuştin û qirkirin û perçiqan-dinê rûpel tijî dibûn. Ev dî-menêñ tal gava dihatin ber çavê mirov bivê û nevê dileşî û xemgînî di laşê mirov de peyda dibûn, mirov diket nav pêlêñ xeyalan.

Kurdistan navê welatê kurdan e ku iro tê de dijîn û tê de nîştecî ne.

Çavkaniyêñ dîrokî radigî-hînîn ku Kurdistan B.Z. gelek fermanwarî damezrandine. Mîna hukumeta Lolo (B.Z. 2500) 140 sal dom kiriye.

Dîsa Gotî navê hukumetek kurdan a bi nav û deng e. Gotî tê gotin ji çiyayê Cûdî re. Ew iro di nav sînorêñ Tirkîyê de ye. Dîrok nas dibêjin navê wî cihi, di qurana pîroz de derbaz dibe. Di serhatiya Nuh Pêxember de “keştiya wî li ser Cûdî rawestiyaye” ferman

deng, ewê ku leşkerên xaçper-restan poz kutayî paş ve da û Qudsa şerîf ji dest wan paqîj û rizgar kir nas dikin. Lê belê Kurd çawa dibêjin em neviyê Selahedînê Eyûbî ne, wisa jî dibêjin ku di rûpelêñ Kurdish ên İslâmî de, ji bilî Selahedînê Eyûbî Kurd navê gelek zanyarêñ xwe di warê dîrok û edebiyatê de dijmêrin, mîna Îbnî Esîr, Îbnî Şîrîn, Îbnî hacîb û Îbnî Xelkan û hwd. Dîsa ewen nûdem mîna Îbnî Teymiyê Îmam, Mihemed Ebdu-hu û dawî jî Dr. Mehemed Seid Remezanê Botî.

GELO KURD ÇİMA

Jİ DİROKA XWE FÊR NABIN?

Dr. KEMAL SİDO KURDAXI

Di salên 1831-33 de “Mesala Şerqî”, wek me di gotarêن berê de jî behskiri-bû, careke din tûjbûbû û çarenûsa Dewleta Osmanî ketibû rojeva siyasiya dewletên ewropî yên mezin. Di wan salan de, waliyê Misirê Mehmed Eli dixwast ji Dewleta Osmanî veqete û ji bo pêkanîna vê armancê leşkerê xwe heta bi Sûriyê û Kurdistanê dişîne. Rewşa Dewleta Osmanî gelek alozبûbû û loma nikarîbû xwe li hember Mehmed Eli ragire û mecbûr mabû alîkariyê ji dewletên mezin bixweze. Di wê demê de tenê Rûsyâ amade bû “alîkariyeke” çalak bide Dewleta Osmanî. Rûsyâ derfet ji bêhêzbûna Dewleta Osmanî girt û peymana Unkiyar Iskele di 1833 an de, bi Dewleta Osmanî re îmzekirin. Çavdêrên siyasi yên wê demê vê peymanê wek alîkariyekê ji Dewleta Osmanî re nabînin, ji ber ku Rûsyâ dijminê serekiyê Dewleta Osmanî bû û bi vê peymanê, tirkan xwe kiribûn bin rehma Rûsan. Îmzekirina peymana Unkiyar Iskelê pêşketinê leşkerê Misrî dan rawestandin.

Mîna ku me li jor jî diyarki-ribû baweriya tirkan qet bi Rûsan nedihat û dewletên ewropî yên din jî nedixwastin ku bandora Rûsyâ li Dewleta Osmanî xurt bibe û loma tirkan ji Rûsan xwest ku ew keştiyên xwe ji Bosfor û Derdenêlan bikşînin. Ew ji aliye-kî ve, ji aliye-kî din ve Fransa jî dixwast bi riya Mehmed Eli bandora xwe li Dewleta Osmanîbihêz bike. Di demeke wisa de, Mehmed Eli careke din fersend dît û di salên 1839-1940î de, leşkerê xwe

kire riya Konstantînopolê. Di pûşpera 1839 an de artêşen tirkan li Nizîbê bi temamî têkçûn. Berî ku ev nûçe bigihîje Kostantînopolê sultanê Osmanî Mehmûdê II miribû. Li şûna Mehmûdê II, sultan Abdulmecîdê şanzdeh salî hat ser textê padîşahiya Osmanî. Ji sultanê nû re dewleteke bê artêş û bê keşti mabû. Mehmed Eliyê Misirê Sûrî û perçeyek ji Kurdistanê xistibû bin destê xwe û riyên paytexta Osmanî li pêsiya Mihemed Eli mabûn vekirî. London ditirsiya ku Osmanî, weke 1833 an ji bo parastina paytaxtê, xwe bavêjin ber deriyê Rûsan. Loma İngîstanê bi hemû hêza xwe piştgiriya Dewleta Osmanî kir û ew ji têkçûneke temamî parast. Bi vê têkçûna dewleta Osmanî re fersendeke zêrîn ketibû destê kurdan ku bi hev re serî hildin û xwe ji nîrê tirkan rizgar bikin. Lê wek hercar kurd dîsa bihevketin û fersendeke din a dîrokî ji destê xwe berdan. Bi vê helwesta xwe kurdan zirar ne tenê bi xwe kîrin, lê belê bi Misir û gelên din jî kîrin. Dema ku beşekî mezin ji kurdan alîkariya Dewleta Osmanî dikir û li dijî birayêñ xwe, kurdêñ azadîxwaz, şer dikirin, hevalbendêñ tirkan

Loma İngîstanê bi

hemû hêza xwe piştgiriya Dewleta Osmanî kir û ew ji têkçûneke temamî parast. Bi vê têkçûna dewleta Osmanî re fersendeke zêrîn ketibû destê kurdan ku bi hev re serî hildin û xwe ji nîrê tirkan rizgar bikin. Lê wek hercar kurd dîsa bihevketin û fersendeke din a dîrokî ji destê xwe berdan. Bi vê helwesta xwe kurdan zirar ne tenê bi xwe kîrin, lê belê bi Misir û gelên din jî kîrin. Dema ku beşekî mezin ji kurdan alîkariya Dewleta Osmanî dikir û li dijî birayêñ xwe, kurdêñ azadîxwaz, şer dikirin, hevalbendêñ tirkan

ên kurd hêza Misirê jî qels dikirin. Weku H. Von Moltke dibêje, nîvê leşkerê Osmaniyyê Torusê ji kurdan pêkdi-hat⁽¹⁾ herçiqas wan ne ji dil de şerdikir.

İro em di 1997an de, di dawiya sedsala 20 an de dijîn û 150 sal di ser bûyerên ku me li jor behskiribûn re derbas-bûne, ma gelo iro rewşa kurdan çawa ye? Gelo ma kurd ji bo kuştina birayên xwe hîna dikevin pêsiya leşkerên tîrkan an na? Ma projeyeke kurdan a neteweyî heye an nîne? Divê mirov li kurdan wek neteweyekê mêze bike an gerek e em kurdan wek comeke ji êl û eşiran binirxînin? Ez bersiva van pirsan ji xwendavanêن hêja re dihêlim.

Ji bo ku mirov bikaribe rewşa iro ya kurdan bide ber rewşa wan a berî 150 salî, werin em bi hev re bibînin ka Helmuth von Moltke piştî ku biqasî du salan li nav kurdan digere û di şerê li dijî kurdan de, besdar dibe û ji nêzîk ve herdu a-liyên kurdan, ên bi tîrkan re û yên li dijî tîrkan, nasdike çi dinivîse.

Ez dixwazim ji xwendavanên birêz re tenê vê yekê bidim ronîkirin, ku Moltke ev gotar di bin serdêra “**Gel û welatê kurdan**” de di sala

1841an di di rojnameya almanî “Augsburge Allgemeine Zeitung” de weşandiye. Bi dû re, ew di pirtûka bi navê (*Ge-sammlete Schriften und Denkwürdigkeiten Bd. 2*) de careke din hatiye belavkirin.

“Di demeke wisa de, ku di hate bawerkirin ku bi alîkariya destêwerdana çar dewletê ewropî yên mezin rewşa Dewleta Osmanî serast bûye,

rihet hîştin. Niha dema ku topxaneyê İngлиз û nemsawî (austirî) ji *bab alalî* re rê li Asya vekirine, dê hukimet (tirk) dîsa weke berê ji kurdan bacê û leşkeran bixwaze, ev yek dê bibe sedama nera-zîbûnê di nav kurdan de, eger ew hîna bêdeng bin jî, ew dê ese (ile) di demekê de dîsan serê xwe li dijî tîrkan hildin. Ev fênomên⁽³⁾ wek aveke xurt



Xaniyên Kurdan ên li Rûhayê

birûseyên (ışae) hîna ne piş-trastkirî li ser serhildenê nû li Kurdistanê gelek kesen ku bala xwe didin tracêdyaya rojhilateş şaşdihêlin. Bi beregeha Nizîbê re hukimdariya padişah⁽²⁾ li ser gelê kurd, ê ku di şerê dawiyê de winda kiriye, lê serê xwe ji tîrkan re qet netewandiye, “de facto” bi dawî hat. Tîrkan nema dikarîbû hukimdariya xwe li kurdan bikirana, loma wan kurd

û lezgîn e, ya ku zû bi jêr de diherike, hêz û çelengiya wê avê jî bi temamî tenê wê demê diyar dibe, dema ku zinar û lat derdikevin pêsiya wê. Wîlayetên dewlata osmanî êdî di bin destêr tîrkan de nemane, her hewldanek ji bo bi şûn ve vegerandina vê pêvajoyê, dê bi xwe re hêrs û kîneke nû derxe holê.

Eger em wêneyekî biçûk ê vî gelî û welatî çêbikin, ê ku

1- R-397

2- Padîşahê Osmanî

3- Diyarde, zahîre.

4- Xenophon

niha bala Ewropa dikşîne ser xwe, em dê nexwazin ji Ksênofon⁽⁴⁾ dest pê bikin, û em her weha naxwazin bi nêzîkayî behsbikin çawa "kardoxên bedxwaz" heta roja îro ji her cûre dagirkeran re tirseke pir mezin in; ewen he ta roja îro xaniyên xwe bi bir cine biçük ava dikin, ên ku fermandarê Yonanî behsa wan dike; em naxwazin dîroka vî gelî ya dirêj û tarî ronî bikin û li wir rawestin û bêjin: ka ev gel qebîleyeke Teteran e û hatiye vê heremê, yan ew bêtir nebî û torinê Mêdiyên kevnar û Xaldan e, yên ku zimanê wan di pirtûkên pîroz ên gundêñ Xirîstian de, yên li ser sînorê dewleta Farisi ðiminîn, hatiye parastin. Em dixwazin bêtir behsa kurdan wisa bikin, çawa ew û welatê wan niha ji baldaran ve xuya dibin, ew baldarêñ ku derfet ketibûye destêñ wan ku li nav wan gelek bimînin û bigerin, baldarêñ ku zimanêñ welêt nizanin û yên ku di riyan Bedlîs û Çolemêrgê, yên asê û ji metirsiyên rast û nerast ti jî, re derbas dibûn.

Kurd yek ji wan miletan e, yê ku bi erd û zeviyan ve girêdayî ne. Wek mîrasvanêñ ferhengeke çandinya pir kevnar, ew di newalêñ çiyayêñ ermeniyêñ⁽⁵⁾ biçük de dijîn, ew xwe ji çol û deştan, ên ku tê de av û cogeyêñ çiyayêñ

wan bi dawî dibin, dûr dixin; herçiqas zivistana wan dijwar be jî, ew bi havîna xwe ya dirêj û bedew gelek dilxwes in. Koçer di nav kurdan de pir hindik in, hema ew gişt bi çandiniyê ve mijûl dibin û bi vî rengî ew miletakî xwedî ferhengeke çandiniyê ya dewlemend in, koçertiya wan jî tenê wisa ye ku ew pezêñ xwe pileyeke bilindit, li gor dijwarbûna germê di newalêñ nizim de û li gor ku tîrêjîn rojê rûyê çiyan ji berfê paqîj dikin, dibin, di wê demê de ew malêñ xwe bi cih dihêlin û li şûna wan di konine ji hiriya reş a bizinan de rûdinin.

Ji ber vê şêwza jiyanê, mirov li herêma ku tê de kurd dijîn tenê rastî gundan tê; li wir mirov tu bajarêñ mezin nabîne. Bajarêñ mezin ne li Kurdistanê ne, ew li derdora Kurdistanê ðimînin. Eger mirov xetekê ji *Diyarbekirê* di Mêrdin, Nisîbin, *Cizîrê*, Wan, Mûş, Palo, *Derindeh*, Mereş û *Adiyamanê* re bikşîne, dê ew xet sînorê Kurdistanê pêk bîne. Di hundirê vê herêma sînorkirî de mirov rastî bajaranice biçük, wek Zaxo, Bedlîs, Sêrt, Heskîf, *Şîro*, *Pêrtek İroglu*... tê, yên ku bi piranî kurd lê dijîn; tenê li deşten Xerpût û *Meletiyê*, lê ne di wan her du bajaran de, kurd ðimînin. Di van herdu bajaran de û di bajarêñ din ên hej-

martî de, mirov rastî mozayî-keke bedew ji gelan, zimanî û olan tê, Xirîstian, beşê xelekê yê herî kevin, torinê asurî û xeldan in, û ew tevlî ermeniyêñ ku didûre hatine deverê bûne. Asûrî bi piranî Yakobî û suryanî ne, yên ku bi hev re ne baş in û nakokî di nav wan de heye; xêñ ji hinek Proselütan,⁽⁶⁾ (...) yên dawiyê gişt endamên kiliseya Yonanî ne. Dû re kurdêñ cîran tevlî wan bûn û piştre *sarazên*,⁽⁷⁾ yên ku bi xaçîlgiran re ketübûn şer, li herêmê wek lehiyê belavbûne û şopêñ serketinê xwe yên biçük û mezin li her develekê hîştin. Li dawiyê tirk hatin û hukumdarîya xwe pêkanîn; kurd jî, yên ku pir dibin û herêma wan zû fereh dibe bê bes namînin.

Welatê kurdan bi taybetî ji aliyê başûr ve bi çiyan sînor-kiriye. Lê belê li başûrê wan çiyan ereb radigerin, û li wir ne gund û ne jî hişînahî heye, û tenê bajarêñ ku bi dîwarêñ bilind, ên ku wan ji ereban di-parêzin hene. Weku palgehe-ke⁽⁸⁾ hingavtî⁽⁹⁾ kurd tenê li ser çiyayêñ Şengalê, yên mîna dîwaran şengoye û tûj, di çola Mesopotamyayê de, tên dîtin. Li beramberî vê, li bakur û rojhilat xelkê kurd û ermenî dikeve navhev, tenê li cihêñ bilind, ji Palo û jor ve, li çiyayêñ bi dar ku heta roja îro ne leşkerekî tirk û ne jî rîwi-

5- Ev nav ji aliyê Ewropiyan ve hatiye efirandir.

6- Di zimanê Yonanî de ji wan kesan re dibêjin proselytos, ên ku ola xwe ber didin û oleke din dihebînin.

7- Tenê xaçîlgir behsa vî mîletî dikin, lê di rastiyê de tukes nizane ev çi mîlet e.

8- Nobedargeh

9- Bitenê

ye kî dîtinxwaz ew bi çavan nedîtine, kurd dîkê di salekê de ne. Hafiz Paşa⁽¹⁰⁾ dagerkîrina vê goşeya dawî ya azadî û serxwebûna kurdan ji xwe re kiribû armanc, lê şerê tirkan li dijî Misirê ji bo kurdan bûbû alîkariyeke mezin û bi vî rengî ev dever ji lêkolînên ewropiyan re jî, diyare ji bo demeke dirêj, hatiye girtin.

Di çarçovaya devera ku me li jor diyarkiribû de, kurd li herêmên bilind ên darêner merx û **palûtan** û heta bi herêma darêne zêtûn û henaran bicîdibin; ji zinarên dîwarî de, ji berf û kaniyên ku cogeyên avê jê diherikin, heta bi deşt û nawalên hêşin û zeviyên birincê, yên ku tê re

xarcogeyên avê hêdî hêdî di-kişin. Tenê di vê kemberê de kiştûkal (çandinî) heye, ji ber ku di vê demê de, li derveyî vê kemberê li jor hîn berfê girtiye û li jêr jî roja germ şînahî gişt hişkiriye.

Gundên kurdan dîmenekî xweşik pêşkêş dîkin. Gava ku mirov ji wan nêzîk dibe, hîn ji dûr ve komek ji darêne gûzê yên ciwan xuya dîbin, di bin siya wan a fereh de mal xwe vedişerin. Li ber kanî û cogeyên avê, bê wan tu gund nîn in, her dem daristanokeke (şaxik) ji spîdaran heye û bêyî darê wan xanî ava nabin. Ew dar baş avê vedixwin û li bin roja germ di demeke kurt de, gelekî bilind dîbin; ew

her wisa wek bedenê zad di tenêşt hev de ne û mîna qamûşan tenik û zirav dîbin. Li gor bilindî û nizmiya gundan, li kêleka wan rez û darêne zêtûnê, bax û bistan an jî zeviyên zad hene; lê li gundên kurdan mirov pir kêm rastî minareyên mizgeftan tê, yên ku li her gundekî tirkan ê piçûk jî hene.

Dîwarêne xaniyan bi cûre kerpiçekî ji herî û kayê û bê dar hatine avakirin, li şûna penceran di bilindiya dîwêr de, quline piçûk tên çekirin, yên ku vekirî dimînin, çimkî ne cam û ne jî kaxet hîna negîhiştine van çiyan. Derî jî ji darê gûzê yê xurt tê avakirin. Ser xaniyan jî bi dîrekên darêne gûzê tên girtin; dîrekân wisa didin berhev ku di navbera wan de, bi qasî 9 zolan⁽¹¹⁾ hebe, û dû re qorekî ji pel û şaxên daran didin ser wan û pişt re bi herî û rijalê tên pirkirin (qepatkirin) û kutan; qalingiya wê jî ji 1 heta $1\frac{1}{2}$ pêyî heye. Di havînan de, malbat li ser wan banêne xaniyan radi-kevin û loma ew ji her çar aliyan ve bi qasî 4 pêyan bilind kirine, ji bo ku tu kes di jêr wernebe. Xaniyên dewle-mendan duquatî ne û pircaran ji keviran e û ji aliyekî ve bi bircine çargoşeyî hatine avakirin. Xanî wisa hatine avakirin ku di dema şerên nav xwe de, rûniştiyên wan dikarin xwe bi hêsanî biparêzin.



Maleke kurdan

10- Hafiz Paşa, wek me li jor jî gotibû, di salên 1838-1839an fermandarê hêzê tirk li Kurdistanê bû û di şerê Nizîbê de windakiribû

11- Her zollek 2,23 sm in.

Di hundirê malê de, xên ji
odayêñbicûk ewêñ ku ji bo
jinan hatine terxandin, mirov
rastî odayeke mezin tê, ew jî
selamlika tirkan e. Li dawiya
wê odê agirdank xuyadike,
ew jî bi erdê ve dûz e; li her-
du aliyêñ odê jî behlîv danîne
û li malêñ dewlemendan jî
xalîce raxistîne. Raxeya (tec-
hîzat) malê gişt ev e.

Gund di navbera hev de, bi rêçikine gelek dijwar girêdayîne, mirov li ser pişta hêstiran jî nikare bi hêsanî di wan re derbas bibe û ew tirs û xofeke mezin dixin dilê her siwarekî bêgane. Xelkê her gundekî debara xwe bi xwe dîkin, pêwîstiya wan bi gundên din nîne û ew çûn û hatina gundên din naxwazin jî. Jin ji pembû û nîvkejekî kurtikan (qemîs) çêdîkin, ji cawê sor ku bi rengê reş hatiye hêlkirin (xetkirin) jî şilwaran didrûn, ji hiriya reş a bîzinan jî mantoyan (perdesûnan) çêdîkin; tevî solêن rengîn û kumêن kulavî, cil û bergêن mîran ji van tiştan pêktêن. Jinêن kurdan bi tevnan (cawjen) xalîçene ciwan çêdîkin û ji wan luksusa (keşxeye) se reke ya malan pêk tê. Mêrêن kurdan jî yan li zeviyan kar dîkin, an li ber pezê xwe ne û titûnê dikşînin an jî bi şer û pevçûnan mijûl dibin.

Gelek zehmet e ku mirov serjmêra xelkê kurd bi teqrîbî ji bide, lê bi her şêweyekî serjmêra wan ji nîv milyonê zêdetir e. Piraniya kurdan misulman in, li ser sînorê Dewleta Farsî ji kurdên Xirstiyan

dijîn û li çiyayêng Şangalê jî yêzîdî dimînin, tirk we difiki-
rin ku yêzîdî *Seytanperest* in
û loma tirk destûra kirîn û fi-
rotina wan wek kolejan di-
kin. Serjmêra ermeniyan jî
ewêng ku di nav kurdan de di-
jîn, ne hindik e û ew bi ola
xwe Xiristîyanê, kiliseya Yo-
naniya Ortadoks in. Kurd di
xesletên xwe yên neteweyî
de, wekhev in. Rengê çermê
kurdan ji cîranêng wan ên tirk-
men û ermenî ne mortir e;
bejna kurdan jî bilind û xurt
e, bêvila (poz) wan jî xiloze
(xar) ye û çavêng wan wek
çavêng mirovêng ku xar mêze
dikin, di berhev de ne.

Zanebûneke kurdan a tay-
betî, di warê avakirina erqên

Zanebûneke kurdan a

taybetî, di warê
avakirina erqên avê de
heye. Bê pêwengêne
topografi, kurd dikarin
xetêن avê ji kanî û
cogeyên avê ji jor heta
deverên pêwîst bikşînîn
û dar û barêن xwe pê
avbidin. Kurdan li ser
piştên çiyan wek
sewkiyan, zevî
avakirine û wan bi vî
rengî rûberê zeviyêن
xwe ferehtir kirine.
Şanayîbas e zeviyêن
wisa, li welatên me
ewêن ku bi ferhenga
çandiya rezan
dewlemend ji hene

avê de heye. Bê pêwengên topografi, kurd dikarin xetên avê ji kanî û cogeyên avê li jor heta deverên pêwîst bikşînin û dar û barêne xwe pê avbidin. Kurdan li ser piştên ciyan wek sewkiyan, zevî avakirine û wan bi vî rengî rûberê zeviyên xwe ferehtir kire. Şanayîbas e zeviyên wişa, li welatên me ewên ku bi ferhenga çandina rezan dewlêmend jî hene; çandıya zevî û darêne fêkiyan û avakirina erqên avê taybetmediyeke kultura gelê kurd e.

Welatê kurdan wisa xweşik e û ezmanê wan jî wisa geş e ku e ew bi dil û canê xwe pê ve girêdayî ne. Dema ku Hafiz Paşa di sala 1838 an de, xelkê çiyayê Xerzan bi şûr û êgir ji cî û warêن bav û kalan derxistin û ber bi çiyayêن asê ve ajotin û wexta ku kurd li wan çiyan bê nan û av man, serokên wan hatin ber deriyê konê serwer (yê biserketî) û daxwaza rehm û dilovaniyê ji wî kirin. Paşa, xên ji koçkiri-na kurdan ji çiyayêن wan ên asê û bicikirina wan li deştên dûz, tu rêkên baştır nasnedi-kiр ku vî gelî bi temamî têxe bin destê *bab alalî*. Paşa soz da ku eger kurd bi vê yekê ra-zî bibin dê ew bi deh qatan bêtir zevî bide wan (di rewşe-ke wisa de pêşê sozê her tiştî dida); paşa her weha soz da ku kurd dê sê salan ji bacê bêن rizgarkirin; paşa ji kur-dan re diyarkir ku ew dê li şû-na çinîna darêن tuyê û xudîki-rina pez, herîr û hespan xudî bikin û bi vê yekê ewê gelek

dewlemend bibin. Ev sozên Hafiz Paşa ji kurdan re mîna sozên ku tu bidî masiyekî û jê re bêjî ji avê derkeve û here li ciyekî bilind hêlinkekê ji xwe re ava bike û tê de bijî. Mezinên kurdan bi dilekî xemgîn li ezmanê hêşîn temâse dikirin û pesna her tiştekî ku ji wan re dihat gotin didan. Piştî ku tirkan gelek diyarî dan wan, ew vegeŕîn û çûn û ji xelkê xwe re behsa tiştê ku bihîstine kirin.. Gava ku kurdan gotina koçberiyê bihîstin, jin û zarokên wan jî dest avêtin çekan û dest bi berxwedanê kirin; tenê piştî dubarekirina kuştin û wêrankirinê û serkutkirina serhişkan şer bi dawî bû, lê projeya koçkîrin û bicikirîna kurdan li deştan bî serî nebû û tirk mecbûr man ku dest ji vê yekê berdin.

Kurdistan komek ji gund û cîwarêni jihevbayî ye û hîç giredanek di navbera wan de nîn e. Pir kêm mirov rastî ke layeke kevin a birçkîrî û asê li ser pozê ciyayekî an li newalekê te. Ew jî ji bo rabûn û rûniştinê bikar tê, lê belê ji bo xweparestinê di demên metirsiyê de, têن bikaranîn. Tu kes ji van mîrên biçük desthilda-riya xwe li ser perçeyekî bi-çük jî li vî welatî nake; tenê di demên destengî û tengasiyê de peyayêni mîna begê Rewandozê, Bedirxan beg Seyîd beg dikarin bi zehmetî tîreyek ji hevwelatiyêni xwe di bin ala xwe de bicivînin. Ewêni ku dicivin jî zû ji hev belav dibin

û ji bilî xaniyêni xwe ew tişte-ki din naparêzin. Sedema qelsbûn û bêhêziya vî gelî ji her ev e. Eger yekîtiya kurdan hebûya, dê tu kesî zora kurdan nebira, lê kurdek tu carî naçe hawara kurdê din; dema ku Reşid Paşa û Hafiz Paşa devereke kurdan dager dikirin, kurdên devera din tenê bi roja xwe difikirin û kêfxweş dibûn ku tu pêwendîya wan

minekî xeternak. Waliyêni Bexdad û Diyarbekirê tenê wê demê dikaribun zora kurdan bibin, dema ku leşkerekî ji 50 000 peya li dijî wan dikete şer, di demeke wisa de pêwîstiya tirkan bi wî leşkerî li cihekî din hebû, yanê li dijî İbrahim paşeyê Misiri. Tirk ji her kesî baştîr dizanin çiqas qurbanî ji peyan, bûjen û pereyan pêwîst e, ta ku ew bika-

Mezinên kurdan bi dilekî xemgîn li ezmanê hêşîn

temâse dikirin û pesna her tiştekî ku ji wan re dihat gotin didan. Piştî ku tirkan gelek diyarî dan wan, ew vegeŕîn û çûn û ji xelkê xwe re behsa tiştê ku bihîstine kirin. Gava ku kurdan gotina koçberiyê bihîstin, jin û zarokên wan jî dest avêtin çekan û dest bi berxwedanê kirin.

bi yên din re nîn e, lê di demeke kurt de, tirkan dajote ser wan jî.

Li beramber ereban, ewêni ku bi temamî berevajî vî gelî ne, kurd digihîjin sînorê xwe yê sirûştî, li wan deşt û dûziyan cîwarêni kurdan ji alî si-warêni ereban ên gerok ve têne talankirin. Ne şerê ereb dikare zirarê bi bazê kurd di hîvîn wî yên ciyayî de bigihîne û ne jî bazê kurd dikare zora şerê bibe, eger ew di deşt û dûziyêni xwe de bimîne. Eger rewşa hundiriya Dewleta Farisi başbûya, ew jî ji ber nêzîkahîya wê ji kurdan ve, dikaribû ji kurdan re bibe dij-

ribin tenê çend salan Kurdistanê di bin zora xwe de bihêlin û talan bikin. Lê dîsa jî tirk mecbûr mabûn van qurbanan bidin, çimkî bê xêr û berên Kurdistanê wanê qet nikarîba barê *statusko*⁽¹²⁾ yê giran heft salan hilgirin. Dema ku topxaneya tirkan, li ser pişta hêştiran an jî bi desten mirovan digihîste newalîn ciyayî, tu çekeke kurdan a dijber tunebû ku ew li dijî wê topxanê bidin xebitandin, lê dîsa jî hin kelayêni kurdan ku di hundirê wan de tenê 40-80 peya hebûn 32 heta 40 rojan tevî hemî zahmetiyan li berxwedidan.

Di nav kurdêñ dorgirtî de, nexweşî û birçîbûneke dijwar destpêkiribû, lê dîsa jî hemla-ya Hafiz Paşa tenê ji ber wê yekê zû gihîstibû armanca xwe, çimkî wî kurd bi kurdan dabûn kuştin.

Her ew mîrêñ ku li deştê yên ku di bin alêñ tirkan de bêdil diçûn şer, berê senger, gund û çiyayêñ xwe li dijî tirkan bi mîrxasî diparastin. Merema kurdêñ ku hevalbendiya tirkan dikirin dizî û talan bû, û merema kurdêñ din jî hezkirin û evîna welêt e.

Sirûsta welatê kurdan kêm derfetê dide wan ku ew bi hespan biçin şer. Siwarêñ kurdan bi hespêñ xwe yên rewan û pir baş hîna bi tîr û kevanan an jî bi darê xizêranê çekdar in; dawiyêñ riman jî bi perêñ serperzikan xemlandî ne; siwarêñ kurdan her wisa mertaline gilover ji selekan ku eyar jî kişandine ser, hildigrin. Li beramber vê yekê sûrê ji hesinê Şamê yê dirêj, xweşik û xemilandî, di destêney peyadeyêñ kurdan de sîleheke pir bi tirs e, bi taybe-tî li wan deverên çiyayî û asê. Ji bilî vê, di neteweya kurd de, hêzeke berevanî û parastîna sirûştî jî heye û eger Rûs hewldana dagîkirina welatê kurdan bikin, ewê rastî berx-wedaneke mezin bêñ. Rûs dê

rastî ser wê serhişkî û dijwariyên şerên çiyayî bêñ, ên ku ew li Qefqasê dibînin, her çiqas li wir nêzîkahî û derya ji wan re dabin alîkar.

Ligor vê nêrînê jî, tiştekî din derdikeve holê, ew jî ew e ku kurd di êrişê de, gelek qels in. Dibe ku bajarêñ ku li dervayî herêma wan in ji wan re

leta Osmanî re ne wek a Misirê xeternak e; divê mirov li qetandina Kurdistanê wisa binêre wekî çawa tepilek (perçe) ji bedenekê tê qetandin, a ku berê jî gelek tepil jê hatine birîn.

Niha wisa diyar dibe ku hêza leşkeriya tirkan a ku li Asya vala maye, dê dîsan

Di nav kurdêñ dorgirtî de, nexweşî û birçîbûneke dijwar destpêkiribû, lê dîsa jî hemleya Hafiz Paşa tenê ji ber wê yekê zû gihîstibû armanca xwe, çimkî wî kurd bi kurdan dabûn kuştin.

Her ew mîrêñ ku li deştê yên ku di bin alêñ tirkan de bêdil diçûn şer, berê senger, gund û çiyayêñ xwe li dijî tirkan bi mîrxasî diparastin. Merema kurdêñ ku hevalbendiya tirkan dikirin dizî û talan bû û merema kurdêñ din jî hezkirin û evîna welêt e.

mîna gefş û sistiyekê bin, ji ber ku leşkerên dagîrker dîkarin her dem wan bajaran talan bikin û di nav dîwarêñ wan de, xwe ji roja germ biparêzin û haziriyêñ xwe ji êrişen din re bikin. Mûsil û Bexdad wek mînak, bi temamî li dervayî bandora kurdan in. Loma ez di vê serhildana nû de, tu metirsîyê ji Dewleta Osmanî re nabînim. Kurdistan tu caran nebûbû beşekî sirûştî ji bedena Dewleta Osmanî, ew tenê bi şeweyekî mîkanîkî bi herêmên din ve hatibû girêdan. Ji ber vê yekê zirara qetandina Kurdistanê ji Dew-

têkeve kar û deşt û newalêñ xweşik, zad û dexlan têxe bin solêñ xwe û gundan bişewitîne û weke carêñ berê, dê ew hin deverên kurdan bi zorê têxe bin destêñ paşayêñ xwe. Ev rewş jî wisa dide diyarkirin ku herdem, wexta tirk bacê an leşkeran kom dîkin, kuştin û wêrankirin jî ji bo pêkanîna vî karî pêwîst dibe, ev jî rewşa vê împaratoriye bi temamî tîne ber çavan; ev împaratoriya ku Ewropa ewqas dixwaze biparêze û gelek hêzên xwe yên bejehî û derayî ji bo vî karî terxan dike.⁽¹³⁾

ŞEREFNAME ÇWAR SEDE YE NEMIR E

Dr. CEBAR QADIR

(Ji erebî: A. Babekir Pijderî)

Emsal salê 1997 Kurd bi honey têperbûnî 400 sal bi nûsînî yekemîn kitêbî mêtûyî derbarey Kurd û Kurdistan a-heng dicêre, ke ta ku êsta gi-hîsto ta detî ême. Le rastî da le gelê kitêbî mêtûyî tir da amaja kirawa bo hendê nûsînî dîke le pêş kitêbekey Şeref-xanî Bidlisi da ke be heq be

bawki mêtûyî kurdî dizanirê. ibnel Nedîm le kitêbî Fehres de namey nûserî kurdî zirek le sadey nuhem de be Ebû Henîfe El Dînûrî(820-896) hêname ke be nawî Ensabul Ekrada. Lem kitêbe pir girînge ke be tenya êsta nawekey gehîstote destî ême. Her mirovîkî Şareza le ser reşî Kurd û Kurdistan li mêtûwa tenha

dizanet ke wa mêtûyî şarista-nî em gele çown têkdirawew xirabkirawa ke yek ke li xewanî şaristaniye here koneka-nî navçeka. Le ayînde de rastî zortir le sernûsrâwî mejûyî derbarey Kurd derdekewê. Beher hal ta êsta Şerefname yekemîn kitêb e, ke le ser mêtûyî Kurd nûsrabêw, kewtibe destî ême. Em kitêbe le du bes pêk hatûwe; besî yekemyan: Şerefname be giştî basî mêtûyî imarete kurdîye-kanû malbate be nawbane-kanû serkirde û serokeşîrete-kanû Kurdistan deket le nîyanî 400 sal da ke li sedey şaz-dehem de kotayî pê dêt. Em heşey le nawerastî mangî gelawêjî salî 1597 kotayî pê hêname. Yekser destî be nûsînî besî duwem kirûwe be na-wî "El Hatîme." Emeş taybet e be basî rûdawe be nawban-gekanî nêwan herdû dewletî Osmanî û Îranî le miyanî ew cend sale da û le rezberî 1598 da kutayî pê hêname.

Le nêw kurd da tenya besî yekemîn kitêbekey navbangî heye. Zorbekemî basî besî duwem deken, her çende zor giring e û zanyarî, girîngî têda ye le ser kesyetî kurd, le nêw ew du dewleta mezine da. Nawî Şerefşanî Bedlisi le serçawe mêtûyekan da, be gelê çesm hatiwe; Wekû Emîr Şeref yan Şerefedîn her çende Xan yan Emîr ewane leqeb ïn, belam, em mêtûnuse be nawî Şerefşanî Bedlisi naw-bangî derkirduwa. Gişt serça-wekanîş her wayan naw bir-dûye. Emeş lêre da her bew

Fîgûrek ji Şerefnameye



core nawî debeyn. Be rastî ew bixoy le pêş herkesekîtir da basî jiyanî siyâsî û zanistî xoy kirduwa. Le kotayî besî yekem da, basî rûdawe girîngekanî jiyanî xoy dekat.

Şerefhan le 25'î Şubatî salî 1543 le şarî Grîhrûd nîzîkî şarî Qûm le Îran le dayîk biwe. şemseddeînî bawkî le eşîretî Rojekî biwe le layen Osmaniye Kanewe 7 sal le pêş le dayîkbûnî Şerefhan le paşayetî Bedlîs (Bakûrî Kurdistan) ladirawe, le ber ewe bo Îran roniştewew pişgirî le Sefewiyekan kirdiwe le dijî dewletî Osmanî lewêş jînekî le emîrekanî bayîndorekan hêna bawkî daykî Şerefhan piyawî Hasan Tawil bû ke be nawbangtîrîn Sultanî Akko-yunlo bû. Emîri Tokat bû, paşanîş Erzîcan. Şerefhan basî bapîrî xoy dekat ke le erzîcan qutbxanew, mizgewt û cêgey asay zorî le paş becê mawew ta nûsînî Şerefname her mabûn. Şerefhan mindalî û beşêki gencêti xoy le Îran le nîw dewletî Şahînsahî be ser bird. Ke gihişte temenî 9 salî, le 1552 çûwe koşkî Sefewî biwe hawrêy kurekanî paşaw, emîrekanî ew dewlete.

Lem bareyewe Şerefhan delî ke şah gewretirîn zanaw mamostay bo hêna-win bo fêrbûn û qedexey kirdiwe ke têkelî xelkî reş û rût bin. Mîdalekan le sereta da fêri zanistî ayînî, quran xîwêndin debûn. Paşanîş fêri siwarçakîw şerkirdin û jiyanî serbazî dewlet berêwebirdin dekran. Şerefhanî mindal paş sê sal

xwêndin lew qutabxaney Şahînsahiye tewaw dekat û hendêk karûbarî dedene dest ke le gel temenî ew naguncê. Le salî 1555 da bawkî destî le kar berdaw le mal danişt. Piyaw maqûlanî eşîretî Rojekî dawayan le Sha kird ke Şerefhan le ciyatî bawkî bikata emîri eşîreteke. Ewîş be qesey kirdinû Şerefhanî kirde emîri Rojekî her çende, temenî ew duwazde sal bû. Le heman kat da Şah kirdiye emîr le ser Slêman û Mahmûd Abad le Nawçey Azerbaycan. Le ber ewey temenî biçûk bû, bawkî emîri eşîretî Bîlbasî Kurdî le gel nard ta we kû le Berêwebirdinî nawçekan da harîkarî bekat. Belam emîri Bîlbas le salî 1558 da mird û Şerefhanî biçûkîş neytawanî be tenya karekey xoy encam bida. Ci-

we lay Şah daway lêkird bînêrêt bo cêyekî dike. Şah nardî bo Hemedan ke le katî xoy da paytextî împaratorî Medekan bû ke be bapîre gewrey Kurdi êsta dejmêrdirê. Ew demîş Mehmed Begî xalî Şerefhan hakîmî ew şare bû.

Wa diyare malî Şerefhan le layen daykiyewe ziyatir deselatdartir bûn. Lewê keçî em xaley xoy hêna-bo mawey sê sal le Hemedan mayewe. Ke nîwanî Împiratoryetî Osmaniî Sefewî xirap bû. Bawkî Şerefhan bang kire bo paytextî Qezwîn kirayewa serokî Rojekîw hakmî Grîhûrd le nîzîk Qûm. Belam wekû Şerefhan basî dekat bawkî hêzî bem karane nebû. Cûnke bawkî deywîst carêkî dike emîrayetî Bedlîs bigirêtewe dest. Belam Şerefhan ke le Îran le dayik bibûw her le wêş gewre bibû gelêk arezûmend nebû bigerêtewe bo Bedlîs. Ke bawkî destî lew karane berda le salî 1566 da Şerefhanîyan le ciyatî dana. Ew parey dekewte destîw le ser piyawekanî xoy serfi dekird le İsfahanewe boy dehat, belam xoy bo mawey dû sal le paytext mayewe. Le salî 1568 da Şah nardî bo serkut kirdinî ewaney le beramber deselatî dewlet da le nawçey Geylan helgerabûnewe. Bêguman em kareş helêkî behadar bû bo Şerefhan ta wekû Ciwamêri Zîrekîw zanayî serbazî xoy bo Sha biselmênê. Şerefhan basî azayetîw ciwamêri xoy le beramber helgerawekan

Wa diyare malî

Şerefhan le layen daykiyewa ziyatir deselatgartir bûn. Lewê keçî em xaley xoy hêna-bo mawey sê sal le Hemedan mayewe.

Ke nîwanî împiratoryetî Osmaniî Sefewî xirap bû. Bawkî Şerefhan bang kire bo paytextî Qezwîn kirayewa serokî Rojekîw hakmî Grîhûrd le nîzîk Qum. Belam wekû Şerefhan basî dekat bawkî hêzî bem karane nebû.

dekat û têyda basî karî kuştinû birînîş dekat. Bêguman ew karaney biwe cêgay rezamendî Şaw namey supasû stayşî xoy bo rewane kirdiwe, paş be serbirdinî 7 sal le Geylan, Şah, Şerefxan dênete lay xoy bo şarî Qezwînû bîryar deda lay xoy bîhîlêtewe. Belam zû be zû Şerefxan hest be kêşew naxoşî nêwan serkirde Qizilbaşiyekan dekad le beramber Şâ'daw belam Şâ le ber gewreyî temenî natwanê çare-serékî ew barûdoxe bika. Boye Şerefxan dawa le Şâ dekat rewaney cêgayekî dikey bikat, ewîş deykate emîr le ser nawçey Şîrwan le Azerbeycan. Paş 8 mang Şâ Tehmasîb demirêw textî paşayetî ran dekewête dest Îsmâîlî dûhem,

ewîş Şerefxan dênete paytex-tû deykate emîrî gişt Kurdanî Kurdistan û loristan û Goran. Wate Şerefxan debete deselatdarî hemû ştêkî taybet be gelî Kurd. Şâ fermanî da ke her ştêkî taybet be şwêname hebû bixrête ber çaw Şerefxan û ewcar ew. Em kare biwe cêy dilresî hendê le mîre Qizilbaşiyekan, boye pîlanêkyan dirûst kirdû çûne lay Şâ û pêyan got ke Şerefxan be harîkarî hendê le mîre Qizilbaşekan deyanewê kû-detayek be ser Şâ da biken û Sultan Husêن Mîrzay biray bikene Shay İran. Şerefxan basî emey kirdiwew delê ke Şâ mirovêkî sadew nefam bû be gişt diroyek bawerî dekird, boye bo razîkardinî mîre Qizilbaşekan Şerefxanî le paytext derkirdüew kirdûyete mîrî Naxçewan.

Her çende gelê deselatî xoy le dest da belam ew em kare be helêk dezanê bo ewey le cêy baw kû bapîranî xoy nizîk bêtewew carekî tir bigerêtewe bo Bedlîs delê paş salêk û çwar mang Xesrew Paşa ke emîrî nawçey Wan bû, be nawî Sultan Muradî Osmanî bangî deka bo Bedlîs û delê sultan bîryarî dawe bigerênêtewe bo serokayetî emaretî Bedlîs Osmaniyekan wîstiyan dûrxîstnewey Şerefxan û tûreyî şâ bikene behaneyek û Şerefxan bo lay xoyan rabikêşin le kêşey nêwan ewan û dewletî Sefewî da. Çunke Kurdistan le nêwan ew dû dewleta da, cêgay cografiw strayejî girîngî hebûw a-

zayetî eşirete Kurdekan le şerda rolekî mezinî hebû lew kêşane da. Şerefxan bas dekat ke xoy û 400 piyaw le seretay kanûnî yekemî 1578da le Nexçewanewe berew Kurdistan berê kewtin. Lewê da zor begermî le layen Xesrew Paşaw mîrê Kurdekanewe pêşwazîyan lê kira. Xesrew Şâ nameyekî bo sultan nardû basî hatînî mîrî Kurdan dekat û sultanîş kirdiye mîrî Bedlîs û şîmşîrêkî zêrinî be diyarı bo nard. Herweha Sadîrazam Muhammed Paşaw serokî giştî leşkirî Osmanî Mustafa Paşa silaw û rîzî xoyan bo emîrî Kurd rageyand. Diyare em silaw û rîzlînane cêgey girîngî Şerefxan bo lay Osmaniyekan derdexat. Wekû delen Şerfexan lew rojewe ta 10 sal palpiştî Sultan Muradî sêhemî kirdiwe le beramber hêris û deselatî raniyekanû herweha bo dagîr kîrdînî nawçey Qefqas. Harîkarî mîrî Kurd cêgey rezamendî Sultan biwe çunke le namekanî da be "Hevalî hêja Şerefxan" "nawî deba. Hemû katê be Şerrefxanî degot: Hîc katê dilsoziw wefadarı ew le beramber dewletî Osmanîda le bîr nakat û pêwîs te bizanê ke herdem cêy rîzû xoşewîstî Sultane. Sebaret bo hêrsekanî bo ser Qefqas le salî 1852 da nawçey Müşî'sî xiraye ser emaretkey û mangakey biwe 410 hezar Akçe ke hîc mîrekî dikey dewletî Osmanî ew pi-lew pareyey nebû.

Hêndey pêneçû Şerefxan le temenî 53 salî da destî le

Serçawekanî Şerefxan

birîtîn lew zaniyarîyaney ke destî kewtubûn û le ser çawê rojhelatiyeka. Ew derfetî ewey hebû ke lêkolîneweyekî wîrd lem bareyewa bikew sûd le pirtûkxanekey binêmalekey werbigirê herweha lew çîrok û be ser hataney ke piyawê pîrekan deyan gêraweya, ew zor bayaxî bewa deda ke le rastgotirîn kes zanyarî werbigirê.

mîrayetî berdaw bo Ebulme-
alî Şemseddînî kurî cê hêştû
xoy rûy kirde xoşewîstekey
ke mêtîwe be giştîw mêtûw
Kurde be taybetî. Be tewawî
nazanîn Şerefxan çî salêk
mirdiwe, belam yek le newe-
kanî ke Ziya Şerefxan e delê
le salî 1603 yan le 1604 da
mirduve. Şerefxan be pêy e-
wey ke derbarey xoy nûsî-
wiye, her le mindalyewe takû
temenî 60 salî zor arezûy
xwêndinewew têkelawî bûn û
nizîkbûnewey le xelkî zanaw
nûseran biwew hîç katêk le-
wan cûda nebotewe. Le hemû
zanistekan ziyatir hezî le me-
jû kirdiwe, her katêk hestî be
narehetiw diltengî bikirdaye
pertûkî mêtjuj jiyanî serkir-
de konekanî dexwêndewe.
Her wekû wîtman le katî
jiyanî xoy da be baştîrîn şewe
xwêndûyetîw baştîrîn per-
tûkxaney ew katey le ber
destada buwe. Ke hêzakanî
Osmanî le salî 1676 da
hêrşeyan kirde ser Bedlîs per-
tûkekanî Şerefxan bo Esten-
bûl gwêzirenewew gerokî
Turkî benawbang Ewliya Çe-
lebî Serjmêrî pertûkekanî
Şerefxanî kirdiwe bu ewey bo
Estenbûl bigwêzirênewe. Be
pêy witey ew pertûkxanekey
Şerefxan ziyatir le hezar per-
tûkî tê da bûn û birîtî bûn le 6
barî huştir. Herweha pertûke-
keanî be şeweyekî ciwan le
berg dirabûnû pirbûn le
wênew neqşî ciwan. Ew per-
tûkane derbarey ayîn û
mêtûw ziman û zîndewerza-
nîw riwek nasîw anatomîw e-

deb û helbestewe nûsrabûn,
herweha pertûkekanî wêney
zor ciwanîşyan têda bûn.

Şerefxan le salî 1588'ewe
hewlî dawe zaniyayrî bo
kitêbekanî kobikatewe. Şeref-
xan ew hoyaney ke hanîdan
bo ewey kitêbekey binûsê
bem şeweye basî deka: "Le
ber ewey taku êsta mêtûnûse-
kan hîçyan derbarey Kurd û
Kurdistan nenûsîwe, boye
biryarim, da pertûkek benawî
binûsim. Hîway min eweye
ke swênewarî binemale be-
naw bangekanî Kurdistan
win nebê." Derbarey em per-
tûke rojhelatnasî Rûsi Vasîli-
viya ke Şerefnamey bo zmanî
Rûsi wergêrawe delê: "Baye-
xî zanistî kîtêbeke be şeweye
ke pêwîst be lêdwan naka.
Be hoy Şerefnameye cêgay
gîringî belam piştgwê xirawî
geli Kurd le rûdawekanî roj-
helatî nawerastda detwanirê
diyarî bikirê".

Şerefxan katê ke biryari
dawe pertûkêk derbarey
mêtûy Kurd û Kurdistan bi-
nûsê ewe nîşan deda ke

Şanazî bewewe kirdiwe ke
eslî kurde, herçende barûdoxî
kurd lew serdema zor xirapîş
biwe Şerefxan le pertûkeda
zor car tekîd le ser ewe dekat
ke Kudistan hîç katêk serî bo
dagirkiran sor naka. Herweha
yekem kes biwe ke hewlî da-
we sinûrî cografi bo Kurdistan
diyarî bika ke le Malatya-
we taku Bendawî Farsî dest
nîşankirawe.

Şerefxan le Şerefname
hewlî dawe ke tenha xoy be e-

mîr û fermanrewayekî Kurd
danenê belku xoy wekû mêtû-
nûsêkî Kurd danawe ke le
nawber hîç kesêk weku ew
em core karey encam nedawe
Bem şeweye nawî ewîş ecête
mêtûwewe. Berastîş selmandî
ke le mêtû şarezayew le dar-
gâyekî dawe ke le mewber
kes lew dergayey nedawe,
çünke hemû pirtûkekey bo
mêtûy Kurd terxan kirdibû.

Le layekî tirewe girîngî
kitêbekey Şerefxan bo ewa
dagerêtewê ke xoy be şewey-
ekî çalak besdarî le zorbey
rûdawekanî ew nawçeyî kir-
duwe ke le sedey 16 da rûy-
dawe. Lew sedeye da bû ke
Kurdistan bo yekem car le
nêwan dewletî Osmanîw, Îranî
da beşkira. Em sedeyew nî-
way yekemî sedey ayînde rû-
berûbûneweyekî tundî bo
deshelat sepandin be ser Kur-
distan da le nêwan ew du
dewlete da bexoyewe bînî.
Nûser her çende le zorbey rû-
dawekanda layanêk biwe be-
lam legel eweş da le baskirdi-
nî rûdawekanda be şeweyekî
bêlayen basî kirdûn.

Bo nimûne Şerefxan be
heman şewe basî Şah Tehma-
sib û Sultan Muradî sêhem
deka be mercêk ew dîwanî
zor dujminî yektirî bûn.

Serçawekanî Şerefxan
birîtin lew zaniyariyaney ke
destî kewtubûn û le ser çawe
rojheliyeka. Ew derfetî e-
wey hebû ke lêkolîneweyekî
wird lem bareyewa bikew sûd
le pirtûkxanekey binêmale-
key werbigirê herweha lew

çîrok û be serhataney ke piyawe pîrekan deyan gêraweya, ew zor bayaxî bewa deda ke le rastgotirîn kes zanyarî werbigirê. Le ber ewe bîrûrakanî ew pesind kiraw bûn û dûrbûn le helkêşan û pêwenan le ber ewe le serçawe rojhilatiye kilasiyekan cuda dekirayewa. Her le ber ewe Vîliyamînov Zîrnov pertûkî Şerefnamey be ştêkî nayab danabûw bem şeweyle wesfi deka: "Mawey 300 sal e le rojhelat nûserékî tir dernekewtuwe ke munafeseley bika."

Bew lêkolîneweyey derbarey mêtjûy xêlû eşret û bine mal Kurdiyekan boşahiyeckî gewrey le mêtjûy gelanî Asya pir kirdewe. Kitêbî Şerefname be serçaweyekê girîng

dejmêrirê bo lêkolînewey mêtjûy Rojhlatî Nawerast betaybetî le serdemî hêrişî Tatar û Türkmanekan û lenawçûnî dewletî Ebbasîw peydabûnî Ak koyunlow kara koyunlû. Lew serdemî mêtjûwe da bêrge le Şerefname serçaweyekî tirî rôkûpêk derbarey mêtjûy Rojhelatî Nawerast û dûrdest nakewê.

Hacî xelife ke nasrawe be Katib Çele bîw Ewliya Çele bîw beşekî zor le nûsere benawbangekanî Osmani pertûkî Şerefname sûdiyan wergirtûwe.

Pitûkî Şerefname her le ziweye serincî gelek rojhelatnasî Ewrûpayî benawbangî rakîsawe. Emeş egerêtewe bo pênasekirdinî Mîrbilo ke le

salî 1776 da le pirtûkî "Pertûkxaney Rojhelat" da bo Şerefname kirdibû. Herweha Sîr John Mal kolmî İngiliziye kem kes bu ke destnûsî Şerefnamey destketibûw zaniyariyeckî zorî lê wergirtibû lew pertûkey ke derbarey mêtjûy İran newe daynabû be karî hênan Mîsyo Katirmîrî Frensîş bo pertûkî "Mêtjûy Mexolî İran" Sûdî le Şerefname wergirtibû.

Le Rûsyâ jimareyek le rojhelatna-

san weku Volkov û Firîn le pirtûkî Şerefnamey kolîwetewew sûdiyan lê wergirtiwe, pêş ewey Vîlyanov Zîrnov le salî 1860 da la şarî Sant Petersburg da be pêşekiyekî Ferensî le çapî bida Şayanî wîtinke ke Şerefhan pertûkey be Farisî nûsîwew bo zorbey ziman wergêriraw. Yekem car bo Turkî le salî 1667-1668 da be şêweyekî kurt le layen Muhamed Beg kurî Ahmed Begî Mîrzawî wergêriraw. Wergêranî dûhemîş her bo Turkî biwe belam be şêweyekî dûr û dirêj biw le salanî heştakanî sedey 17 da le layen yekêkewe kirawê ke na wî Samî biw bo emîrî Kurdî Mustafa kirdûyetî. Ew wergêriwane çap nekirawin belam êsta çend nusxayekî destnûsî le pertûkxaney San Peterburgî gîşfin.

Herweha Mele Mahmûdî Beyazîdî zanay Kurdî be nawbang le salî 1858-1859 da Şerefnamey bo zimanî Kurdî wergêra, ewîş le ser dawakarı Aleksander Japay Rojhelatnasî Rûsî biwe, ta ku êstaş destnûsî wergêrirawe Kurdiyeke le Pertûkxaney Sant Petersburg'ı daye.

Le heman kat da H. Barb le Viyanna Şerefnamey bo Zmanî Elmanî wergêraw le nêwan Salanî 1853-1859 da be pêşekiyekî puxtawé bilawî kirdewe.

Profesor F. Şarmua'y Frensîş ke le hemû rojhelatnase Ewrûpayî yekan zimanî Farisî baştir dezanî, Şerefnamey bo zmanî Ferensî



Wergêraw le çwan berg da le nêwan salanî 1868-1875 da bilawî kirdewe. Be gwêrey serçawe mêtûyî yekan wergêr le mawey 30 sal da ew pertûkey wergêrawe.

Şerefname du car bo zimanî Erebî wergirawê yekemyan le layen Cemîl Rojbeyanî zanay Kurd le Bexda le salî 1953 w duwemîyan Muhemmed Ali Ewnî zanay Kurd le Qahîre le salanî 1958-1963 da kirawê.

Wergêrirawî Kurdi Şerefname le le salî 1973an da le Bexda le layen Şaîrî Kurdi benawbang Hejar Mukriyaniyewe kirabû. Lêkolerewey Kurd doktor Mihîrdat Îzadîş çend salêke xerîke be wergêranî Şerefname bo ingîlizî.

Le pertûkî Şerefname da ew serçawe rojhelatiyaney ke nûser sudi lê wergirtûn be bê ewey ke be ser ew serçawane da biçêtewew rexney lê bigirê, bikarî hênawin. Belam ew staney ke le xelkiyewe werîdegirtîn zor be wîrdî le rastiyekewew diway ewey ke tekîdî le rastî ew beserhatû gérane we dekird, bo pertûkey be karî dehênan.

Mêtû le lay mêtûnuse rojhelatiyekan birîti bû le mêtûyî taqmî deselatdar û mîr û binemale nawdarekan. Belam xelkî jérdestew hejar tenha debwaye gwêreyalî ew taqme deselatdarane bê. Diyar e ew

şîteke bo nûserî Şerefnameş herwa biwe ke xoy mîrî kurî mîr biwe.

Şerefjanî Bedlîsî beşî yekemî pertûkekey ke be Şerefname nasirawê, bo mêtûyî Kurd û Kudistanî terxan kirdiwe. Ewîş herwekû mêtûnûsanîtir pertûkekey be supas bo xwaw stayışkirdinî Pêxember û Sultanî Osmanî dest pê kirdiwe. Paşan amaje bo zanistî mêtû dekaw le sery hemû huner û zanistekanî daddenê, herweha basî peywendlî xoy bew zanistewew xwêdînewey zorî lem babetew ew honaney ke palî pêwenawîn bo nûsînî pertûkeke deka.

Le pêsekî pertûkeke da basî esl û resenî Kurd dekaw hewil deda sinûrî cografi wîlatekey bikêşê, dway ewe basî binemale Kurdiye deselatdarekan dekaw bo ciwar grup dabeşyan deka.

Grubî yekem ewa nen ke dewletû hikûmetiyan damezrandiwê alay taybetiyan hebiwe wekû Eyûbiyekan le Misir û Şam û Hûsnewiyekan le Diyarbekir û Cizrew, Şarezûr û Fezlewiyekan le Loristan.

Grubî dûhem ewanen ke daway serbexoyiyan nekirdiwe belam hendêkiyan pareyan le çap dawew rojanî inî le katî niwêjî inî da nawyan le mîmberî mizgewt da hatiwe wekû mîrî Erdelanî û Hekarîw Badînan û Botan. Ew ka-

tey ke Şerefjan kitêbekey nûsîwe wa biwe. Belam hindik lew imaratane dway ewe daway serbexoyiyan kirdiwe lew pênewe da hewliyan dawe. Grubî sêhemîş ew fermanrewaw emîranen ke le Kurdistan da mawinetewe wekû fermanrewayanî Mîrdasîw sason û Klês û Şêrwan û Zîrkîw, Swîdî. Belam ciwariyekî ew beşey bo grubî çwarem terxan kirdiwe ke brîtiye le jiyanî fermanrewayanî Bedlîs wate bawk û bapîranî nûser, ifîr beşeke be jiyanî xoy kotayî pê dênenê.

Belam beşî dûhem ke be kotayî nasrawe bo baskirdinî Sultanekanî Osmanîw, Şayekanî İranî cûda kirdotewe le salî 1278we takû ew rojey ke xoy têda dejya. Le peydabûnî binemaley Osmaniye le ser şanogerî rûdawe mêtûyîyekan le Rojhelatî Dûr, destî kirdiwe be baskirdinî mêtûyî nawçeve. Lew beşe da amaje bo hêrekanî Cengizzan û Holako w Teymurleng û Karakoyunlo w Akkoyunlo deka. Lew beşe da basî rolî mîre Kurdekan deka le kêşekanî nêwan Osmanîw Sefewiyekan. Herweha basî hendê le raperîne Kurdiyekan deka wekû raperîni Botanî yekan le Ergûş. Le ber ewe şitekî zor pesindû le cey xoyetî ke kurd le Kurdistan û le dûrre wîlat aheng be boney salî Şerfxan Bedlîsî we pertûkî Şerefname we bigêrê.

* Le eslî wîtarekeda amajeman bo çape ciya ciyakanî. Şerefname kirdiwe be taybetî be zimanî Kurdiû Rûsî ke le amadekirdinî em wîtare da sûdman lê wergirtiwe ke le esil da be zimanî Holandî nûsrawe. Le ber ewe be pêwîstman nezanî ke carêkî tir le paşmawey nûsînekan da amajey bo bikeynewe.

ŞAHIDEKİ KOMKUJIYA

GELİYÊ ZÎLAN

Bûyera Geliyê Zîlan û bûyera serhildana Agiriyê bi hev re ne. Di sala 1930'ı de, dema ku bûyera Agiriyê dest pê kir, ev serhildana li bakûrê kurdistanê di demeke kin de belav bû. Gelek cih hildane bin tesîra xwe. Kurdên ku ev serhildan dibihibitin, diçûne alîkariya Îhsan Nûrî Paşa. Ji Erdîş'ê, ji Patnos'ê, ji aliyê çiyayê Sîpîn(sîpan), kurd pê de pê de dihatine cem wî.

Wexta ku merivên Huseyn Paşa hatin ku herin Agriyê di nava Gelyê Zîlan re derbas bûn. Leşkerên Tîrkan bihîstibûn ku ewê werin û di wir de derbas bibin, pêsiya wan



Hecî Heyder

dibirin. Di nav leşkerên Tîrkan û merivên Huseyn Paşa de şer derdikeve. Di encama vî şerî de leşker bi piranî têne kuştin. Yê din jî dîl dikevin. Merivên Huseyn Paşa wan leşkerên ku dîl girtine, tînin di nava gundên Gelyê Zîlan de belav dikin. Dilê wan di leşker kuştinê de nîne. Gundiyêن Gelî wan leşkeran xwedî dikin. Nêzîkî du mehan xwedî dikin û dibin teslimê qereqolê dikin. Muxtarên gundan dema ku diçin teslîm dikin û dizîvirin şûn de îcar leşker li leşker bi ser wan de digirin. Bi gotinên şahidan serleşkerekî bi navê Dewrêş Beg hebûye. Di nava gundan de çiqas mirov hebin berhev dike. Jin, zar, kal û ciwan tevan tînin, di nava Gelî de li çar çiyan berhev dikin. Li wir qirkirineke giran pêk tînin.

Emin Karaca derbarê Gelyê Zîlan de, ji rojnameya Cumhuriyeta 16ê tîrmaha 1930'ı süd werdigre ji bo pirtûka xwe ya bi navê "Ağrı Eteklerinde Ateş û wiha dinivîse: "Ew gundên ku nêzîkdayîna wan bi "esqiyan" re heye bi tevayî hatine şewitandin. Gundî jî bi tevayî koçî Erdîşê kirine û li wê derê hatine bi cih kirin. Ewê ku li Gelyê Zîlan hatine tune kirin, ji 15.000î zêdetirin. Bi tenê yên ku ji ber mûfrezeyekê revîne û hatine kuştin bi texmînî 1000 hebe. Pênc hebê ku ji gelî revîne, dawî ew jî hatine teslîm bûne. Herba wir pir giran bûye û Gelyê Zîlan bi cendekan tijî bûye."

Di vê nivîsarê de behsa herbeke pir giran dike; lê xwendevanê delal hûnê jî bibînin ku ji ewê ku hatine kuştin hema bêje tu kesî ji wan li hemberê tu kesî şer ne kirine. Bi piranî

jin û zar in. Heta tevkujî dest pê dike jî hê kes bawer nake ku wê werine kuştin. Dema ku tevkujî dest pê dike hinek ji wan direvin, xwe davêjine daristanê. Hinek wan jî di binê cendekan de dimînin, wisa xilas dibin.

Piştî bûyera Geliyê Zîlan bûyer ne qediyane. Cih bi cih di gundên derûdora Gelî de dewam kiriye. Yek ji wan qewmînan jî kuştina şanzdeh mîrê Pêrtaxê ye. Di vê nivîsarê de xwendevanê delal, hûnê vê jî bibînin. Me navê wan ji Hecî Heyder pirs kir, lê nehate bîra Hecî Heyder. Wextê me jî tune bû ku em wan navan ji kesekî din bipirsin. Ji bo vê yekê em lêborînê dixwazin.



Hecî Heyder li vê derê behsa fermana Geliyê Zîlan dike. Diya Hecî Heyder jê re gotiye. Hecî Heyder bi xwe jî, di pêçekê de bûye. Singoyek li pişta wî dane, bi serê singo ve kirine, avêtine. Lê nemiriy... .



Tajdîn, birê min ê mezin bû. Li Hese Evdalê dixwend. Wextê ku ji Hese Evdalê tê diya min dibêje:

– Ezê ji te re karekî serjê bikim.

Dibêje:

– Na dayê, karekî serjê neke, ji min re xurekekî din çêke.

Diya min radibe jê re keşkê çêdike. Diya min got:

– Min dan bir çû mala Baylo kuta, ez hatim. Min dêhna xwe dayê ku du heb cendirme di nava gund de sekinîne. Pirsa mala muxtar dikirin. Sêniya min jî hê ser destê min e. Wexta çav bi min ketin, ji min mala muxtar pirsîn.

Em li Mirşûtê diman. Cendirme pirsa muxtarê Mirşûtê dikin.

Muxtar dîtin, jê re gotin, ku çiqas muxtarê gundan hebin, hemûyan berhev bikin, bila werine cem Alay Komutanî. Alay komutanî jî li jorê Xirabê Mirşûtê ye.

Got muxtar birin çûn. Tacdînê birê min jî bi muxtaran re birin. Ew kizîr bû. Birin çûn, li muxtaran hinekî nesihet kirin. Her

muxtarekî hinek cixare danê. Eskerek li pişt wan sekinibû. Wî eskerî got: “Alay komutanî çiqas cixare li muxtaran bela kirine, wê ewqasî diya muxtara..., ewqasî mîr ji wan bikuje.”

Wexta ku muxtar dizivirin tê, Tacdînê birê min dibêje, hal mesele ev bû.

Tu hema devê xwe ji hev hildî, ku her du gund birevin, ez bikevime destê hukumatê, ezê te bikujim!

Got, wî deng nekir. Wexta ku wî deng nekir, Tacdînê birê min gote xalê min î Ahmed, ew direvin dikevine dehlê. Daristan hebûye, dikevine nava daristanê, xwe vedîserin. Esker careke din dizivirin tê; çiqas mîrên gund he-ne, hemûyan berhev dikin. Destê wan bi coban, bi werisan girê didin, dibin diçine Çaxirbegê, pêşberî Mirşûtê, xefif makîne li wan dibarînin. Wan li wê derê dikujin.

Wexta ku ew kuştin îcar careke din ketine nava me, em bi hêşîrî top kirin.

Bi gotina diya min, qedera 60 heb hebûne. Wexta ku wan em hêşîr kirin, berê me dane Milkê. Milk jî, gundê 0ska ye. Ku wan em birin çûn kef hebû. Wan em dane wê guherê. Hêşîrên 25 gundan li wê derê mevcut bûn. Jin, zar, zarê pêçekan, em temam dane wê derê. Berê xefif makineyan dane me. Gotin bila kes netirse emê çend guleyan bi ser wan de biavêjin. Kaled rabû got: “Bercemalî Nûrî Mihemed selewat, kuro birevin ewê we hemûyan bikujin!!!. Di bin we re dehl heye, birevine dehlê!”

Wexta ku ew wisa dibêje, nezikî 200 mîr revî. Nifsîcîhana xwişka min û Zeynoya xwişka min wî çaxî zarok bûne. Ew her du jî li pey wan mîran revîbûn, xelas bûbûn. Ji wan mîrên ku revîbûn, zehfê wan hatine kuştin, ên din jî xelas bûbûn.

Diya min got, bûka min ser diyarê kendal bû. Jina Tacdînê birayê min û qîza wê jî di pûşê de bû. Min got, lawo were cem min. Were kendêl rûne belkî tu xelas bibî.

Got:


– Dayê ez çawa bême cem te? Dê kurê te

bibin bikujin, ezê jî werime cem te xelas bim? Welehî ezê hema li vê derê bim.

Diya min got min kir nekir nehat. Waxta ku nehat li wê derê em man. Alay komutanî emir da, emrê êgir da. Onbaşıyek li ser xefîf makineyê bû. Wexta ku emir da wî onbaşıyî, devê xefîf makînê hevraz kir. Atêşî nava me nekir. Yuzbaşî hat li ber sekînî, sîleyek ku lê da onbaşı pekiya. Wî bi xwe atêş kir. Ku atêş kir me êdî xwe nedît. Serî ji cendekan diqet-yan, me digot zîpik bi ser me de dibare. Lê da temam safî kirin, kuştin. Wexta temam safî kirin kuştin, esker bi çiyê ket çû. Qedera mangeyek, dudîyan di nav de hîşt. Got heçiyê birîndar ên ku serê xwe rakirin lêdin bikujin. Diya min sond dixwar digot, içar hatin, heçî yên bi pere bûn, ser piştê diavêtin, pereyê wan ji bêrika wan derdixistin. Ku sax bûya, lê dixistin dikuştin.

Got, min jî di erqê de xwe dirêj kir. Şera serê xwe di xwinê de kir, kişiande ser çavê xwe. Min pêçeka te jî girt avête wî aliyê coyê. Min dêhna xwe dayê du cendirme hatin şera ser serê min bilind kirin. Yeki got sax e, yekî got miriye. Ew ê ku got miriye:

– Heyran de bes e, me hinde xwîna van



Ewê ku xilas bûne yek ji wan ji diya Hecî Heyder e. Ew jî di pêçekê de di destê diya xwe de bûye. Ev bûyerên hanê diya Hecî Heyder paşê jê re gotine. Wî jî ev bûyer ji me re got. Dewsa ku di pêçekê de sungîk lê dane hê niha jî kifş e. Wêneyê vê hovitiyê jî, me ji bo xwendevanên hêja kişiand.

misilmanan vexwar, kuro hema bila yek dudu jê sax bîmînin, wê çawa be qey?

Yê din “Min dîn û mezhebê wan ...!”, got û kîfrî kirin. Li ser min re sekînîn, bi qûnda-xa tivingê çawa li min dan diranê min ên pêsiyê yek nema. Diya min got wexta ku ji min derbas bûn qareqara te bû. Tu digiriyayî. Ewê ku wisa li devê min neda, hema hat singo li pişta te da. Tu careke din avêtin aliyê min. Hema tu dengbirî bûyî. Min dêhna xwe dayê kalekî serê xwe bilind kir. Stûyê kalê jî hema wisa xefîf makînê lê dabû, ser rehekî mabû. Dêhna xwe dayê ku ez li ser xwe rûniş tî me got:

– Xuşka min, tu bidî xatirê Xwedê tu qurtek av bidî min.

Diya min gotiye “Ka ezê çawa avê bidim te. Coyek di navbera me re derbas dibe, temam xwîn e.” Ez rabûm min sola xwe derxist, bir çû tijî av kir, min lê da hatim. Min ew av da kalê. Qederekî sekînî, kalê jî mir. Min dêhna xwe dayê jinek li wir sekiniye, berî xeberdana me û kalê bû, du hev cendirme lê zivirîn. Singo li zikê jinikê dan. Zaroka jinikê bi serê singoyê ve rabû. Got wexta ku rabû wê jinikê got:

– Elhemdulilah şikir ku pêsiya mirinê, min zaroyê kurîn bi çavê xwe dît. Min heta niha zaroyê kurîn li ber çavê xwe nedîtibû.

Ew jinik jî qasekî bi şûn de ket mir. Em man. Ew esker ji ji nav me derketin çûn.

Şev hate nîvê şevê. Ez rabûm, min dêhna xwe dayê ku tu esker mesker tune. Min got ka ez teseliya dergûşa xwe jî bikim. Ez rabûm min dêhna xwe dayê ku hê ruh li ber te heye. Min got ka ez teseliya bûka xwe jî bikim. Min dêhna xwe dayê ku bûka min cihê ku lê rûniştiye eynê li wê derê mîna berê rûniş tiye. Dergûşa wê jî li pêsiyê

ye. Min got elhemdulîlah bûka min sax e. Ez çûm pê ketim min gazî kirê, kir nekir dengê wê tune bû. Tavehîv bû jî. Min kincê wê temam jê xistin, min dêhna xwe dayê ku tu derb merb lê tune ne. Hema pirtî xwîn li vê dera wê, li kêleka devê wê hatiye. Ew jî, dergûşa wê jî biecibûn.

Xwedê qebûl neke, lawo. Em çawa bikin. Wexta ku ez rabûm min dêhna xwe dayê, zarek ji wir ve hat, deh panzdeh heban dane pey min, em ji nava cinazeyan derketin. Em hatin. Gundekî Şêxan hebû, em hatine wî gundi.

Ev Mihyedînê xalê min, Xatûna xwişka muxtar temam pê re bûne. Mihemedê Behlûl ew jî pê re bûye. Îcar got em hatin Sarkoyê deriyê malekê. Me dêhna xwe dayê deriyê malê vekirî ye. Em çûne hundir. Wexta ku em çûne hundir, min dêhna xwe dayê jinikek nanê xwe çêdike. Nan dipêje. Girikên xwe çêkirine wisa li ber tenûrê mane. Jinik hildane birine. Ew jî kuştibûn. Ez rabûm min çira wan vêxist. Ketime kîlera wan. Min hinek rûn anî xwar. Tendûra wan dada. Hinek arxavk çêkir. Min da zarokan. Qet zarok dixwin?! Ji tırsan wisa dilerizîn. Ji ber wê tırsê tu tişt nexwarin.

Em careke din rabûn, ez bi pêsiya zarokan ketim. Wexta ez hatime wê derê, min dêhna xwe dayê çiqas hêşirên aliyê Hese Evdalê hene temam top kirine li Kanya Mexso sekinîne.

Diya Hecî Mecît, Pîrika Zeynê, pîrika min Eyso, pêş diya min ve diçin. Diya min got, gotine me:

“Tu bidî xatirê Xwedê, tu nekevî nava me. Dewrêş Beg binihêre ku birîndarî hatî, ketî nava me, wê serê me hemûyan lê bixe. Wê me tevan bikuje.”

Diya min gotiye:

“De werin zaroyêñ xwe hildin, ezê lê bidim herim.”

Min zarê wan teslîmî wan kirin, ez bi jor de berjêr bûm, hatim. Ez hatim min dît ku ew pompeya mala Seyit tune, ez hatime wê derê. Min dêhna xwe dayê merivekî wiha kal di

devê rê de rûniştiye, şemsek li ser serê wî ye, şes heft pale jî li wir in, ketê didirûn. Qareqara te ye. Tu digirî. Min dit wî merivî gazî min kir, got:

“Xwişka min ew zarok çîma wisa dignî?”

Min got:

– Bavo wele ci ji te veşêrim, ci ji xwedê nayê veşartin. Zaroka min birîndar e. Em hêşirê Gelyî Zîlan in. Hal û mesele wiha çêbûye. Wan em wiha kuştine. Serê me wiha lê dane. Ez û zaroka xwe wiha xelas bûne. Niha ji ber birîna xwe, zarezara wî ye.

Wî merivî gazî min kir. Ez çûm li kêleka wî rûniştim. Gote min:

– Xwişka min, ezê pirsa du merivan ji te bikim. Ka tu nas dikî, nas nakî.

Min got:

– Tu bipirse. Ku gundiyêñ me bin, ezê nas bikim.

Got:

– Xelqê Mirşûtê Ahmedê Elî, Reşîtê

Got ku min wisa got, min dît ku
kalê giriya. Destmala xwe derxist
hêşirên xwe paqij kirin, Gazî wan
pala kir, anî hat. Pale hatin, wî
desmala xwe raxist, gote paleyan
Li cem we çiqas pere hene biavêjine
ser vê desmalê.

Her yekî du mecidî, sê mecidî
avêtine ser desmalê. Paşê desmala
min pêça, da min.

Got:

Xwişka min, de lêde here.
Waxta ku ez ji wir hinekî dûr ketim,
carake din gazî min kir, “Xûşka min
were vira!”, got.

Min got, wele êdî ewê min bide
destê hukumatê. Îcar loma gazî min
dike.

Rostem heye. Tu wan nas dikî?

Min jê re got:

– Bira wele Reşît kurê apê min e; Ahmed jî birê min e. Ez nizanim hatine kuştin, nehatine kuştin. Haya min ji wan tune.

Got, ku min wisa got, min dît ku kalê giriya. Destmala xwe derxist hêşirên xwe paqîj kirin, gazi wan paleyan kir. Pale hatin, wî desmala xwe raxist, gote paleyan

– Li cem we çiqas pere hene biavêjine ser vê desmalê.

Her yekî du mecidî, sê mecidî avêtine ser desmalê. Paşê desmala min pêça, da min.

Got:

– Xwişka min, de lêde here.

Waxta ku ez ji wir hinekî dûr ketim, carake din gazi min kir, "Xûşka min were vira!" got.

Min got, wele êdî ewê min bide destê hukumatê. Îcar loma gazi min dike. Ez tırsiyam. Min got:

– Birawo tu çi dibêjî?

– Xwişka min tu nenas î. Tê herî çarşıya Erdişê, tu ne riya doktorekî zanî, ne merivekî te yê pak heye. Ez tiştekî bibêjime xwişka xwe, tê bi gotina min bikî?..

– Birawo, ku gotineke di rê de be ezê biki. Çima nekim?

Got:

– Were mala birayê xwe. Jineke doktor heye. Navê wê Meyrem e. Jê re dibêjin Meyrema bavfile. Cîranê me ye. Ezê te hildim bibim cem wê, heqê wê bidimê, bila li vê zarakê binihêre.

Min got, bi Xwedê ev rind dibêje. Min gotê baş e.

Wî ez hildam birim. Ez heft rojan mame li mala wan. Jinik diçe gihayê çolê berhev dike tîne. Ji wî gihayê re digotin gihadewk. Jinik wê gihadewkê tîne, tê ber tavê hişk dike. Hûr dike, di laçikê re derbas dike, diavêje birîna te.

Di nava heftekê de, birîna te qenc bû. Wextê ku birîna te qenc bû, Min got:

– Birawo gere êdî tu destûra min bidî ez herim.

Got:

– Xwişka min ezê herime çarşiyê werim. Merivekî bi te re bişînim, tuyê ku de herî bila te deyne wê derê, bizvire.

Çû çarşiyê. Nîvro bû hat. Min dêhna xwe dayê, boxçeyekî tijî kiriye. Mesrefa min êdî heta sola min, gora min, ci hebû kiriye ji min re anije. Destek kinc jî, ji te re anije.

Got:

– Xwişka min, de îcar êdî lê bide here.

Anî merivek da pêşîya min, got:

– Tuyê bi vî re herî mala Silê Lorik. Kurê wî li wê derê ye.

Diya min got, wexta ku ez hatime mala Silê Lorik, ew meriv zivirî. Min dêhna xwe dayê Beşîr nehat, belayeke xwedê hat!. Ji min re da xeberan.

Got:

– Tu çîma hatî vira? Tuyê me bidî kuştin.

Wan berdane min, ez ji wê derê derxistim. Wexta ku wan ez ji wê derê derxistim, min lê da, hatime Pêrtaxê. Min zanibû ku bavê te hatiyê Pêrtaxê.

Îcar ez meseleya bavê xwe ji te re bibêjim. Ew çawa xelas bûye. De wexta ku mîr birine ku bikujin, ew jî tevê wan bûye. Xwe veşartiye, ji mîran qetiyaye. Du cendirme pê hisiyane. Girtine, anîne ber zinarekî, li mintiqe-ya Qoçkopriyê ku li wê derê bikujin.

Wî digot; her duyan tivingen xwe rastî min kirin. Wexta jenîn, tivingan hilnedâ. Tivingen wan fişeng hilnedan.

Hema hêrsa wan hat, berê tivinga dane zinêr, bû reqereqa tivingan, ew pênc hev fişengen wan hemû çûn. Paşê hatin ber min sekinîn, pehînek li min dan, ji min re dane xebera, berdane min. Ji min re gotin:

– Ecelê te nehatiye! Yan me tu wisa sax bernedida. Zû lê bide here hê ku me fikra xwe neguhertiye.

Min lê da, hatim.

Diya min got. Min wisa zanibû ku bavê te li Pêrtaxê ye. Ez hatime Pertaxê, ev Gozêya jinapa te û Karê, her du hatine pêşîya min gotin:

– Wele tu di gund de nemayî! Em nahêlin ku tu li cem me bimînî.

Min got:

— Pî! Heyran ezê ûcar bi ku de herim?
Bihêlin ez li gund bimînim.

Ev Resûl tune? Dostê mala Mistê Eco ye.
Ew di gund de bû.

Got:

— Welehî ez nahêlim ku jina Mele Enis bi
cihekî de here. Heyran we xêr e? Ka wê bi
ku de here? Wê here asîmanan?

Wî ez hildam birime mala xwe. Çend roj bi
şûn de çû pêşıya bavê te ew dît, hilda anî.
Min û bavê te piştî birîna Gelî, me li wê derê
hev dît.

Piştî Gelî, ûcar em rastî wan mîrên ku li
Pêrtaxê hatine kuştin, hatin. Dîtina min bavê
te hê hefteyek nekete navê ev qewmîna
Pêrtaxê dest pê kir.

Silê Lorik, Axayê Pêrtaxê bû. Çû giliyê
mîrên wan kir. Got:

— We serokê Gelîyê Zîlan hîstine yên din
birine. Esas yên ku kirine ev in!

Ew jî, ji bo ku Evdiyê Muxtar hatiye gund
bigire. Bi wê tîrsê çûbû wisa gotibû.

Piştî wî esker têr mîrên Pêrtaxê dicivînin,
hildidin dibine Erdîşê. Destê sibê bû. Wexta
ku zivirîn, êdî emrê kuştina wan dabûn.
Sawcî gotibû:

— Herin wan bikujin!.

Qet dernexistibûne mehkemê jî. Hildan a-
nîn, li hemberê gund kaniyek heye. Wan
destnimêj girtin. Lî nehîstin ku nimêj bikin.
Wê êdî nimêja nîvroyê bikirana. Nehîstin.
Hildan birine piştî topê mîra, (ev nav ji vê
meselê tê) ew jî li wê derê kuştin.

Navê ku têne bîra min, yek Deyştiyê
birayê min bû. Deyşti, wê demê bi dergistî
bû. Ev Helima dergistiya wî bû. Ji ber ku ez
di wî çaxî de di pêçekê de bûme, nayê bîra
min. Ev tiştan diya min ji min re gotine.

EWÊN dinê yên ku têne bîra min, yek
Ahmedê Horê bûye, yek Ahmedê Silo bûye.
Ahmedê Temo bûye. Kalikê mala Emer. Yek
jî Evdiyê bavê Hecî Silhedîn bûye. Yek
Keremê Qulo bûye. Yek Selmanê Elo bûye.
Yek Musayê Zeyno bûye.

Axîri donzdeh hebê Dirbasî bûne, du heb

sê heb jî yên xerîb bûne. Van li wê derê diku-
jin.

Piştî kuştina wan êdî bi ser me de nehatin.
Êdî saff kirin loma. Em li wê derê, ji kuştinê
wisa xelas bûn.

Diya min digot:

— Piştî meseleya Gelîyê Zîlan sê meh
derbas bûn. Em çûne wê derê. Me got, emê
herin cinazeyê xwe hildin. Cinaze li
Çaxirbegê bûn. Em wexta ku çûn, me dêhna
xwe dayê ku cinaze hemû li erdê mane. Bêhn
ketiye wan. Wisa bûye meriv nikare bi ser
wan de here. Derman lê kiribûn, agir
berdabûnê. Wexta ku em çûn, heçiyê kinc
mincê wan li ser wan mabûn, me ew nas
kirin. Hildan birin defin kirin.

Em çûn dehlek derkete pêşıya me. Me
dêhna xwe dayê zarokek çawa çav bi me ket
revî, çû kete wê nav dehlê. Em pey ketin, di
nav dehlê de me ew dît. Me dêhna xwe dayê
cinazeyek li erdê ye, em çûn me gote bavê te.
Me got, dêhna xwe bidê ka ev cinazeyê hanê
yê kî ye. Bavê te go ev cinaze yê yekî
Sarkoyî ye. Jina filan şêxî ye. Tenışta jinikê
ya aliyê erdê, kinc mincê wê hinekî rizî bû.
Ew zarok diçû dikete çîçkîn wê digit, careke
din diçû dikete nava dehlê.

Îcar diya min û bavê min wê jinikê
hildidin, tînin erdê dikolin, eynî di wir de
binax dikan.

Mesela Gelî bi vî awayî dizanim: Pêşî
kurê Huseyn Paşa dest pê dike. Wexta ku ew
têne mala Şukrî Axa. Dibêjin ku em bêjin,
emê iro li qereqolê bixin. Ew û Surû Axa,
Husê Sofî Silo têne pey Reşîtê xalê minê Ah-
met. Wexta ku ew têne malê, dibine çardeh
mîr. Têne ser qereqolê bi başçawîş, bi heş
eskerî ve dikujin.

Ew qaçax bûn, wan digot, kurê huseyin
Paşa hatiye kuştin. Ji ber vê yekê bûne qaçax.

Li gor ku ez dizanim, ev mesele, di sala
1930'î de qewimiye. Xwedê nîşanî kesî neke.
Zor e.

ZIMAN Ú SIYASET

ZEYNEL ABİDİN ZINAR

Ziman û siyaset du tiştên ji êk cuda ne ku her yekê wan li ser bingehike taybetî hâtiye daniştin. Diyar e ku ziman li ser bingeha nijadî digel folklor û toreya bapîran cihê xwe girtiye. Siyaset jî li ser îdeolojiyeke taybetî rûniştiye. Ziman ji bo her neteweyekî giyan e, rewan e û rih e.

Eger em netewe bi gewdeyê mirovekî bişüffinîn ziman jê re giyan e, folklor û tore jî, jê re xwîn û goşt in. Gava ku ziman jê re giyan e, folklor û tore jî jê re xwîn û goşt in. Gava ku ziman ji wî neteweyî cuda bibe, her wekî ku rih ji gewdeyê xwe cuda dibe, wisa ew gewde êdî mirî tê hesibandin.

Lê rewşa siyasetê ne wisa ye. Siyaset li ser îdolojoya xwe li jiyanê didomîne û li gor dem û rewşê jî xwe diguhirîne. Bê gu-man e, ku siyaset ji bo xweşî û şadiya jiyana mirovan tête damezirandin. Nexwe ji bo xweş-tirîn jiyan û şadimaniya wan, si-yaset bi hêsanî dikare rengê xwe biguhêre, awayekî nû bide bingeha xwe û kirasê xwe bi meqesa lewlebaziyê li gor bejn û bala xwe bibire, bi makîneya nexşemendiyê bidirû li xwe bîke.

Nimûneyên vê yekê pir in û li diyarî çavêن me gişan in ku xasma jî di dawiya vê Sedsala Bîstemîn de, me tevan dît ku çewanê siyaset, îdelolojî û baweriyê cihê xwe guhartin û

kirasine pirtexlît li xwe kirin.

Cudatiyeke din jî ya balkêş ku di navbera ziman û siyasetê de heye, ev e: Ziman li ol û çîn û îdeolojiyê cihê nanihêre. Mesela kurdekî Misilman jî bi kurdî dipeyive, kurdekî Fileh jî bi kurdî dipeyive, yekî Zerdeşti jî bi kurdî dipeyive, yekî dewlemend jî bi kurdî dipeyive, yekî jar û belengaz jî bi kurdî dipeyive... Lê siyaset ne wisa ye, ew li ol û çîn û û îdeolojiyê cihê dinihêre, firq û cudatiyeke mezin dike û li gor destûr û rojeva xwe didomîne.

Ev yeka han jî rastiyek e ku neteweyek bê zimanê xwe nikare bi navê xwe bijî, lê bê siyaseta xwe ew netewe dikare bijî. Ci neteweyê gava ku zimanê xwe winda bike, ew hebûna xwe ya nijadî jî pê re winda dike. Lê gava ew netewe siyaseta xwe winda bike, ew pê re hebûna xwe ya nijadî winda nake.

Wek nimûne: İro di nava sînorêن Komera Tirkîyê de ji bîstî zêdetir xelkên cuda hene ku ji Kurdan pê ve, wekî din tevan zimanê xwe winda kirine û pê re hebûna xwe ya nijadî jî winda kirine. Kurd jî weke wan çendî ku ne xwedîyê siyaseta xwe ya nijadî bûne jî, lê xwedîtî li zimanê xwe kirine û kultura xwe parastine.

Mixabin di van salêن dawîn de, ew dek û dolabêن Komara Tirkîyê yên ji bo asîmîlekirina Kurdan jî, pir xedar û mexon

in û gihane radeyeke wisa ku êdî pêdivî ye her kurdek lê bisêwire. Lewra iro li bakûrê Kurdistanê ji hezarî bêtir kanalên televizyonan, ji sêsedî bêtir kanalên radyoyan, ji sedî bêhtir kovar û rojnemeyen bi tirkî li qada welêt cirît didin ku Kurdan zû asîmîle bikin û ew bi hev û du re ketine şîqalê: A-lîkariya diravî ji hikûmeta Enqerê werdigirin û qelema xwe bi navê “perwerde”kirinê tûj kirine. Ji wan ew qas bûjenê asîmîlasyonê zêdetir, ji xwe em gava li dibistan û xwen-degehê bi tirkî dinêrin, her wekî ku li zimanê kurdî bûye “Roja Reş.”

Tîştekî din jî heye ku bala mirov pir dikişîne û mirov çu wateyeke din jî jê dernaxîne ev e ku iro bakûrê Kurdistanê heçîka kesên welatparêz in, rewşenbir û zana ne, tevek bi zimanê tirkî dipeyivin. Lê heçîka Parêzgerêن Gundan in, ne kesên siyasi û rewşenbir in, tevek bi kurdî dipeyivin. Gelo sedemê vê yekê ci ye û çîma wiло çêbûye? Bersiva vê pîrsê hêsan e, lê pêdiviya gotinê li vir nelê ye.

Îcar madem ku rewş ev e û her bîrewerek jî van tiştan çêtir dizane, nexwe pêdivî ye ku rewşenbir û siyasetmedarêne me tevek li deme pêş a neteweşî xwe bifikirin û xemxwariyê bikin. Eger ji bo vê yekê tevdîr neyêtine girtin, dema ku em bi nasnavekî din û bi zanavekî cihê têkevin Sedsala Bîst û Yekê, bila kes şâş mebe.

DI PÊVAJOYA PÊŞVEÇÛNÊ DE ÇANDA KURDÎ Û REWŞA WÊ YA ÎROYÎN

MEMET BAYRAK

(Ji tirkî Mêmed Serhedi)

Çanda ku Xwedî Raburdûyeke Hezar Salî ye

Rabirdîya çanda kurdî xwediye mîraseke hezer salî ye. Bi nimûneyên devkî û nivîskî ve, bi awayekî kitekit nirxandina vê çandê babeta lêgerîneke din e. Lê em dixwazin li ser berhemên nivîskî yên wêjeyî hin agahiyên kurt bidin.

Rehêن wêjeya kurdî ya nivîskî xwe digihînin sedsala heftemîn. Di lêkolînên ku li Hezer-merdê hatine kirin de, helbesteke kurdî ku li ser çerm hatiye nivîsin, hatiye dîtin. Di helbesta navborî de, qala bûyerên hovanê yên ku di dema dagirkirina Kurdistanê de ereban kirine dike. Helbest wiha ye:

Perestgeh hilwesandin, ocax temirandin.
Mezinê mezinan hate înkarkirin
Erebêن hov hetanî şarezûrê
Hemî gund wêran kirin
Jin û keç dîl girtin.
Kêsên gernas di xwîna xwe de
Hatin xeniqandin.
Baweriya Zerduşt bêpiştgirî ma.

Di roja îroyîn de wekî ku tê zanîn helbestvanê pêşin ê kurd Baba Tahir e. Ev helbestvanê ku hemdemê Îbnî Sîna ye, di navbera 935-1010 an de jiyaye. Baba Tahir li gor qona-xa ku tê de jiyaye, bi têgihiştineke geleki pêşverû û nûjen, li sîstemê rexneyan digire û aligiriya bindestan dike. Her wiha ew ne bi tenê helbestvanê kurd ê herî kevn e, di heman demê de destpêka kevneşopa helbesta kurdî ya pêşverû û gelparêz e.

Di helbesteke xwe de wisa dibêje:

Ku destê min bigihê

Çerxa felekê,

Ez dê bêjimê:

Pir şerm e ev karê te

Tu sed texlît nîmet

Didî hinan...

Hin nanê ceh

Bi dest naxînin,

Ji bo xwarinê

Baba Tahir xêynî zaraveyê Lûr, zaraveyên Soranî, Bohtî (Kurmancî) zimanên erebî û farisî jî dizanibû. Hin helbesten xwe bi zimanê farisî jî nivîsîne.

Çawa ku di dema Osmaniyan de Nefî û Nabiyêن ku bi eslê xwe kurd in berhemên xwe bi Osmanî nivîsîbin (Tê gotin ku ji xêynî dîwana farisî, Nebî bi kurdî jî helbest nivîsîne.) Helbestvanê kurd ji ber ku xwedî feraseta çanda

serdest in, berhemên xwe piranî bi erebî farisi û osmanî nivîsîne. Mesela Eli Emîrî di antolojiya xwe ya bi navê Tezkîreî şûarayî Amîd (Antolojiya Helbestvanê Amedê) de, cih dide sedan berhemên bi vî rengî.

Esad Paşayê ku, di Antolojiya navborî de cih digire û di 1264 (Z. 1848) an de, walîtiya Eyaleta Kurdistanê dike, weha dibêje:

“Tu fêm nakî ey bilbil zimanê min î kurdî.

Ez dagirkirina wan û Amedê ji te re dibejîm”.

Ew berhemên xwe bi zimanê Osmanî dide.

Yek ji helbestvanê sedsala 16. Şukriyê ku bi şes zimanan dizanî, bi kurdî, tirkî, farsî, erebî, ermeniyî û hindî helbest nivîsîne û ji ber bandora modaya demê ji Bedlîsê diçe Stenbolê helwesta xwe bi vî rengî diyar dike:

Ez bi tirkan re tirk, bi kurdan re kurd im.

Li mal berx, li derve gur im.

Divê neyê ji bîr kirin ku Diyarbekir di qonaixa Osmaniyan de piştî Bûrsa û Stenbolê bajarê herî girîng ê şaristaniyê ye.

Wekî ku min got kesên ku bi çanda serdest berhem afirandine aliye kî, helbestvanê ku tevayî dîwan û berhemên Mensûr bi kurdî nivîsîne li jêr hatine rîzkirin:

Eli Herîrî, Eli Termûxî	Sedsala XXI
Mele Ehmedê Batê	14171491
Melayê Cizirî	14071481
Feqiyê Teyran	Sedsala XV
Selîm Silêman	Sedsala XVII
Ehmedê Xanî	Sedsala XVII
Xaris Bedlîsî	Sedsala XVIII
Pertev Begê Hekarî	Sedsala XVII
Şêx Xalid	Sedsala XIX
Siyahpûş	Sedsala XIX
Cîgerxwîn	19031984
Osman Sebrî	?
Qedîrcan	1917?
Kurdî	18091849
Nalî	17911855
Hecî Qadirê Qoyî	1815?
Şêx Riza Telebanî	1842-1910
Edeb Evdila	1832-1912
Mela Mihemed Qoyî	1876-1945
Wefayî	1838-1902

Xerîq	1891-1987 (?)
Bêhûd	1875-1948
Sebrî	1875-1944
Selam	1892-1959
Selîm	1805-1889
Qane Muzher	1894-1906
Ehmed Muxtar Beg	1896-1935
Pîremêrd	1868-1950
Evdila Goran	1904-1962
Dildar	1918-1948
Bêkes	1905-1949
Remzi Mela Marîf	1902?
Hejar	1902-1991
Emînê Evdal	1906
Eskerê Boyik	1941....
Di civaka Osmanî de sazbûna Çandî.	

Her wekî ku tê zanîn civaka Osmanî civake-ke pir çînî, pir neteweyî û pir olî ye. Em li vir li ser taybetiyêن civaka Osmanî bi awayekî kitikit ranawestin. Ez dixwazim ku bi tenê ji layê sazbûna civakî û çînî ve nêzîkî gelşê bi-bim.

Wekî ku tê zanîn şoreşa Burjûva ya frensî li gel civakê din, civaka Osmanî jî di bin bandora xwe de hiştiye. Gelên di nav Osmaniyan de, di sedsala 19. de, di bin bandora pêlên neteweperestî de mane û ji Osmaniyan vejetiyan. Gelên ku ji layê erdnîgarî û olî ve nêzîkî Ewrûpayê ne, di zûtirîn katê de, ji vê lehiyê para xwe standine û bi dayîna têkoşîna serxwebûnê re ji Osmaniyan vejetiyane. Pêlên bandora navborî wekî tirkan, ermen, kurd, ereb û hwd jî rapêçane û li ser vê şopê heman gel, di plansaziyêن xwe yên ramانî û livbazî de ketine hewldanê cur be cur. Di serî de, di nav gelên ku bi eslê xwe misilman in de “Îslamparêzî” û di nav gelên ku bi eslê xwe misilman an jî xiristiyan in de jî “Osmanîparezî” ferasteke hevbes bû. Lê di nav pêvajoyê de, bi rûdana zanebûna netewî û daxwaza serxwebûnê re, ev feraset û bîr û bawerî bandora xwe winda dikin û bîr û bawerîya netewî derdikeve pêş. Di nav gelên Rojhilat de, Ermen him ji ber taybetiyêن xwe yên dînî û him jî ji ber pewendiyêن bazirganî bi gelên Ewrûpî re bêhtir, di nav dàn û standinan de bûn.



Heskif

Gelê Ermenî ne tenê di warê pîşeyên
destan, bazirganî û sanayiyê de, di
warê jiyana çandî de jî, pêşengiya
giştî kirine. Çawa ku Şînasî û Namik
Kemal rojeva neteweperestî naskirin
û wekî neteweperestiya tirk ev
feraseta netewî di nav civaka
Osmanî de belavkirin, ronakbîrên
gelên din jî zanîna neteweyî li gelên
xwe barkirin. Dîsa çawa ku tevgera
tirkparêziyê li şûna tevgera jontirk û
"Islam parêziyê" cih girt, gelên wekî
kurd û ereb jî ji vê ferasetê dûrkentin
û nasnameya xwe ya netewî
derxistin pêş.

Lewre jî di civaka Osmanî ya sedsala 19. de, bi Rûm û Cihûyan re pêşengiya gelek nûbûnan kirin. Ne tenê di warê pîşeyên destan, bazirganî û sana-yiyê de, di warê jiyana çandî de jî, pêşengiya giştî kirine. Çawa ku Şînasî û Namik Kemal rojeva neteweperestî naskirin û wekî neteweperestiya tirk ev feraseta netewî di nav civaka Osmanî de belavkirin, ronakbîrên gelên din jî zanîna neteweyî li gelên xwe barkirin. Dîsa çawa ku tevgera tirkparêziyê li şûna tevgera jontirk û "Islam parêziyê" cih girt, gelên wekî kurd û ereb jî ji vê ferasetê dûrkentin û nasnameya xwe ya netewî derxistin pêş. Bi van hest û ramanan sedsala 20. de dest pê dikir. Tevgera Meşrûtiyetê ya diwemîn a ku di 1908'an de hate pê, di vê babetê de, bû wekî pêngavekê. Bi-rexistinbûnênetewî û weşan di vê heyamê de gelekî bi rêk û pêk û belav bûn. Em bibêjin tenê di vê qonaxê de deh rêxistinê kurdan hatin damezirandin (Partî, Komel hwd.) û nêzîki bîst weşanê periyodik (kurdi, tirkî û bi zimanê rojava) hatin weşandin, em bawer in em dê hin fîkî û ramanan bidin we. Ev tenê ne ji bo kurdan, ji bo celeb bi celeb gelan wisa ne. Dîsa di qonaxa Osmaniyyê ku em bi despotizmê tawanbar dîkin de, gelek pirtûkêni bi kurdi hatine çapkîrin. Di nav van de, pirtûkêni ku piştî 60-70 salî bûne mijara domê jî hene. (T.Z. Tûnaya ji van rêxistin û weşenan tenê navê çand heban wekî mînak destnîsan dike)

Tevgera tirkparêz û islamparêz bi hevkariya mîlîtarîzma elmanan re kete nav şerê cihanê yê yekemîn. Lê di encama vî şerê ku elman û tirk têk çûn de, di jihevbûna neteweyî de, qonaxeke nû hate pê. Tevgera Îtîhat û terakî ya ku li ser bingeha tirkparêziyê hatibû sazkîrin, di vî şerê ku ji bo karê xwe ketibûyê de, têk çû. Lê gelê ermen ê ku pêrgî "koçberî û qirkirinê"

bû û gelên tirk û kurd ên ku bi rengekî girseyî ketin nav êş û keseran berdêla vî şerî dan... Dewletên împeryalîst gelê kurd bi tevî welatê wî firotibûn dewletêni di bin destêne xwe de. Van salêni bi xezeb û bi agir reaksiyon nakokî û dijberiyêni li dijî vê tevgera dagirker û tirk-parêz a neteweperest bêhtir gur kirin. Gelên kurd û ermen ên ku bi hezeran salî li ba hev ji-yane, çi ji ber dek û dolabê Evdilhemîd û çi jî di dema şer de û piştî şer ji ber antîpropagandeyêni birevêberen wê demê, ji hev dûr ketin. Nemaze têkoşîna neteweyî ya ku xwedî feraseteke dijîemperyalîst bû li dor yekîtiya İslamî û berjewendîyan, piştgiriya kurd û tirkan a-nîbû rojewê.

Van gotinêni Înönü bingeha ramanêni piştgiriya navberî didane der: Bi peymana Sewrê re kurdan jî wekî tirkan welatê xwe di bin metirsiyê de dîtin. Lewre li gor peymana Sewrê li Rojhilatê Enadolê li teniştâ tixûbê Ermenîstanê, dewleteke kurdan dê bihata avakirin. Kurdan dizanibû ku welatê tirkan jî dê li gel wan nemaze, li Rojhilat pêrgî metirsîya erme-

niyan bibe. Lewre jî bi can û bi xwîn beşdarî têkoşîna neteweyî bûn. Pişt re dema ku hevdîtinêni Lozanê pêk dihatin, dîsa kurdan wekî welatparêzan li cem tirkan cihê xwe digirt. Kurdan wekî ermeniyan nehatin li Lozanê se-rî li me nedan. Heta di axaftinêni xwe yêni Lozanê de me dozêni xwe yêni neteweyî wekî neteweyê "kurd û tirk" parast û da pejirandin (4)

Piştî ku ev şerê li dijî împeryalizmê yê çeteyî dest pê dike M. Kemal û hevalêni wî, di ser Samsunê re, derbasî Enedolê dibin û vê têkoşîna ku dest pê dike organîze dikin. Hîn dema M. Kemal derbasî Enedolê dibe li herêma Hewzayê gotineke wî heye ku pirsên hevalêni M. Kemal û bersivêni wî wekî kakilê politîkayêni pişt re ne. Hevalêni wî vê pirsê arasteyî M. Kemal dikin. Pirs wiha ye: Dema ku hûn dibêjin "Neteweyê İslam û tirk" qesta we ci ye? (Bi rastî ew jî dizanin ku kesen bi eslê xwe tirk in kî ne, ji vir bi rê derdikevin û dipirsin) M. Kemal pirsên hevalêni xwe bi vî rengî di-bersivîne: "Neteweyê ku em qesta wî dikin, em dê biafirîn..." Bêlê ev gotin kakilê kone-vaniyêni ku dê werin meşandin in. Lewre em dizanin ku di serî de, di "Gotara" M. Kemal û pirtûka Kazim Karabekîr a bi navê "şerê me yê serxwebûnê" de û di hemî berhemîn he-valêni M. Kemal ên şer de, diyar dibe ku têkoşîna neteweyî bi tevayî li ser bingeha "İslamî" hatiye sazkirin. Lî diyar e ku ev aliye bûyerê yê "Zahirî ye". Aliye "batînî" jî nêzîktêdayîna li jor e. Ev bi rûdanêni pişt re zelal e...

Piştî ku ev şerê li dijî împeryalizmê yê çeteyî dest pê dike M. Kemal û hevalêni wî, di ser Samsunê re, derbasî Enedolê dibin û vê têkoşîna ku dest pê dike organîze dikin. Hîn

dema M. Kemal derbasî Enedolê dibe li herêma Hewzayê gotineke wî heye ku pirsên hevalêni M. Kemal û bersivêni wî wekî kakilê politîkayêni pişt re ne. Hevalêni wî vê pirsê arasteyî M. Kemal dikin. Pirs wiha ye: Dema ku hûn dibêjin "Neteweyê İslam û tirk" qesta we ci ye? (Bi rastî ew jî dizanin ku kesen bi eslê xwe tirk in kî ne, ji vir bi rê derdikevin û dipirsin) M. Kemal pirsên hevalêni xwe bi vî rengî di-bersivîne: "Neteweyê ku em qesta wî dikin, em dê biafirîn..." Bêlê ev gotin kakilê kone-vaniyêni ku dê werin meşandin in. Lewre em dizanin ku di serî de, di "Gotara" M. Kemal û pirtûka Kazim Karabekîr a bi navê "şerê me yê serxwebûnê" de û di hemî berhemîn he-valêni M. Kemal ên şer de, diyar dibe ku têkoşîna neteweyî bi tevayî li ser bingeha "İslamî" hatiye sazkirin. Lî diyar e ku ev aliye bûyerê yê "Zahirî ye". Aliye "batînî" jî nêzîktêdayîna li jor e. Ev bi rûdanêni pişt re zelal e...

Em hevdîtinêni Lozanê û salêni têkoşîna neteweyî ku him bendewariyêni hevbes û him jî bendewariyêni cuda jê hebûn li paş dihêlin. Bendewariyekê bi hêvî, di her wateyê de sloganê wekhevîxwaz, lê jî rojevê dûrketina van hêviyan... Û tevgera 1925'an a ku li dijî vê helwestê wekî reaksiyon hatiye birêexistinkirin. Piştî têkçûna vê tevgerê li dor bernameyeke diyarkirî meşandina "Plana Başkirina Rojhîlat", bingeha planê li ser pişavtin û tengavkirina çanda gelê kurd, gelên din û komên etnîkî yêni din hatibû sazkirin.

Her wiha li dû vê planê M. Kemal digot ku: "Em rasterast gelperwer û neteweperestêni

tirk in". Hêmana komara me civata tirk e. Gelê vê civatê çiqasî bi haveynê tirkperestiyê ve mişt û tiji be komar dê ewçendî xurt û bi hêz be." Di navbera gotinên İsmet Paşayê ku bi eslê xwe kurd e û sozên ku li Lozanê dabûn de nakokiyekê mezin xwe dida der: "Peywira me ew e ku em hemû kesên ku li vî welatî dijîn bîkin tirk." (Binêrin. Tekin Alp Türklestirme İst. 1928)

Em dibînin ku ev tetbiq gelekî berevajî "Me tê! tayînkirina çarenûsa neteweyî" ya Lenîn ku wan rojan di rawacê de bû û prensibên serokê DYB yê Wilson e. Ci ye ev konevaniya nû? A-simîlasyonâ ku bi "Zagona Takrîrî Sukûn" re, bi darê zorê bingeha wê hatiye danîn bi navê xwe yê wê demê politikaya nimandinê ango temsilê.

Ev ne wekî ku demekê kesinan digot "pişavtina siruştî" ye, gelek caran bi darê zorê, bi pest û pêkutîyan politikaya pişavtinê ye. Ev koçberiya bi mecbûrî ye (Koçberkirin ango bi çoyê zorê şandina Rojava) Navendê hilberînê yênu ku xwe dispêrine kanênu xwezayê yênu herêmê, bi vekirina saziyên pîşekarî re, bi darê zorê koçberkirina mirovên bêkar. Bi rîbazên cur be cur koçberkirina li Rojava û hwd.

Politikaya Çandê ya Birêveberiya Komarê

Divê em bipejirînin ku bi rastî jî M. Kemal derbare kurdan de, politikayeke balkêş meşanîdiye. Hîn di dema Osmaniyan de, dema li Amadê peywirdar bû yekîneyeke taybet ku bi cil û bergên kurdan xwe pêçabû, pêk anî. Dîsa di dema têkoşîna neteweyî de, ji kurdan re got ku: Ez dê we ji axa û began bifilitînim. Bi vî rengî alîkariya kurdan stend. Dîsa ji kurdan re di her warî de, jiyanekê wekhev wad kir.

Hîn di dema kongreyan de, bi giregirêne kurdan re têkiliyeke germ danî. Bo nimûne: Serokê eşîra Mûtîkî bêyî ku were Enqereyê me-

bûsî kir. Ji Tamîma Emasyayê ya ji bo ku kurd mafênen xwe yêneteweyî û demokratik bistînin, guherîna Teşkilatî Esasiyê diparast. Dîsa li Lozanê İsmet Paşa got ku: Em di her warî de wekheviya kurd û tirkân û "mafê tayînkirina çarenûsa gelan" diparezin. Li Izmitê ji kurdan re Otonomî wad kir û ji bo ku bênen meclîsê bangî kurden ku cil û bergên neteweyî li xwe kiribûn kir û bi riya wan ji Lozanê re telgraf şand.

Zagona "Takrîrî Sukûn" ne tenê mafênen neteweyî yênu kurdan, herweha birexistinbûna sosyalist û mafênen çîna karkeran jî qedexe dikir.

Zihni T. Anadol di nivîsekê de wiha digot: Bi zagona Takrîrî Sukûn, mafênen karkeran ên bingehîn wekî, sendîqa, karberdan hatine qetemsilê.

Yılmaz Güney ci di çîroknivisiya filman de, ci di warê seneryo, derhênenî û lîstikvaniyê de, di sînemaya tirkî de raperîn aniye pê û sînema ji cîhanê re vekiriye; Ruhî Sûyê ku di warê mûzîka tirkî de zor şareza û hunermend e; Orhan Aseneyê di warê şanogerîya civakî ya îroyîn de herî navdar e. Ehmed Arîfê di helbesta hemdam a civakî de, herî bi bandor û bi nav û deng e.

dexekirin û bi rengekî eşkere hatiye diyar kirin ku di Qapitalizma dewletê de, cihê van mafan tune. Heta di salênu 1932 yan de, di kovara "Kadro"ya ku berdevka bîrdoziya birêvberên wê demê bû de, hatibû gotin ku "Li gel azadiya neteweyî azadiya kesanî tiştek nîne." "Ez û tu tune ye, em hene; em girseyeke bê çîn û resen in". Bûrjûwaziya tirk a nû ku bi zagona Takrîrî Sûkûn Partiya komunîst a tirk û cejna 1'ê gulanê ya karkeran qedexe kir, bi girêdayî vê zagonê û "Plana başkirina Rojhîlat" mafênen kurdan ên demokratik încar dikir...

Di nav tixûbêne komara tirk a nû de mafê çand û weşanî yênu kurdan pişî vê dîrokê tê birîn. Li pêsiya kurdan û çanda wan dîwarên astengiyê têne lêkirin. Politikayeke încarê dest pê dike... Ev serdanpê politikayeke har e.

Divê di destpêkê de, ji bo ku civak birêveberiya nû ya bûrjûva bipejirîne çandeke li dijî çanda Osmaniyan wekî ku di afirandina nete-weyî de were afirandin. Înstîtuya Tirkîyatê, konservatûar di 1920 an de hatine sazkirin, Halkevi (malên gel) ên ku di 1932 yan de li dêla "Türk Ocağı" ve hatine sazkirin, saziya zimanê tirkî, saziya Dîroka Tîrkan û saziyêن wekî wan cih bi cih bi tetbiqêن ku riya nîjad-perestiyê vedikin, di hewldanê de bûn ku çandeke altarnatîf ku li dijî çanda Osmaniyan e, biafirînin. Lî belê dema ku ev polîtîkayêن çandê meşandine hin caran raste rast rê li ber çanda kurdan û çanda gelên din girtine. Çawa?

1) Di berhevkirin û lêgerînên her warî de, çandêن gelên din di pişt guh re hatine avêtin.

2) Di berhemên çandî yên devkî yên tirkî de pêşî mijarêن ku şop û xêza çanda kurdî vedi-hewînin bi mecbûrî hatine berhevkirin, lê pişt re ji navê hatine rakirin. Bo nimûne: Strana bi navê "Keça Tirkmen" di berhevokêن pêşîn de, bi navê "Keça Kurd" tê zanîn. (Çawa ku gotîna lêxîn lawêن kurd veguheziye lawêن tirk) Di berhevokêن stranan ên pêşîn ku Qonserevâtûara Stenbolê, di 1926 an de berhevkirine de, di vê mijarê de nimûneyêن balkêş hene. Di kar û barêن civaknasî yên warêن din de, ev rastî pêşî hatine nîşdayîn, lê pişt re hatine înakir kirin. (Di "Qatologa Lîstîkên Welêt" de, di vê mijarê de nimûneyêن balkêş hene.) Di van berhevo-kan de, stranêن Elî Şerê ku bi kurdî û tirkî hel-best nivîsîne û yet ji idologê serhîldana Qoç-giriyê ye jî, hene.

3) Piştî ku çand û mûzîka kurdî hate qedexekirin, kesen ku di warê hunera kurdî de, karê xwe dimeşandin ji bo ku berê xwe arresteyî hunera tirkî bikin, hatin kişişandin. Ji dema Attatûrk heta roja îroyîn kesen di warê mûzîka gel de navdar in, hema bêje hunermendêن kurd in. Wan "mûzîka gelerî ya kurdî ku tenê gotin tirkî ne" içra kirine. Navdarêن qonaxekê: Celal Güzelsesê Diyarbekirî, Mukîm Tahirê Rihayî, Kel Hemzayê Rihayî, Cemîl Cankatê Rihayî û hwd... Di nav kesen ku berhemên çandî yên dejenere bûyî içra dikin de, Fexriyê Meletseyî, Xelîlê Zarayî, Salihê Erzinganî û

Serîf dikarin bêñ hejmartin.

Wekî ku tê zanîn ev rewş iro jî bi awayekî belave didome: Nuri Sesigüzel, İbrahim Tatlıses, Atakan Çelik, İzzet Altınmeşe, Bedri Ay-seli, Selahattin Alpay, Husemettin Subaşı, Mahmut Tuncer, Burhan Çaçan, Hülya Süer... û hwd. heman kevneşopîyê didomînin. Di 15 Avrêla 1989 an de, di kovara "Tempo" hejma-ra 18. de, em rastî hin nimûneyên vê rewşê di-bin. Kovara "Tempo" ev rewş wiha navandiye: "Kakil kurdî, gotin tirkî" an jî Kurdi besk. Bêguman kurdêñ ku di hunera tîrkan de, lehî rakirine tenê kesen di vî warî de nînin. Dîsa rûmeta romana tirkî romannivîsê bi nav û deng Yaşar Kemal, Orhan Kemal hwd. Yılmaz Güney ci di çîroknivisiya filman de, ci di warê seneryo, derhênerî û lîstîkvaniyê de, di sîne-maya tirkî de raperîn anîye pê û sînema ji cî-hanê re vekiriye; Ruhî Suyê ku di warê mûzîka tirkî de zor şareza û hunermend e; Orhan Aseneyê di warê şanogerîya civakî ya îroyîn de herî navdar e. Ehmed Arîfî di helbesta hemdam a civakî de, herî bi bandor û bi nav û deng e; Aşik İhsaniyê ku wekî pêşengê helbes-ta hemdem a civakî tê pejirandin; şefen orkes-tirayê yên navdar Hikmet Şimşek û Gürer Ay-kal ev hemî domderêن vê pêvajoyê ne.

Lê tiştê girîng bêguman esl û binyada van nivîskar û hunermendêñ ku me navêñ wan li vir rêzkirine nîne. Tiştê girîng ji bo me; van kesan bi huneran xwe ve "ci xizmet pêşkêş ki-rine an nekirine" ye. Dîsa arîşeyeke ku di serê me de aloziyan tîne pê ev e:

Li gorî rastiya pedagojîk mirov tenê dikare bi perwerdebûna zimanê xwe yê zîmkârî bi ser bikeve. Ev hunermendêñ di gel ku piştî zi-manê xwe yê zîmkârî tirkî hîn bûne û berhemên ew çend hêja afirandine, ger bi zimanê dayîka xwe perwerde bibûna yê berhemên çi-qas hêja bidana... An jî bi herdu zimanêñ ku dizanin berhem bidana...

4) Piştî ku hilberîna berhemên nivîskî û we-şandina wan hate qedexekirin, adaptasyona berhemên wêjeyî yên nivîskî û li wan xwedî derketin bêtir hêsan bûye. Qedexeya li ser go-vend û dîlokêñ gelêrî aliyekî konevaniya

çandê yên ku tê şopandin bi rengekî pir zelal di-de der. Mantalîteya vê konevaniyê ev e: Divê govendên gelêrî yên kurdî pêşî ji taybetiyêن xwe yên gelêrî bêne dûr xistin û paşê lê were xwedî derketin. Lê belê reqsên ku gel afiran-dine ger bi taybetiyêن xwe yên otantîk ve bêne îcra kirin dikarin bigihêjin mebestêن xwe û be-dewî jê bifûrin. (Di gel vê tê zanîn ku go-vendên gelêrî yên kurdî ku bi navê lîstikêن roj-hilatê Anadolê têne navandin di dema 12'ê Rezberê de, bi egerêن “cûdaxwaziyê” hatine qedexekirin.)

Bêguman beşek ji govendên gelêrî wek ber-hemên çandên cîran ku têkildarî hev û din di-bin û di bin bandora hev û din de dimînin, têne pê. Lê ji bilî van lîstikan, iro jî gelek lîstikêن ku nasnav û têkûziya xwe diparêzin hene. Di berhemâ Prof. Dr. Metin And a bi navê “Lîstik û sêr” ku di encama berhevkinin û lêgerî-nan de hatiye pê de, hûn dikarin derbarê vê de lîsteyeke berfireh bibînin.

5) Şaxek ji çanda kurdî ya ku hatiye qedexe kirin û ji bo pişavtinê li ser hatiye listin (ji ber tunebûna derfeta wêjeya nivîskî) jî wêjeya devkî ya gelêrî ye. Bi taybetî ji stranêن gelêrî ne. Di vê qonaxa ku bi rîbazêن zanyarî ber-hevkinina berhemên zargotina gelên rojhilat dest pê dike de, hewldana afirandina çanda tir-

kî ku li dijî çanda Osmanî ye tê pê, bi vê ar-mancê li ser berhemên çanda kurdî ya nivîskî gemarkirin û li ser berhemên dîtbarî û devkî jî qedexekirin xwe dide der. Bêguman li hemî berhemên ku di encama têkilbûna çandan de, derketine pê, lê xwedî hatiye derketin.

Di van salêن destpêkê de, ji ber hin sedeman di pirtûkêن lîseyê de ji Nazîm Hikmet re cih veqetandine. Lê cih nedane berhemên tirkî yên ku xêz û şopêن kurdan di xwe de dihebî-nin. Di berhevokêن stranan ku Qonserevatû-arênen Stenbol û Enqereyê bi radyoyan re bi rengekî organîze kirine de di vê babetê de nimû-neyên balkêş hene. Mesela wekî me li jor jî di-yar kir, di berhevokêن Qonservetûara Stenbolê de, sê berhemên Elî Şêr ku xwedî helbestêن kurdî û tirkî ye wekî plakêن kevir (Taşplak) hatine amade kirin. Her wekî ku tê zanîn Elî Şêr Îdeologê Tevgera Gel a Qoçgirî (1919-1920) û Tevgera Dêrsimê (1937) ye. Ez bawer im ku di mijara berhevokan de çavdêrî û çes-pandinêن balkêş ên Macar Bela Bartokê ku wekî mûzikoleogekî Rojavayî beşdarî berhev-kinan bûye, hene.)

Herwiha di demên berê de Celal Güzelses Diyarbekirî û gelek hunermendêن ku navê be-şekî ji wan li jor derbas dibe bi amûrêن xwe yên xweser, lê bi tirkî mûzik içar kirine. Ev



mûzîka kurdî ya gelêrî ye ku tenê gotin tirkîne. Lî dûv re komek di bin serkêsiya Muzafer Sarisozen de bi navê sazkirina mûzîka tirkî riyeke din dişopîne. Koma Sarisozen, bi baweriya ûnstrumenta tîrkan a rastî “Qopûz” ê, di mûzîka gelerî de tenê cih daye cureyên wê. (Saza dîwanê, tembûr, cûra). Ma mûzîka gelelî bi rastî jî tenê bi van tê îcراکirin? Bêguman. Îro ji bili cureyên tembûrê cumbuş, keman, kemane, tar, dahûl, zirne, def, zîl, kaşik, klorinet, sîp, mey hwd. besdarî mûzîka gelerî dibin. Ev jî dîpeyitîne ku ev tiştekî bedilhewa nîne.

Mûzîka gelerî ya ku roja îroyin tê îcراکirin ku jêderka wê Rojhilat e: Ji tevlihevî û tengiya “Dengen ji welêt” (Yurttan sesler) ku deh tembûr bi hev re bi kar dianîn filiti lê îcar jî kete nav aloziyeke din... Dema ku gotinê stranê kurdan ên gelerî tênu guherandin û tirkî têne îcراکirin, gelek caran an ji naverokan xwe tênu dûrxistin an bi awayekî çewt têne wergerandin an jî hin baneşan û dîsgotinê ne pêkane bo tirkî werin veguhertin ji mecbûrî wekî xwe dimînin. Hin jî di radyo, tv û cihêne din de

Wekî hemî civatêni mirovan, gelê
kurd jî xwedî mafê parastina mîratêni xwe yên çandî û bi rengekî azad derbirina nasnameya xwe ye. Çanda kurdî ya ku xwedî rabirdûyeke hezeran salî ye beşek ji çanda gerdûni ye. Ev çanda ku berhemâma pêvajoya sedan salan û berhemâma nifşê jin û mîran e jî wekî hemî çandêni din hêjayî rîz û parastinê ye. Lewre jî di bin rîberiya pirensîben ku peymanê navneteweyî yên derbarê mafêni mirovan de, Beyanameya Gerdûni ya Mafêni Mirovan û peymana Neteweyê Yekbûyî danasandine, li dijî her cûreyên dilgirsî, pêşdarazî û cihêkariyê em bi dad û demokrasiyê ve giredayî ne.

pêkan e ku em leqayı gelek mînakêni van bibin. Di rastiya xwe de çewtiya pêşin ne ya kesen bi haydarî an jî nezanî van stranan îcra dikin e. Çewti di politîkaya Tirkîyeyê ya çandê de ye.

Divê dewlet dev ji van politîkayêni ku ne li gorî rastiya Tirkîyeyê ya civakî û zanîstê ye berde û gelşê bi rengekî mirovî û demokratîk çareser bike.

Roja Îroyîn

Me beşek ji nivîseke Ziya Gökalp ku di germinî û coşıya Meşrûtiyeta diwemîn de li ser navê Cemiyeta Îtihad û Terekîya Diyarbekirê di rojnameya “Peyam” de hatiye weşandin girt: Ev dê derbarê tevgera Meşrûtiyetê ku pêla ramanî û azadîxweziyê anîbû pê de hin rawanan bide.”Tenê derdekî kurdan heye, ew jî nezanî ye. Dermanê vê êşê xwendin, nivîsin û têgihîştina cîhanê ye. Ji îro pê ve pirtûk û rojnameyen kurdî dê werin nivîsin, kurdêni di dibistanan de bi zimanê xwe zanist û merîfetê hînbibin. Wê çaxê kurd jî dê zengîn û dilges bibin. Wê şêweyê jiyanêka baş fêrbibin.”

Gelekî berî qonaxa ku ziya Gökalp ev tiş di-gotin li welatê Rojava bi awayekî zanyarî li ser Kurdologiyê xebat dihatin kirin. Ziya Gökalp piştî Meşrûtiyeta diwemîn a 1908 an bi hin rewşenbîren kurdêni wekî Xelîl Xeyalî re li ser Elfabaya kurdî, Rêziman û Ferhengê dikeve nav liv û lebatê. Lî piştî demekê ramana xwe diguherîne û dibe ideologî tevgera tirkperesiyyê. Kurdistana ku pêşî bûbû du beş bi peymana Lozanê re dibe çar perçê. Bi vê re tevî birêvebiriya wê, çanda wê jî dikeve bin destêni mêtîngeran.

Dema ku li beşê İranê li ser çanda kurdî pêkutî didomîyan; li beşen Tirkîye, Iraq û Sûriyê jî çanda kurdî bi politîkayêni tunekirinê re rû bi rû mabû.

Piştî şoreşa Oktoperê, Komcivîna Kurdologiyê ya pêşin ku di 1934 an de li Yêrîwanê hate li dar xistin, di pêşveçün û stewîna çanda kurdî de raperînek bû. Vê Qongreyê dewletên mêtîngeran ên cîran gelekî bêzar kir. Piştî kar û barêni li Ermenîstanê, berhemêni xwe yên pêşin

dîsa bi bandora Sowyetê li Iraqê da. Di enca-ma berxwedana gelê kurd de, birêveberiya Iraqê ji mecbûrî Otonomî da kurdan. Di vê pêvajoyê de, li Kurdistana Iraqê, bi taybetî bi zaraveyê soranî bi zimanê kurdî û çavkaniyên weşanî bi rengekî berfireh hatin pê.

Herwiha em ji rûdanêna axa ku kurd li ser di-jîn a dema nêzîk haydar in...

DAWÎ

Binêrin ku serokên dewletan, zanyar, huner-mend û mirovên çandê yên li hemî cîhanê nav-dar in, ji bo li Tirkiyeyê parastina çanda kurdî di banga navneteweyî de ci dibêjin:

Wekî hemî civatêni mirovan, gelê kurd jî xwedî mafê parastina mîratêni xwe yên çandî û bi rengekî azad derbirina nasnameyêni xwe ye. Çanda kurdî ya ku xwedî rabirdûyeke hezeran salî ye beşek ji çanda gerdûni ye. Ev çanda ku berhemâ pêvajoya sedan salan û berhemâ nifşê jin û mîran e jî wekî hemî çandêni din hêjayî rîz û parastinê ye. Lewre jî di bin rîbe-riya pirensîbêni ku peymanêni navneteweyî yên derbarê mafêni mirovan de, Beyanameya Ger-dûni ya Mafêni Mirovan û peymana Netewe-yêni Yekbûyi danasandine, li dijî her cû-reyêni dilgîrsî, pêşdarazî û cihêkariyê em bi dad û demokrasiyê ve giredayî ne. Em dixwa-zin ku rayedarêni tirk hemî asteng û kelemêni li dijî zimanê kurdî û bi geleperî jî asteng û qedexeyêni li dijî ziman û çanda welatiyêni Tirkiyeyê yên kurd ji navê bêne rakirin.

Bêguman ev bang tenê ji bo kurdêni Tirkiyeyê nîne, ji bo hemî perçeyêni Kurdistânê ye. Divê pêşî nasname û kesaniya gelê kurd azad bibe. Piş re ji bo ku hemî mirovahî ji çanda kurdan sîd wergire divê ev çand bê jiyandin û pêş ve birin. Ev jî girêdayî birêxistinbûnê yên. Em hêvi dîkin ku birêxistinbûn bibe pêngave-ke mezin...

Helbestvanê nemir ê kurd cigerxwîn wiha dibêje:

Sedan sal, hezaran zimanê me ye.
Wekî me di bin destê dijmin de ye
Ci gernas û mîr e di meydanê ceng
Ne şur û mertal, ne top û tiving.

ÇAVKANÎ

1- Prof. Dr. Qanadê Kurdo: Tarîxa Edebyata Kurdi, 1984

2- Ji bo ku em der barê tevgerêni neteweperi yên gelan de bibin agahdar, di serî de jî ji ya neteweperiya tîrk, divê em çav li van berhemâ bigerînin.

a) Tanzimat, 1940 (Tanzimat'ın ilanı 100. yılı dolayısıyla toplu kitap)

b) Namik Kemal hakkında , DTCF Yay. 1942 (100. Doğum Yılı Dolayısıyla)

c) A. Hamdi Tanpınar; 19 Asır Türk Edebiyatı Tarihi, 6 bas. 1985

d) Yusuf Akçura; Osmanlı Devletinin Doğma Devri, 1940

e) Server Tanlı Uygurlik Tarihi 4. Basım 1981

f) Bir çağdaş öncü: Namık Kemal (1984-1988) (F. Almanya'da düzenlenen bir kolyekyumda sunulan bildiriler) İst. 1988

g) Enver Ziya Karal; Osmanlı Tarihi Cilt 5,67,8;

4. Bas. 1983

h) Niyazi Berkes; Türkiyede çağdaşlaşma Ank. 1973

i) Hilmi Ziya Ülkem; Türkiye'de Çağdaş Düşünce Tarihi, İst.1979

j) Stetanos Yerasimos; Azgelişmiş Sürecinde Türkiye Cilt-II, 1975

k) M. Şükrü Hanioğlu; Bir Siyasal Düşünür Olarak Doktor Abdullah cevdet ve Dönemi, İst.1981

l) M. Şükrü Hanioğlu; bir Siyasal Örgüt Olarak İttihad ve Terraki Cemiyeti ve Jön Türkülük (1889-1902), İst. 1985

m) Tarih Toplum Dergisi kolleksiyonu

3- Osmanlı Döneminde yayımlanan ya da el yazması halinde kütüphanelerde kalan Türkçe eserlerin bir dökümü için bkz. Mehmet Malmisanî" Osmanlı Döneminde Yazılan ve Basılan Kürtçe Eserler Üzerine Tarih ve Toplum Dergisi , Sayı 54-55, 1988

4- İsmet İnönü; Hatıralar; 2 Cilt Ank.1987, s.202

5- Zihni T. Anadol "Yaşamak Yasak" Toplumsal Kurtuluş, sayı:3, Eylül-1987

6- Metin And. Oyun ve Büyü, 1974, s 176-180

FEQÎ HUSEYN SAĞNIC

Peywendiyâ Zimên bi çandê re, bi wateya antropolojîkî çand, hemî celebêن jîna mirovahî, digel hemî cur û celeb peywendiyyêن wê hildide hundirê xwe. Bi vê têgihê ziman û çand hevbeş nebin jî, wisa ketine nav hevdu, ku her wekî çare ji hev cudakirinê

nemaye. Ji xwe çawa bê ziman, çand nayê hizirîn, wi-sa bê çand hizirîna zimên jîne di cî de ye. Ma qey tu çanda sewalan (heywanan) heye? An jî çiqas zekî dibe bila bibe, dema zarokek ji dayik bû, bibin bavêjine rîlê nav sewalan û bi wan re mezin bibe, ma dê zimanê tu gelan û tu

çand jî betal û bê kar ranaweste. Kêmasiyêن zimên te-waw, çewtiyan durust û alîkêşan sererast dike. Naxwe yek bê ya din nikare xwe xwedî bike û karek qenc bide civatan. Heger bêhna îrsiyetê ji qabiliyeta hînbûna zimanan bê jî, ev berjewendiya han, ji serî heyâ binî ji peywendiya civakî derdikeve. Ji peywendiyyêن civakî dûr, bêçarebûna hewisîna (hînbûna) zimanan ji alî her kesek ve tê zanîn. Di vê tangê de dixwazim bibêjim ku ji zimanek dewlemend, çandek dewlemend dertê. Di eynî gavê de ji çandek dewlemend jî, zimanek dewlemend diafire. Çawan me li jorîn jî işaret kiribû, ev her du heyînê mirovanî wisa ketine hundirê hevdu ku ji hev cudakirina wan her wekî bê çare ye.

Di pêvajoya hewisînê de, hêza layîn (texlît) kîrinê nayê înkarkirin. Lî bi qasî hînkirina devkî ne hêzdar e. Baş dêna xwe bidin tevgera cinsên sewalan (heywanan); bi guhertina jînî an jî bi kedîbûn û kûvîbûna wan, ew jî piştî pêvajoyêن pir dirêj guhertinê hindik û piçûk dikevinê. Pêşberê vê yekê, di demek kin de, xwiyakirina guhertinê mezin, di çanda mirovan de, leyz û hêza zimên gelek rind dide diyarkirin. Di vê deverê de, peywendiya çand û zimên, bi vê rewşê jî em dikarin vê danekê hildîn destê xwe: ziman, derî li çandê vedike, diafirîne, xwedî dike, dixemilîne û dîsa di rîya xwe re dervazê civatan, neslan û kesan dike. Jixwe

ZIMAN

Ü

ÇAND

netewan hîn bibe? Hemine, bersiva van her du pirsan jî “Na” ye. ew jî nayek zehf mezin.

Çand, hêjan, pîse, huner pêkanîn, bi kurtasî hemî celebêن zanînê civatan bi rîya zimên dervazê kesan, civatek din û neslan dîbin. Di vê deverê de, bi rewş û awayek din jî em dikarin vê danekê hildîn destê xwe: ziman, derî li çandê vedike, diafirîne, xwedî dike, dixemilîne û dîsa di rîya xwe re dervazê civatan, neslan û kesan dike. Jixwe

Di pêvajoya hewisînê de, hêza layîn (texlît) kîrinê nayê înkarkirin. Lî bi qasî hînkirina devkî ne hêzdar e. Baş dêna xwe bidin tevgera cinsên sewalan (heywanan); bi guhertina jînî an jî bi kedîbûn û kûvîbûna wan, ew jî piştî pêvajoyêن pir dirêj guhertinê hindik û piçûk dikevinê. Pêşberê vê yekê, di demek kin de, xwiyakirina guhertinê mezin, di çanda mirovan de, leyz û hêza zimên gelek rind dide diyarkirin. Di vê deverê de, peywendiya çand û zimên, bi vê rewşê jî em dikarin vê danekê hildîn destê xwe: ziman, derî li çandê vedike, diafirîne, xwedî dike, dixemilîne û dîsa di rîya xwe re dervazê civatan, neslan û kesan dike. Jixwe

çand jî, di riya zimên re digihîje girseyan, civakan...

Em aliye kî zimên ê din hil din destê xwe: Ewê kesan di gihîne civatan, digihîne girseyan ziman e. Ewê girseyan jî digihîne hevdu dîsa ziman e. Ziman bi vê yekê tenê jî ranaweste, pêşî kesîtiyê dide ferdan û wan bi kesîtiyê tam dixemilîne, paşî digihîne ferdên din û girseyan. Çawan kesîti bi zimên tê holê, wisa hogirî, mirovahî, hevalî, hevalbendî, bi kurtasî hemî karêñ ferdî û civakî jî, bi wî tê holê. Naxwe ne karêñ qenc tenê yên neqenc jî di riya wî re digihîje ferdan û civatan. Ji van şirovan hat zanîn ku ziman çiqas hogirî, hevalbendî, dilxweşî, dostî, qencî têxe navber ferdan û civatan, wan digihîne hevdu. Ewqas jî dijminî, dilreşî, neqencî, sarî dide wan û wan ji hevdu diqe-tîne, heyâ bi awayek dijminî derdixe pêşber hevdu.

Ziman û Peyivîn

Peywendiya zimên bi peyivînê re, di derenceyeke girîng de heye. Peyivîn jî mîna çandê, bi zor di riya zimên re nimandina xwe lidardixe û digihîje ferdan û civatan. Jix-we gava ziman tê gotin, pêşî peyivîn tê hişê mirovan.

Çebûna peyvan

Ew hewaya ku ji kezeba spî derdikeve, bi alî jor ve hildikişê di riya dengan de, rastî ricfa zimanê piçûk tê, dibe deng û belavê valaya hundirê dev dibe. Ew deng, bi alikari-

ya zimên di çarçoveya hun-dirê dev de pêşî dibin kîte û gava bixwaze di qalibek din re dervaz dibin û peyv jê tê holê. Va ye, peyivîna me bi wan kîtan û peyvan in. Ferd û civat bi wan hevdu serwext dikin. Her çiqas bi ricfa celebêñ kutan, lêxistin û pifkiri-na pergalêñ sazbendiyê jî dengê curbecur ji wan dertêñ. Ji wan dengan jî hinek celebêñ serwextkirinê pêk têñ. Her wekî serwextbûna ji hejandina destan, lêvan; qir-miçandina enî, rû; xêzbendêñ qarîqator û celebêñ resman in. Ji van re "ziman" nayêñ gotin.

Celebêñ peyivînê zehf in: peyivîna zarokan, peyivîna peltekan, bi dengê nerm peyivîn, bi dengê bilind peyivîn, bi dengê dûr, angô bi per-

galêñ têl û bê têlan peyivîn. Heger bixwaze, hejmara van têñ zêdekirin. Lê dirêjkirina zêde bi wateya wecê zêde nayê.

Çebûna dengê sewalan

Ya wan jî wekî ya mirovan hewa ji kezeba spî derdikeve. Di lûleya bêhndanê re bi alî jor ve hildikişê. Li nêzîkê dev rastî ricfek tê, dibe deng û hildikişê hundirê dev. Bi tu a-wayî nikare ji tentêla deng dûr bikeve. Lewra çawan ziman û devêñ sewalan ji afi-randina peyvan re ne bes e, wisa mîjiyê wan jî têra van karan nake. Divê neyê jibîrkîrin ku dengê cinsê sewalan hemî, ji hevdu cuda nin. Ew dengê ji sewalan derdikeve, her civatek, gelek û netewe-yek bi ziman û zaraveyêñ xwe navek lê kirine. Bê weke ku em dibêjin mih (mî) dibare, ga dibore, se direyî, dikûze û dihewite, gur dizûre, ker dizi-re, hesp dihîre, hirç dihure, piling diqîje, mirîşk diqudqû-de, mişk diçîze, çûk diwidwi-te û êd. Giraniya van navlêki-rinan ji dengê wan sewalan hatiye hilanîn. Digel vê yekê, ji van re dengê xwezayê nayê gotin. Lewra dengê candaran in û ji zimên jî nayêñ hejmar-tin. Lewra ji çavkaniya zimên dernakevin. Ji van dengan re zimanê sewalan bê gotin, êdi rast e. Ji van dengêñ sewalan guhertîtir dengê balindeya (teyra) "totî" (papaxan) heye. Serê balindeya totî gilover e. Drûva wê nêzîkê drûva serê mirovan e, gewriya wê jî hi-

Em aliye kî zimên ê din
hildin destê xwe: Ewê kesan digihîne civatan, digihîne girseyan ziman e. Ewê girseyan jî digihîne hevdu dîsa ziman e. Ziman bi vê yekê tenê jî ranaweste, pêşî kesîtiyê dide ferdan û wan bi kesîtiyê tam dixemilîne, paşî digihîne ferdên din û girseyan.

nekî fireh e. Ji van sedeman, deng dikare tê de biguhere û bikeve dirûva curbecur. Lê hiş û hidama wê tune ku rehberiya wan dengên guhertî bîke ku gor xwestinek û dema bixwaze wan bixebeitîne. Hewte dît, ji nişkê ve wekî dengên mirovan ji devê wan peyvek an jî hevokek derket. Beşek ji kesen zimanzan û zana "Le-yînê (texlîtê) peyv û peyivînên mirovan dikin", dibêjin. Ew kes jî dipejirînin ku ev deng an jî peyv, bê hemdê wan derdikevin. Balindeya totî ne bi deng, gewrî û serê xwe tenê, di gelek en-

man, sazûmaneke sembolan e. Nivîsîn, hemî sazûmanen sembolan hildide hundirê xwe. Nivîsîn zimên dinimîne, ango li ser lewheyen û kaxezan dide xwiyan. Em bi awayek din bibêjin: Nivîsîn, ziman ji mehkûmûya dêrizîn û windabûnê rizgar dike û digihîjîne derenceyek nemir û ebedî. Ji aliye hinek kesan ve "Nivîsîn, peyivîna ser kaxezê ya ne winda ye" tê gotin. Lê belê, bi vê dîtinê çarçoveya zimên, nivîsîn û peyivînê jî tê ruxandin. Mînak: çawan me li jorîn jî gotibû, bi "ez" dengên pergâlân sazbendiyê, bi işare-

drûvîn hemî celebêriyan, rawestgehan, pompayê petrolê û êd. bi wan xazikan di din diyarkirin. Bê weku Resma kamyonek barkiriye, barbilind û xazek çeprast li ser, wateya wê ew e ku kamyonen barbilind nikarin bikevine vê rîyê. Her wekî li wir binivise ku "Ev riya han ji kamyonen barkiri yên barbilind re qedexe ye". Gava bi resman kamyonen barkiri digel wê xazika çeprast digel hemî celebêri xazikên din jî bide diyarkirin. Her çiqas şofêr, hemî celebêri pêdiviyen xwe, çawan rehber ji wan re bi devkî bibêjin an jî di ciyên wan resm û xazikan de, peyv nivîsandîbin, bê kîmasî jê serwext dîbin. Ji ber ku peywendiya wan bi zimên re tune. Lewra ji çavkaniya zimên derneketine, nikarin xwe ji nivîsandinê jî bidin hejmartin. Nexwe carek din jî li vir, bi hêsanî em dikarin bibêjin, ewen ji zimên cuda bin, ji nivîsandinê jî cuda ne.

Berî dahêndina (îcada) nivîsandinê, hemî raxen zimên nedikarîna demek dirêj li ser piyan û di xizmete mirovan de bimana. Ew rexen her dem di tentêla xebatê de bûn û bi wan dihat peyivîn, hemine tu teşqeleyen dijdar li ser wan nedihatîn. Lê dema kîtek, peyvek, gotinek û hevokek di pêvajoyek de, betal û bê xebat rawestiya, giraniya wan ji ber lehiya teşqelê nedikarîna xwe ragirin, bi peywistî ji zimên diketin. Di wan mercan de ser, mîjî û bîra mi-

Nivîsîn, hemî sazûmanen sembolan hildide hundirê xwe. Nivîsîn zimên dinimîne, ango li ser lewheyen û kaxezan dide xwiyan. Em bi awayek din bibêjin:

Nivîsîn, ziman ji mehkûmûya dêrizîn û windabûnê rizgar dike û digihîjîne derenceyek nemir û ebedî. Ji aliye hinek kesan ve tê gotin.

damen bedena wê de jî manendiya (teşbiha) yên mirovan tê de dixwiyen. Her wekî kurtiya lameya (çena) jêr, stû-rayî û térgoştîya zimên, leyîttina lemek jê (lameya jor), hêzdariya lingan û êd., ji bil van, nêzkiyek jî di temenê wan da heye. Mînak: Balindeya totî jî 70-80 sal dikarin bijîn...

Ziman û nivîsîn

Peywendîya zimên bi nivîsandinê re

Em vê peywendiye dikarin bi vê rewşê şîrove bikîn: Zi-

ta destan, lêvan û bi celebêri resman çareya hinek cureyên serwextbûnê hene. Ji ber ku ev ji çavkaniya zimên derna-kevin, nikarin xwe bi nivîsînê jî bidin pejirandin. Nexwe carinan peywendiye wan ji hevdu cuda dîbin. Em mînak kek din hildin destê xwe: İsa-reten traflîqê yên li ser riyan datînin. Yen jê nizanin re tu wateyek û karek îfade nake, yên jê dizanin re hemî peywistî û pêdiviyen di pêvajoya re de, wekî rehberek, wekî se-dayek zana dide şîrovekirin. Duryanan, Piran, riyen hesin,

rovan têra wan rexên rawesta-yî jî nedikir ku bigihîjînin nîjadek û du nîjadêن din. Ji sedemêن weha, ziman li gor xwestina civatan fireh û geş nedibû. Lewra Nifşen nû nedikarîna ji şehrezaya nifşen berî xwe, bê kemasî havil bibînin. Ji vê yekê ye ku em ji dewra berî nivîsandinê re “dewra tarîtiyê” dibêjîn. Qenc bala xwe bidinê, em bi zor bi pelemist dikarin xwe bigihînin wan dewrêن tarî, ew jî bi zor beşek hindik ji xebat, jîn û bûyerêن wan deman dikarin hildin destê xwe û dîsa bi pelemist dikarin bihêjînin. Anglo piraniya tesbîten me ya wan demêن kevnare, ji çarçovaya texmînê zêde nikare zehf dûr bikeve. Hinek zana van dijwariyan hildidin destê xwe, gelek rind li ser radiwestin û bîryara xwe didin ku bûyerêن manendê van gelek bandor danîne li ser dahêna nivîsandinê. Xwezay em bi hêsanî dikarin bibêjîn ku bandora van bûyeran biqasî ya aboriyê li ser dahêna nivîsandinê heye. Lewra her demek mirovan xwestine jîna kesen berî, heya jîna sewalan jî bizanin. Ev yek jî, bi zor bi belgêن nivîsandî, bê kemasî mirov dikare xwe bigihîjînê. Bi kurtî çareserbûna van dijwariyan bi nivîsandinan e.

Ji dahêن û rûniştandina nivîsandinê û paş, cîhan ketiye dewra ronahiyê. Ew bûyer û ew heyberêن pênc şeş hezar sal berî dema me hatine nivîsandin, iro zanayêن me digihîjînê û raberê me jî dîkin. Em

bi awayek din bibêjîn ku kes ûn iro çiqas biyaniyêن jîna kesen berî dahêna nivîsandinê ne; ewqas ne biyaniyêن kesen dû wê nin. Bi balkêşek dibînin, ew civatêن jîna xwe gihiştandine dema nivîsandinê û ji holê rabûne. Çawan wêris li dû xwe nehiştine wi-sa zimanê xwe jî bi xwe re birine. Anî iro kesen bi zimanê wan bipeyivin tune. Digel vê yekê, em wan dinasîn, Çawanbûna zimêن kîjanbûna malbatê zimanê wan pê dizanîn, ji kevneşopî, ol, rêzik, çand, pîse, zargotin, folklor, cengawerî û şehrezaya wan bigire heya bigihîje jîna wan ya rojane, heger nekarîn bikevine çingilokan jî, ji gelekên berçave agahdar in. Li vir bi

awayek din, hê tekûztir peywendiya zimêن bi nivîsandinê re xwiya û derket holê. Gava em peywendiya zimêن û nivîsandinê gor vê rewşê hildin destê xwe; divê em bibêjîn ku nivîsin, maran (kîler) a zimêن an jî kasa wî ye. Maran û kasek wisa ye ku heya bi xwe dêriz nebe dev ji zimêن bernade. Gava parçeyek biçûk jî jê bimîne, qasî li ser wî heyî diparêze û digihîne nifşan.

Ziman û aborî

Peywendiya zimêن bi aboriyê re

Ev peywendiya han ji wan ên din cuda ye. Her çiqas aborî bê zimêن nayê hizirîn jî, lê qasî wan ên ku me li jorîn nivîsandine ew qas ne di hundirê hevdu de ne. Lê bandora wan li ser hevdu heye. Zimanek fireh ê pêşveçûyî dikare aboriyek tekûz bafirîne. Di eynî gavê de, aboriyek tekûz a pêşveçûyî jî dikare gelek peyvan bide zimêن. Ji vê hê girîngtir, aborî bandor li afirandina zimanê netewî dike. Netewek bi ci awayî dibe bila bibe, dema zimanê xwe yê aboriyê winda bike bi xwe jî hêdî hêdî bi aliyê windabûnê ve diherike. Em vajiyê vê gotinê hildin destê xwe, ew bûyerêن gel û netewên cîhanê bi aliyê hevdu ve dibin û nêzîkê hevdu dîkin; a herî girîng dîsa aborî ye. Lê divê neyê ji bîrkirin ku ewê kesan dike kole, ewê kesan di destê hevdu de dide kuştin, bi kurtî em ku bibêjîn ewê cîhanê qir dike jî dîsa aborî ye.

Ev peywendiya han ji wan ên din cuda ye.

Her çiqas aborî bê zimêن nayê hizirîn jî, lê qasî wan ên ku me li jorîn nivîsandine ew qas ne di hundirê hevdu de ne. Lê bandora wan li ser hevdu heye. Zimanek fireh ê pêşveçûyî dikare aboriyek tekûz bafirîne. Di eynî gavê

de, aboriyek tekûz a pêşveçûyî jî dikare gelek peyvan bide zimêن.

Ji vê hê girîngtir, aborî bandor li afirandina zimanê netewî dike.

RAMAN Ü ZIMAN

SEFIK BEYAZ

Ziman, tiştekî wisa piralî û guhêrbar e ku mirov yekcar nîkare biwezinîne. Hinek nepeniyên wî wisa he-ne ku iro jî, hêj nehatine piş-kavtin. Ziman, saziyeke wisa ye ku pêwendiya wî ya bi însên re, bi civakê re, bi za-nîstê re, bi pîşeyê re, bi tek-nolojiyê û hwd. re him xwirt û şidiyayî ye û him jî wan tî-ne himatê.

Li ser rûyê dinê, tiştê ku cih û nirxê însên nîşan dike ziman e. Hêman û benda herî xwirt a ku civakekê dike ne-tew ziman e. Ziman, ji her alî ve neynika çanda neteweyî ye, Ziman ji her alî ve saziye-ke wisa xwirt e ku di civakê de mirov raman, hest û xwes-tekêن xwe bi navgîna deng û wateyên hevpar dikare ragihî-ne hevûdu.

Ziman, ji ber pêwendiya xwe ya bi civakê û çanda wê re, saziyeke civakî ye. Tiştê ku însên dike mirov, ziman e. Ziman, hîm û stûna sereke ya civakê ye. Hêmana sereke ya

ku gel dike netewe ziman e. Ziman movik , pirusk û hes-tiyê pişta çandê ye. Li ser pirsgirêka pêwendiya ziman û civakê di sedsaliya 20'an de pir guftûgo hatine kirin.

Girîngiya pêwendiya zimên û civakê di sedsaliya 18an de derdikeye pêş me. Gelek zanyar û zimanzanên wek Hesder, Wilhelm Von Hunboldt, Whorf û hwd. Li ser vê mijarê bi şêweyek gi-rîngî rawestîne, W. Von Humboldt" Giyana neteweyekê zi-manê wê ye, zimanê wê jî gi-yana wê ye." K. Wossler" Zi-man neynika çandê ye," Glîns "Ziman yekîtiya saziya civakî û dîrokî ye," dibêje.

Di dawiya xebatêن zanyarî yên ku di warê filozofî û psî-kolojiya zimên de, hatine kirin de, derdikeye holê ku tay-betiya sereke ya ku însên dike mirov, ziman e. Rossi Landî "heke ziman nehatibuwa pêşxistin, însan nikaribû wek mirovan bijiya. "Sînorêن zi-manê me, sînorêن dinya me ye" dibêje. Heringer "Wateya avê ji bo jiyanê çi be, ji bo însên ziman jî, ew e." Dibêje.

Ragihadina ramanê, di navbera mirovan de çêdibe. Bermayêن zanînê bi navgîna zimên ji nivşen kevin derbasî nivşen nû dibin. Depokirin û belavkirina zanînê, bi navgî-na zimên pêk tê. Pêşveçûna ramanê jî, her wiha ye. Bingeha çêbûn û pêşveçûna însên jî ev e. Ziman, mirov û raman bi hev re, di nêv pêwendiyeke xwirt de ne. Zi-manê zikmakî motora bîrê ye.

Ziman, ji ber
pêwendiya xwe ya bi civakê û çanda wê re, saziyeke civakî ye. Tiştê ku însên dike mirov, ziman e. Ziman, hîm û stûna sereke ya civakê ye. Hêmana sereke ya ku gel dike netewe ziman e. Ziman movik , pirusk û hes-tiyê pişta çandê ye.

Hest û raman ji hev cuda ne. Wate, livbaziya ramanê bixwe ye. Wate, hevparê ne-cuda yê peyvê ye. Peywira zimên a yekemîn komînîkasyon e, komînîkasyona civakî ye. Tolstoy, di nivîsarên xwe yênen perwerdeyî de, dibêje ku zarok gava peyveke nû hîn di-be, bilêvkirina peyvê lê zêde zehmet nayê. Lê wateya peyvê zû bi zû di mîjîyê wî de bi cih nabe.

Mirov, di zimanê xwe yê zîkmakî de, tiştîn hêsan û be-sít ji yênen tevlîhev zûtir hîn di-be. Bandora hîndekariya zi-manê zîkmakî ya li ser zarokê piralî ye. Him nasnameya zarokê dikemilîne û him jî, der-feta îfadekirinê zêde dike. Mirovê ku zimanê xwe yê zîkmakî baş bizanibe sazû-mana ramanê ji hîn dibe û dikare ramana xwe baş îfade bi-ke.

Em ji zimên çiqas bikaribin zêde îstîfade bikin û di vê mijarê de pêkhatî bin, fêrisen me yênen ramanê jî hewqas zêde dibe,

Raman û îfadekirina ramanê bi awayekî şidiyayı bi hev ve girêdayî ne. Di per-werdehiya zarokan de, hêza zanîna zimên xwedî cihekî bilind e.

Nexwe di têgihîştina ramanê de, rista fêrbûna zimên gelek mezin e. Ji bo ku mirov bikaribe ramana xwe îfade bi-ke û ragihîne hevûdu û hev serwext bike, berî her tiştî divê mirov zimanê xwe yê zîkmakî baş bizane.

Mirov, ji bo ku bikare ra-

manên bixe nav sazumanekê, divê mirov zimên baş bizane. Komînîkasyoneke aşîkar di-yar û objektîf peywira zimên a yekemîn e. Ji ber vê yekê mirov nikare hîndekariya zimên ji metodênen ramanê ve-quetîne. Ziman û raman bi hev ve girêdayî ne. Mirov nikare wan ji hev vequetîne, Ji ber vê yekê jî, mirov nikare hîndekariya zimanê zîkmakî, ya wêje û filozofiyê ji hev veqe-tîne.

Piştî ev çend gotinan, divê em li siyaseta Tirkîyeyê ya zimên a ku hêj jî, tê bikara-

hwd. asîmîle bike, di nêv xwe de bihelîne û bike Tirk. Ar-manca dewletê ew e ku za-rokên Kurdan û yê gelên kêmahî yênen din ji nasnameya wan a neteweyî dûr bixe û bi giyanekê nîjadperest wan bi-gihîne. Li bakurê Kurdistanê û li Tirkîyeyê bêtirî 25 mîlyon Kurd dijîn. Her Sal bi sed hezarî zarokên Kurd dest bi dibistanê dîkin. Dewlet, bi vê politîkaya xwe ya perwerde-hiyê tenê zimanê Kurdi qede-xe nake, mafê hînbûn û hînki-rina zimanê zîkmakî ji destê zarokên Kurdan distîne. Her

Ev polîtîka nîjadperest, riya pêşvebirin û xwirtkirina nasnameya mirovî li ber zarokan dibire, mîjîyê zarokan kor dike û riya ramanê jî digire. Armanca dewletê ew e ku ziman û çanda Kurdi ji holê rake. Wateya vê polîtîkayê, qirkirina gelan e. Navê vê qirkirina jenosîda spî ye. An ku qirkirina ziman, çand û dîroka Kurdi ye. Li Tirkîyê ev rewş, 70 Sal e ku wiha didome.

nîn, binêrin ka çawa ye. Des-tûrnameya bingehîn a komara Tirkîyê xala 42'an dibêje ku "li Tirkîyê di saziyên hîndekarî û perwerdehî de, ji bili zimanê tirkî, tu ziman wek zi-manê zîkmakî nayê fêrkirin." Dewleta Tirk, bi vê qanûnê bi eşkere ji destê zarokên Kurd mafê fêrbûn û perwerdebûna zimanê zîkmakî distîne, xesb dike. Ev polîtîka, mafê xwe-zahî û însanî yênen zarokên Kurdan încar dike. Dewlet, bi vê polîtîkayê dixwaze ku za-rokên Kurd, Ereb, Asurî û

wiha hînbûn û fêrkirina çand û dîroka Kurdi jî, qedexe di-ke. Bi vî awayî jî, pêwendîya zarokên Kurdan ji çand û dîroka wan dibire.

Ev polîtîka nîjadperest, riya pêşvebirin û xwirtkirina nasnameya mirovî li ber zarokan dibire, mîjîyê zarokan kor dike û riya ramanê jî digire. Armanca dewletê ew e ku ziman û çanda Kurdi ji holê rake. Wateya vê polîtîkayê, qirkirina gelan e. Navê vê qirkirina jenosîda spî ye. An ku qirkirina ziman, çand û dîro-

ka Kurdî ye. Li Tirkîyê ev rewş, 70 Sal e ku wiha didome.

Siyaseta hîndekarî û perwerdehiye ya dewleta Tirk pêşberî prensîbên demokrasiya azadîxwaz e. Ev politîkeya nijadperest, li dijî nirxên demokrasiyê ye. Ev siyaseteke ne hemdemî û ne jî mirovî ye. Mafê mirovahiyê ji holê radike. Divê dewlet, dev ji vê siyaseta antî demokrasî û ni-

dehiyê pêşîn divê destûrnâmeya Tirkîyê ya bingehîn bê guhertin. Divê azadî û wekheviya gelên Enatoliyê û yên Kurdistanê bê pejirandin. Divê wekheviya mafê Tirkân, Kurdan û gelên din bê tescîl-kirin. Destûrnameya nû divê bibe belgeya azadî û wekheviya gelên Enatoliyê. Lewre li Enatoliyê û li Kurdistanê gelek gel, çand û ziman hene. Dewleta ku nû bê avakirin ji

Enatoliyê zimanê Tirkî dikare wek zimanê fermî bimîne. Kurdên li Enatoliyê û gelên din divê karibin bi zimanê xwe yê zikmakî, di xwendegehîn dewletê û yên din de, perwerdehî û hîndekarî bikin. Di pêwendiyêñ fermî de, divê Kurdî jî bê bikaranîn.

Îro li gelek welatan çend ziman bi hev re bi awayek fermî wek zimanê dewletê tên bikaranîn. Mînak:li

Ji ber vê yekê û ji bo ku zimanê Kurdî karibe pêşve biçe, divê li vê herêmê zimanê fermî Kurdî be. Gelên din ên kêmahî wek Tirk, Ereb, Asurî û hwd.

divê karibin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehî û hîndekarî bibin. Li Enatoliyê zimanê Tirkî dikare wek zimanê fermî bimîne. Kurdên li Enatoliyê û gelên din divê karibin bi zimanê xwe yê zikmakî, di xwendegehîn dewletê û yên din de, perwerdehî û hîndekarî bikin. Di pêwendiyêñ fermî de, divê Kurdî jî bê bikaranîn.

jadperest berde. Divê ev polîfîka ji hole bê rakirin, siyaseteke nû, demokrasi û însanî bê bikaranîn. Ev pêwîstiyekê mezin e.

Heke dewlet dixwaze ku Kurd û Tirk bi hev re bijîn, berî her tiştî divê rûmet bide ziman, çand û dîroka Kurdan. Divê ew qeyd û bendên li ser ziman, çand, mêtîjî û hesta Kurdan û gelên bindest ên din heye, bêن rakirin. Her gelek divê êdî bikare mafê xwe yê perwerdehî û hîndekariyê bi zimanê zikmakî bikarbîne. Ev maf, mafekî demokratîk, xwezahî û însanî ye.

Ji bo demokratizekirina sazûmane hîndekarî û perwer-

bo pêşvebirina ziman û çanda gelan divê rê veke, derfetan amade bike. Dewlet, divê ziman û çandêñ li Enatoliyê û li Kurdistanê biparêze.

Îro di nêv gelên Enatoliyê û yên Kurdistanê de, Kurd û Tirk du grubêñ herî mezin in û li bakurê Kurdistanê piraniya niştevanan ji Kurdan pêk tê. Ev herêm welatê Kurdan e.

Ji ber vê yekê û ji bo ku zimanê Kurdî karibe pêşve biçe, divê li vê herêmê zimanê fermî Kurdî be. Gelên din ên kêmahî wek Tirk, Ereb, Asurî û hwd. divê karibin bi zimanê xwe yê zikmakî perwerdehî û hîndekarî bikin. Li

Swîsrê 4, li Efrîka Başûr 2, li Luxemburgê 2, li Kanadayê 2, li Îtalyayê 4, li Spanyayê 3, li Belçikayê 2, li Hîndistanê 15, li Pakistanê 3 ziman bi fermî ji alî van dewletan ve tên bikaranîn.

Sazûmaneke demokratîk û însanî dê hest û ramanên aşitiyê di nêv gelên Enatoliyê û yê Kurdistanê de ges û xwirt bike. Gelên Enatoliyê û Kurdistanê dikarin azad, wekhev, di nêv aşitiyê de û bi hev re bijîn. Di vê sazûmane de, gel dê çêtir karibin ji çand û zimanen hev istifade bikin. Sazûmaneke wiha dê riya çanda demokrasiyekê azadîxwaz veke.

Başûrê Kurdistanê

û Guft û Goyên Dewletan

ên li ser vê besê (I)

AMEDEKAR

HESEN MIHAMED

(Ji erebî: Celalettin Yöyler)

Bi gelempêri nêrînekî li ser vê deverê

Hejmara kurdên di vî besî de, di navbera 4.5 mîlyonan de ye, yanî ji %30ê niştecihê Iraqê ye. Ev never ji 5 besan pêk tê: Wilayeta Dihok, Mûsil, Silêmanî, Erbil, Kerkük digel devera Xaniqînê, di nav wilayeta Diyalayê de. Rûpîvana vê beşa başûr bi hindikî

dighîje 97.000 km ango ji %23 ji tevahiya axa Iraqê. Hem jî tê hejmartinê, yek ji neveren cîhanê herî dewlemend ê bi petrol e. Nemaze Kerkük ji hêla paqikirin û derxistina petrolê ve. Bi destxistina petrolê, di wê neverê de, li dora 60 mîlyar bermîlî ye. Yênu ku di neverê de dijîn nemaze di wilayeta Nînawa (Mûsil) û Kerkükê de, ji

Dîmenek ji Hewlêrê



nijad û kesen ji bilî kurdan Aşûr û Tirkmen in; lê hejmara wan li ber kurdan pir kêm e. Dever ji zincîreke ciyayê bi tirs û saw li ser sêkoşeyekî, di nav tixûbê Iraq, Tirkîye û Iranê de cih girtiye. Zemîna wê bi rast û bilind û girik digîhîje 17.000 km, lê dîsa jî ev qad ji çandiniyê re, pir bi xêr û bêr e. Bajarêne wê neverê yên girîng ên mezin Kerkük, Mûsil, Dihok, Zaxo, Erbil, Silêmanî ne. Serwetêne xwezayî yên girîng ên di neverê de:

Madenên, komir, petrol, xaz, fosfor, xoyêni kilsî, filz, qela, sifir, qirom, tütya digel hinekî ji kevirêne ji bo avakirina avahîyan, mînanî kevirê marxret û sewan.

Di demen pêşîn de, birek nav li vê neverê hatine kirin, mînanî welatê di nav bera her dû çeman de, Mezopotamya, Iraqa Ecemî (ne Ereb), lêkolîvanen ku ew bi awayê nexseya neverê dibêjin Kurdistanâ Iraqê, bi rewşa zagona navnetewî. Bi gelempêri û zanistî

hemî lêkolînvan û nîqaşvanê dîrokê didine nîşan ku ev de- verâ hanê dergûşa şaristaniya mirovatiyê tê de hatiye avaki- rin. Yanî dergûşa mirovahîya herî berîn e? Di vê deverê de, çandinî, nivîsandin hatiye a- firandin. Dema ku em li dew- lemendiya vê deverê û li stra- tejiya nexseya wê ya cuda dinhêrin, em dibînin ku rêya hevrîsimê ji welatê Çinê heta welatê Ewrûpayê, di nav vê deverê re derbas bûye. Ji ber vê stratejiyê, never bûye ciyê çavberdana kesên biyanî û bûye warê cenga li serhev, ji hêla Asûriyan, Farisan, Yew- naniyan, Romê ve.

Di dawiya sedeya penzdan de, never rastê hevxe niqandin û cenga dijwar a di navbera Sefewiyan û Osmaniyan de

hat û bû sedema parvekirina Kurdistanê, di navbera van herdû hêzan de. Îranê dest da ser beşa rojhilat, Osmaniyan Tirk jî dest danîne ser beşa herî mezin ji bakûr û başûr piştê cenga Caldêranê, di sala 1514an de û peymana Qesra Şîrînê di sala 1639î de.

Piştî hevdaketin û hejariya selteneta Osmaniyan, Ewru- piyan çav berda never û warê mîrata Osmaniyan. Nemaze di navbera mêtîngeran de, Împeretoriya Birîtanî xwest û çav berda dagirkirina Kurdistanê, bi gelempêri ya Kurdistanâna başûr û nevera Mûsilê.

Di dawiya sedeya nozdan de û destpêka sedeya bîstan de, never kete binê êrîş û xwestinê bicîkirina pîlanê imperializma Îngîlis ên mêtîngerî.

Têkoşîn û pêşbirkiyê mêtîngeran, li ser Kurdistanâna başûr.

Dewleta Îngîlis di dawiya sedeya nozdan de, beriya her dewletê hînbû ku di Kurdistanâna başûr, di nevera "Mûsilê" de petrol heye. Vê dewletê hînbûna xwe ya petrolê, ewa ku ji Ermeniyekî bi navê Xol- bengyan ji îstixbarata Îngîlis re gotibû nirxand û li ser neverê rawestiya.

Di 28ê pûşpera 1914an de Sefareta Îngîsan ji împaratoriya Osmaniyan destûra derxistica petrolê li nevera Cizîre û Mûsil û Bexdayê û damezrandina şirketa bi navê (petrola tirkî) TPO Ewa ku ji şirketa (Shell) û Banka bi

navê Dewîteş Bank sitand û damezrand. Lê para pir mezin para Îngîsan bû.

Her wisa Elmanya jî, bû xudanê rêya hesin a bi navê xeta (HambûrgBexdad). Li hemberî vê şirketa rêya hesin a Elmanî, Îngîs jî ji bili şirketa petrolê bûne xudanê şirketa rêya avê ya li ser çemê dicle û feratê.

Emrîkiyan jî di sala 1909an de, bi alîkariya karbi- destê xwe yê bi navê Edmîral Kolebî Teşster bû xudanê şirketa rêya hesin a ku ji bajarê Sêwazê hetanî Silêmaniyê di- çê. Her wisa vê şirketê xwest ku di nava vê xebata xwe ya rêya hesin de, bi qasê 20 km mafê derxistica petrolê û yê deranîna madenê jî bi destê xwe ve binîn, lê şirketa Elmanî ya rêya di navbera Hembûrx û Bexdayê de ev daxwaz nepejirand. Lê şirketa Lanş- ster ev pîlan ji bo sermaye Emrîkî pir girîng didît, hem jî ji bili girîngiya aborî li cem Emrîkiyan girîngiya strateji li pêş bû. Li hember vê pêşgir- tina Elmaniyen ji derxistica petrol û madenê bi destê Em- rîkiyan, Emrîkiyan helwesta xwe ya ji bo neverê bi vî a- wayî eşkere kir û got: Ji bo serkeftinê, pêşveçûyinê, pir- bûna mal, bê parastin bi siya- setê û hêza çekdariyê nebes e.


Emrîkiyan ev raman di destpêka sedeya bîstan de ji xwe re girîng dîtin û şopan- din.

Çavên dewleta Ferensa di nava împaratoriya Osmanî de hebû. Wekî tenzîmkirina karê

Emrîkiyan jî di sala

1909an de, bi alîkariya karbi- destê xwe yê bi navê Edmîral Kolebî

Teşster bû xudanê şirketa rêya hesin a ku ji bajarê Sêwazê hetanî Silêmaniyê di- çê. Her wisa vê şirketê xwest ku di nava vê xebata xwe ya rêya hesin de, bi qasê 20 km mafê derxistica petrolê û yê deranîna madenê jî bi destê xwe ve binîn, lê şirketa Elmanî ya rêya di navbera Hembûrx û Bexdayê de ev daxwaz nepejirand.



Nexşeya Mosul û der û dorê wê ya ku di nava lêkolinên Carsten Niebuhr de hatiye weşandin.

cendermetiyê her wisa rêxis-tinkirina hêza cendermeyêni li çiyayêni Libnanê, hem jî xebatêni wî yên di karên çekirina rîyêni Osmaniyan de, di xebata xwe ya çandî û olî ya li bal kesêni îsewiyêni di nava Osmaniyan de û nemaze di deverê Kurdistanana başûr de, di nava Aşûriyan û Suryaniyan û Keldaniyan de, çawa ku ji bo Firansayê qasidne Olî hebûn, alfâkariya van kesêni îsewî yên di devera başûr de dikirin. Bandora wan a li ser

başûrê Kurdistanê, wan da tima kirin ku ew devera Mûsilê hildane binê bandora xwe. Çawa ku di peymana Saykes-bigojê de Firansewiyan wisa

xwestin.

Lê dewleta Rûsyayê jî dixwest ku bi gelempêri Kurdistanê bixe bin destê xwe û xwe bigihîne avêni dewlemend, nemaze bi destxistina devera başûr û rojhilate Kurdistanê, li vê mebestê dewleta Rûsyayê birekî caran bi Osmaniyan re kete nava cengêngiyan, lê alîkariya Înglisän ji bo Osmaniyan nehişt ku Rûs bigehijine armanc û mebestêni xwe yên dagirkirina Kurdistanê.

Di vê pêsbirka navnetewî ya li ser axa Kurdistanê de, dewleta Bîrîtanyayê ji herkesî bi hêztir bû, di warê xebata berçavî de, lewra hêzén wê

yên leşkerî di bajarê Besrayê de bûn. Împeryalizma Brîtanî mebest û armancêni wê dagirkirina Kurdistanê bi tenê nebû, armancêni wê ji Kurdistanê heta Qafqasyayê bû. Dewleta Brîtanî diyarkir ku girîngtirîn niqaşen li ser pi-lanen me yên deverê ku ji hêla Lord Gurzon ve li pêsiya Berlemana Birîtanî hatiye eş-kerekirin. Ji bo pêşeroja siyaseta mêtîngîriya Birîtanî bi vî awayî hatiye zimên:

Tixûbê rojavayê Hindistanê dirêj dibe heta bi çemê ferat. Didomîne û dibêje: Ji çewtî û xeletiyan ku em bêjin berjewendiyê Brîtanyaya di derbendê de bi sînor e, an jî em bêjin ji Besrayê hetanî Bexdayê ye, berjewendiya me dirêj dibe û ji Bexdayê dibore yanî digehîje Mûsilê, Kurdistan û Qafqasyayê.

Dû re nivîskarê Elmanî Karl Hovman, li ser girîngîya Mezopotamyayê (Kurdistanê) di nava siyaseta dewleta Înglîsi de, tîne zimên û dinir-xîne û dibêje: Girîngîya Mezopotamya ji bo Înglisän hem rewşa deverî û herêmî, hem jî rewşa wî ya siyasî ye, lewra dever xudanê zincîren bingehnêngirîng e. Di rêbuwariya di navbera Misrê û Hindê de, heta heke petrol jî li vê deverê tune be dîsa girîngîya wê di warê siyasî de ji bo Bîrîtanya heye. Ji ber ku dever xudanê neftê ye jî, girîngîya wê ji bo Înglîs di warê siyasî û deverî de hê pirtir e. Bêtir ji vê girîngîya wê ya taybetî ji ber ku deveke bi petrol e

wisa jî xwe dispêre ser girin-
giya herêmî û siyasî.

Mecala bêkanîna pîlanan

Piştî cenga cîhanê ya ye-
kem, (1914 1918) kete destê
împeryalîzmê!

Gava ku baş hate zanîn û
xuyakir şikestina dewleta E-
leman û ya Osmaniyan di
cenga cîhanê ya yekem de, bi
lez dewletên împeryalist ên
cîhanê dest bi parvekirina mî-
rata van her du dewletan ki-
rin. Li ser vê yekê, di navbera
Birîtanya û Feransa de bi des-
tûrdayîn û destekirina Rûsyâ
û İtalyayê peymaneke bi
navlîkirina peymana Saykes
Bîko di 1517yê meha Pûşperê
de sala 1916an de, hate
girêdan û devera Mûsilê dane
destê Feransiyen, paramayê
Iraqê, ji Besrayê heta Bex-
dayê jî dane Îngîsan. Îngilî-
san ev peyman xirab kirin, ji
ber ku devera Mûsilê ji bo
wan nehatîye dayîn û Wezîrê
karê derive yê Îngilîs ev pey-
man bi belgeya dîntiyê û ze-
rarê bi navkir. Pişt re helwes-
ta Îngîsan hate zanîn ku hel-
westeke taktîkî ye, armanc jê
tîrsa ji dijbertî û nakokiyêni
di navbera wan û Rûsyayê de ku
dernekevin, loma vê taktîkê
bikaranî û peyman xirabkir.
Piştî serkestina şoreşa oktobr
a Bolşevikî ya Rûsyayê, di
sala 1917an de mecal ji bo
Îngîsan çêbû ku bi serbestî
peymanê bi karbîne û qet
Rûsyayê nexe navê û rewşa
devera Mûsilê jî ji destê xwe
nede revandin.

Hêzên leşkerî yên îngilîsan
di binê fermandariya General

Î. Marşal de, êrîş birin ser
herêma Mûsilê û herêm xistî-
ne bin destê xwe. Di 1917an
de, di heman demê de leş-
kerên Osmaniyan ên di binê
fermandariya Eli İhsan paşa
de, ji deverê direvin û deverê
naparêzin. Her wisa deverên
Kurdistanê bi gelemerî û bi
êrîşen hêzên kurdan digel
Îngîsan ji binê dagirkirina
Osmaniyan dertê.

BÎRYARA HER TÎŞTÎ HÊZ DIDE

Bi vê ramanê Birîtanyayê
siyaseta xwe da meşandin û
şopand û êrîşa xwe ya li ser
Mûsilê bikaranî û dû re êdî ev

Hêzên leşkerî yên

îngilîsan di binê
fermandariya General
Î. Marşal de, êrîş birin
ser herêma Mûsilê û
herêm xistine bin
destê xwe. Di 1917an
de, di heman demê de
leşkerên Osmaniyan ên
di binê fermandariya

Eli İhsan paşa de, ji
deverê direvin û
deverê naparêzin. Her
wisa deverên
Kurdistanê bi
gelemerî û bi êrîşen
hêzên kurdan digel
Îngîsan ji binê
dagirkirina Osmaniyan
dertê.

dever neda Feransayê. Çawa
ku di peymana SaykesBîko
de dabûne Feransayê. Dû re
çend civînênê dîplomasî di
navbera wan de hatine lidar-
xistin û Feransa destê xwe ji
deverê di sala 1919an de ki-
şand û bû xudanê parekî ji
petrola deverê. Hem jî xu-
danê para di şirketa petrola
tirkan de, hem jî Birîtanya ji
bo Feransayê bandora li Sur-
ya û Libnanê û Kîlîkyayê re-
wa dît û pejirand. Dewleta
Ferensa girîngiyeke mezin di-
da wilayeta Mûsilê heta
dibêjin ku serokwezîrê Feran-
sa wiha gotiye: Yek bermîlekî
ji petrola Mûsilê beranberê
dilopekî xwîna leşkerekî Fi-
ransayê ye.

Nivîskarê Rûsî yê bi navê
Lazarof di nivîsa xwe de
dibêje: Dêwleta Birîtanya,
pêwîstiya wê heye bi Musilê
ne ji bo armancê xwe paras-
tinî, ji bo ku wekî wargerhekî
stratejik di destê xwe de bide
xebitandin. Ji bo ku ji Qahî-
reyê heta bi Kelkûtayê li pey
hev mal û berjewendiyê Birî-
tanyayê bide bicikirin. Nivîs-
kar didomîne û dibêje: Birî-
tanya ji bo êrîşen kifse dix-
waze Mûsilê bixe serê pir û di
ser re derbasê hedefen xwe
yên leşkerî yên li her hêlî bi-
be, li rojhîlat û li rojava û he-
ta devera Qafqasyayê û ya
derya reş.

Dîsa nivîskarê Rûsî Laz-
arof dibêje: Bi awayekî dinê
em mijara Birîtanya û Mûsilê
binirxînin, armanc ji dagirkir-
ina Mûsilê firehkirina ban-
dorê ye, heta Tirkîyê û Kur-

distanê, û rojavayê Ermenîstanê.

Zana û pisporê bi rewşa kurd û Kurdistanê Raîr Noîl di dîtina xwe de, pêşeroja kurdan ji bo dewleta Birîtanya nirxandiya û gotiye: Kurd wê ji vir şûn ve wê bibine pir û perde di navbera ereban û siyaseta qefqasan de, bijartina kurdan ji bo berjewendiyên Birîtanyayê çêtir e ji bijartina Ereban û xwe sipartina ser wan.

Di vî warî de, nivîskarê ûngilîsi, Leward xwediyyê pir-tûka bi navê parvekirina Tirkî dibejê: Bajarê Mûsilê cihekî girîng digre li Kurdistanê û hejmareke mezin jî kurd li ser wê axê dijîn, hem jî bilind li Kurdistanê dinhêre bi awayê

nexseya xwe. Nivîskar dibêje: Pêwîst e li ser Birîtanya ku bersiva kurdan bide ji bo ava-kirina dewleteke kurdî, çawa ku Şêx Mehmûdê Berzencî bang li Îngîsan kir ji bo damezrandina dewleta kurdî digel tevlêkirina beşa Kurdistanê ya rojhilat. Lê mebesta Brîtaniyan zivirî bal red kirina vê bangê û bû sedemê na-kokiyên di navbera wan û kurdan de, lê dîtina Îngîsan di derbarê vê pisgirêkê de bi vî awayî derkete holê.

1- Damezrandina dewleteke kurdî bi serê xwe, di Kurdistanâ bakûr de

2- Avakirina desthilatdariyekê herêmî an jî eyaleteke di bin destê Îngîsan de, li basûr.

3- Redkirina beşa rojhilat bi tevlêkirina dewleteke kurdî ya serbixwe.


4- Girêdana beşa kurdistanê, bi dewleteke ku ji wîla-yeta Besrayê û Bexdad û Mûsilê pêk tê ve, yanî federalî û eyaletî.

5- Kurdistanê bixe pir di navbera ereban û tirkan de.

6- Kurdistan bi stratejiya erdnîgara xwe çiyayê xwe yê asê bibe cihê parastina heyîn û berjewendiyê wan ên mîtingerî, di Mûsilê û Iraqê û gelempériya derbendê ereban de.

7- Ji mebestêÎngîsan parastina rîya hevrişim di bin bandora wan de ji Misrê heta Hindê. Lewra rê di Kurdistanê re derbas dibe.

Peymana Sewrê, di 10ê Gêlawêja sala 1920an de, biryara damezrandina dewleteke kurdî di binê xala 62,63,64an de hilda. Bi vê peymanê biryar da ku di nava salekê de, li beşa bakur Kurdistanê serbixwe bête avakirin. Her wisa beşa basûr jî digel devera Mûsilê bi referandomekê di nav gelê kurd ê deverê de, tev li vê dewletê bibin. Hêja ye ku mirov bibêje, peymana Sewrê belgeya navnetewiya ku mijara pirsgirêka kurdan ewqas fireh hil-daye nav xwe û mafê avakirina dewletekê yekem car di dîroka demê de pejirandiye.



Dewleta Birîtanya digel peymanên li Sewrê, di derbarê avakirina Kurdistanê de û piştî salekê bi referandoma başûr tevlibûna başûr digel devera Mûsilê, dîsa dest ji pîlanê xwe yên dagirkerî û mêtîngerî yên li ser Mûsilê bernalda.

A bi vî awayî dewleta Îngilîs bi tundî hewl da xwe ku dewleteke cîhanê bibêje Bila Mûsil di bin destê Birîtanayê de bimîne û bikeve nava birêvebiriya Bexdayê. Ji ali-yelekî din ve van dewletên hevgirtî dixwestin ku alîkariyê bidine tevgera li hemberî Bolşevîkan li Rûsyayê û her wisa li hember tevgera Mustefa Kemal, destekê bidine selteneta Osmaniyan li stenbolê. Ev yek jî çawa ku tê zanîn dewleta Îngilîs bi peymana Sewrê razî nedibû û dixwest wê peymanê

hilweşîne, lewra nedixwest ku deshilatdariya xwe ji ser Mûsilê rake û tevli dewleteke kurdî bike. Li ser vê ramana Birîtanyayê ya mêtîngerî ji bo mijara Sewrê Konferanseke di navbera 12 û 30 yên Adarê de di sala 1921ê de, di serokatiya Winston Terşel ê Wezîrê mêtîngerên Birîtanî de û amadebûna serokên birêveberên Birîtanî û mezinên ji serleskeran û îstîxbarata Birîtanya de di gelempériya deve-ra rojhilata navîn de hate lidarxistin. Armanc ji vê konferansê nîqaşkirina doza kur-

dî û civandina ramanê di derbarê Mûsilê, Kurdistanê û Iraqlê de.

Biryar û ramanên ku ji vê konferansê derketin li dora van dîtinan hatine civandin:

1- Hima pê re bila dest ji ramana tevlîkirina başûr a Kurdistanâ bakur ku di Sewrê de biryara avakirina wê hatiye dayîn, bête berdan.

2- Pêdiviya parastina Kurdistanâ başûr ji hêla mêtîngererekî tûz ve. Yanî pêwîst e ku ev devera bi xêr û bêr negehîje xwediyê xwe û bimîne di

taniyêن di deverê de, dane xwiyakirin ku vegetandina wilayetên kurdan ji dewleta tirkîyê, dibe kuştin ji tirkîyê re. Lê bi rastî divê ku gelê kurd di binê sîwana Ewrûpayê de, ji binê bandora Osmaniyan derkevin ji bo ku ev gel hê xwe bi xwe bi rêve bibe û xwe bide parastin. Lê em bawer nakin ku ev gel bikaribe bi serê xwe bijî, rastiya bûyerê ev e ku em bi mudaxeleyê leşkerî vî gelî ji binê bandora tirkîyê bidine rizgar-kirin, ci dema ku bi hêsanî aş-

Bi vî awayî pîlanê mêtîngeran li ser axa Kurdistanê

destpêkir û li ser dageriya qada Mûsilê rawestiya. Bi vî rengî Îngilîsan projeyên xwe yên tevlihevî yên di navbera ereban û kurdan de amade kir û bi ramana ji hev veqetînê û bi rê ve birinê. Yanî ereban û kurdan berde hev û bimije.

binê bandora Birîtanyayê de.

3- Bila Melîk Feysel bibe Melîkê Iraqê.

4- Dewleta Kurdî ya ku wê li bakûrê Kurdistanê bê avakirin, ewa ku wê dibinê bandora Birîtanyayê de ye ew divê bi dewleta ereb ya Iraqê ve bê girêdan.

Bi vê ramanê nûnerê Îngilîs Bêrsî Kokes bi eşkeretî dibêje: kesên ku dixwazin dewleteke kurdî damezrînin di binê dostiya wan a ji kurdan re, dijminiya Iraqê ji bo me dertê.

Tevgerên leşkerî yên Birî-

tî çenabe.

Bi vî awayî pîlanê mêtîngeran li ser axa Kurdistanê destpêkir û li ser dageriya qada Mûsilê rawestiya. Bi vî rengî Îngilîsan projeyên xwe yên tevlihevî yên di navbera ereban û kurdan de amade kir û bi ramana ji hev veqetînê û bi rê ve birinê. Yanî ereban û kurdan berde hev û bimije. Ji bo berjewendiyê xwe pîlanê xwe yên mêtîngerî û stratejiyê di devera Kurdistanê û ya bendava ereban de bidine meşandin, çawa jî wisa kirin û kurd ereb-berdane hev.

ÇEND TÊBINÎ LI SER CÎNAVKÊN KURDÎ

SAMÎ BERBANG

Di nivîsê de min divê ez li ser cînavkên kesane û pêrebestî yên sê zaravayên kurdî (kurmanciya jorîn, kurmanciya jêrîn û kirmancî) rawestim. Lewre li gorî baweriya me di navbera cînavkên kesane û cînavkên pêrebestî de hin têkiliyên balkêş hene. Her wiha di navbera cînavkên her sê zaravayan de têkiliyeke taybet heye. Pêşî divê em hinekî li ser cînavkên pêrebestî rawestin. Ev cure cînavk wekî qertaf bi dawiya lêkeran ve dibin û ji navdêran jî cuda têne nivîsandin. Celadet Bedirxan van cînavkan wekî lêkera *bûn* bi nav dike. Lê dema hinek zimanzanê din li dijî vê dîtinê derdi Kevin û didin zanîn ku ew jî cînavk in. Li gorî dîtina me jî ev bi serê xwe ne û tu têkiliya wan bi lêkera *bûnê* re tune ye, lewre ew têni dawiya lêkera *bûnê* jî.

Bo nimûne mirov dikare lêkera “çûn” û lêkera “bûn” bide ber hev.

Çûn:

Ez çûm, tu çûyi, ew çû, em çûn, hûn çûn, ew çûn.

Bûn:

Ez bûm, tu bûyi, ew bû, em bûn, hûn bûn, ew bûn.

Her wekî ji mînakan jî diyar e tu cudatî di navbera lêkera çûn û bûn de nîn e. Ew jî dîtina serbixwebûna cînavkên pêrebestî diselimîne.

Piştî van agahiyêni li ser cînavka pêrebestî, êdî em dikarin cînavkên kesane û yên pêrebestî yên her sê zaravayan rêz bikin. Ji layê rêzimanî ve du zaravayên kurdî ji yên din cuda dibin, lewre di zaravayên Bakur (kurmancî, kirmancî) de zayend û tewang

hene û ji bo ku bireser û kirde ji hev bê derxistin, du kom cînavkên kesane hene, lê di zaravayê Başûr kurmanciya jêrîn de ji ber ku zayend û tewang ji holê rabûne, bi tenê komek cînavkên kesane heye.

Cînavkên kesane yên her sê zaravayên kurdî

Kurmancî

Xwerû

Ez, tu, ew, em, hûn, ew

Tewandî

Min, te wê/ wî, me, we, wan

Kirmancî

Xwerû

Ez, ti (to, tû), a(ya), o (ew, aw, we, wî ay yo, yû, wo), ma, şima, ê (yê, yî)

Tewandî

min, to (tu), ey (yi, yê, hî, jey ê, êy, êyî, ay), aye (yê, ya, yay, aya, aya, ay, a, ja), ma (man), şima (şiman), ïnan (yîn, yînî, yîne, jînî, ïna, îne, înê, înû, aynan, eyna, ayno)

Kurmanciya jêrîn

Cînavkên kesane

(e) min, (e) to, ew, ême, êwe, ewan

Cînavkên kurtkirî

/-m/, /-t/, /-î/, /-man/, /-tan/, /-yan/

Di kurmanciya jêrîn de cihê cînavkên koma duyemîn cînavkên kurtkirî digirin. Qanatê Kurdo di pirtûka xwe ya bi navê “Gramera Zmanê Kurdi” de van mînakan li ser vê mijarê dide.

Kirdim (min kir)

Kirdit (te kir)

Kirdî (wî/wê kir)

Kirdman (me kir)

Kirdtan (we kir)

Kirdyan (wan kir)

Her wekî ji mînakan jî diyar e, ev cînavkêñ kurtkirî têkildarî cînavkêñ kesane yên soranî ne. Cînavkêñ bo kesên yekjimar “-m, -t, -î” têkildarî cînavkêñ kesane “min, to, ew” in.

Niha em dikarin derbasî cînavkêñ pêrebestî û her sê zaravayan bibin.

Kurmancî

Ez im, tu yi, ew e, em in, hûn in, ew in

Kirmançkî

Ez a (ûne), tu yi (nêr) /tu ya (mê), o yo , a ya, ma yê (yîme), şima yê, ê yê

Kurmanciya jêrîn (soranî)

Min kurd im, to kurd i, ew kurd e, ême kurd in, êwe kurd in, ewan kurd in

Wekî xuyaye cînavkêñ pêrebestî yên kurmanciya jorîn û kurmanciya jêrîn nêzî hev in, lê kirmançkî di vî warî de ji her du zaravayêñ din cuda dibe. Berî ku em li ser vê mijarê rawestin, divê pêşî em bala xwe bidin têkiliya di navbera cînavkêñ kesane û cînavkêñ pêrebestî. Di kurmanciya jorîn û kurmanciya jêrîn de cînavka pêrebestî ya kesê yekemîn a yekjimar têkildarî cînavka *min* e. Tiştê balkêş ev e ku di kurmancî de bi cînavkêñ xwerû re ango koma yekemîn re lihevkirî ne. Dema kirde ji koma yekemîn be, cînavka pêrebestî li gorî kirde, dema bireser be jî li gorî bireser saz dibe.

Bo nimûne:

Ez te dibîn-im

Te ez dît-im.

Her wekî diyar e, di her du hevokan de jî cînavkêñ pêrebestî li gorî cînavka “ez” hatiye. Lê ev cînavk di hevoka yekemîn de kirde, di ya duyemîn de bireser e. Di zaravayê kurmanciya jêrîn de cînavka “ez” tuneye û di cihê wê de “min” tê bikaranîn. Di hin hevokan de “emin” jî tê gotin. Di kirmançkî de cînavka pêrebestî bo kesê “a” yekemîn ê yekjimar têkildarî cînavkê “ez” hatiye. Dema em bala xwe bidin, dirûvê cînavka “ez” a di zimanê

kevn de yên ku wekî pêşrewêñ zimanê kurdi tê binavkirin, dê têkiliya wan zelal bibe.

Parthî	az
Farisiya kevn	adem
Avestayî	azem
Sanskritî	ahem

Tê dîtin ku kirmançkî li ser şopa parhtî çûye, lê kurmanciya jorîn û kurmanciya jêrîn li dûv zimanêñ din çûne. Di devoka Dêrsimê de di cihê “a”yê de “ûne” tê bikaranîn. Li vê herêmê di cihê “a”yê de “û” tê xebitandin, lewre jî ne dijwar e ku mirov bibêje, ev “ane” ye. Heta ihtîmal heye ku ew “/n/ jî di rastiya xwe de /m/ be. Lewre van her du dengan di gelek peyvan de cihê xwe dane hev û din.

Cînavkêñ kesane yên di avestayî de, dikarin têkiliya di navbera cînavkêñ pêrebestî û cînavkêñ kesane de agahiyeke bidin mirov.

Avestayî

Azam, tava/teva, aësa, ahmekem, xşimakem, yuş (di kurdi nîn e), avahya

Di têkiliya di navbera cînavkêñ kurdi û avesteyî de gelekî berbiçav e. Di taybetî zaravayê kirmançkî zêdetir nêzî avestayî ye. Bo nimûne têkiliya di navbera “xşimakem” û “şima” de balkêş e. Her wiha cînavka kesê duyemîn ê yekjimar dirûvê xwe yê bingehîn parastiye.

Têkiliyeke berbiçav di navbera cînavkêñ kesên sêyemîn ên yekjimar (nêr û mê) ên kirmançkî û cînavkêñ pêrebestî yên bi vî zaravayî de heye. Cînavka “o” ji bo heyberên nêr, “a” ji bo heyberê mê tê xebitandin. Ev cînavka “o” bi qertafê baneşanê /-o/ yên kurmanciya jorîn û kirmançkî re heye. Dema mirov gazî kesekî dike, mirov dibêje “lo” yan jî *hevalo, birayo, keko, xalo, apo* û hwd. “o” wekî qertafa nêritiyê xwe dide der. Dîsa cînavka “a” têkildarî vegetandeka binavkirî ya kurmancî û kirmançî ya bo navêñ mê ye.

Hevala min hat.

Embaza mi rew yena.

Di dîsa di kurmancî de cînavka qersene ya ji bo heyberên mê têkildarî heman cînavkê ye.

Pirtûka min.

A min

Di her sê zaravayê kurdî de cînavkên pirjimar bi alîkariya qertafa “an” hatine bidestxistin. Bo nimûne kesê sêyemîn a koma tewandî “(e)wan, ewan û inan” xuyaye ku di kurmanciya jorîn û jêrîn de cînavka koma yekemîn “ew” qertafa tewangê ya pirjimariyê /-an/ girtiye. Xuyaye ku cînavka kirmancî jî li gorî heman rîpîvanê pêk hatiye. Lê divê mirov hinekî lê hûr bibe, da ku mirov karibe di vê yekê bigihêje. Her wekî li jor jî hate daxuyandin cînavka xwerû yê pirjimar bo kesê sêyemîn “ê, yê, yi” têr bikaranîn. Lê heke mirov li gorî vê rîpîvanê ji hev derxe, dê diyar cînavka xwerû yê kesê sêyemîn yê pirjimar “in, ên” derkeve pêşberî mirov. Dîsa li jor hatibû diyarkirin ku cînavka pêrebestî bo kesê pirjimar di kirmancî de “ê” ye. Lê dema em bala xwe didin zaravayê din cînavkên pêrebestî bo kesê pirjimar bi /n/yê diqedin. Bi boçûna me her wekî di gelek mînak din de jî xwe dide der /n/ vê dawiya van cînavkan bi demê re ji holê rabûye. Lê heke ev ne li vi zaravayê kurdî bê vegerandin dê di warê nêzîkbûna zaravayê kurdî de gaveke baş bê avêtin.

Mînakek vê yekê dikarin vê rastiyê baştir binimînin:

Ew kurd in.

Ewan kurd in.

Ê kurd ên.

Her wiha heke cînavkên kesê yekemîn û yê duyemîn “ma û şima” di rewşa tewandî de wekî “man û şiman” bê bikaranîn dê baştir bibe, lewre bi vi awayî cînavkên xwerû yê tewandî ji hev cuda dabin. Bi vê yekê re dibe ku vejetandeka binavkirî ya pirjimar /-en/ bi cînavkê kesê sêyemîn ê pirjimar /-ê/ re têkildar e.

Di cînavkên pêrebestî yê kirmancî de aliye kî balkêş jî bandora zayendê ya li ser wan e. Di kurmancî de bi tenê kesê sêyemîn ê yekjimar de (wî/wê) zayend heye. Lê di kirmancî de cînavkên kesê sêyemîn yê

xwerû jî li gorî zayendê ji hev cuda dabin. Her wiha di cînavkên pêrebestî yê kesê duyemîn de jî ev cudatî heye. Ev jî têkiliya cînavkên kesane û cînavkên pêrebestî ji holê radike. Cînavka pêrebestî yê kesê yekemîn ê pirjimar li hin herêman bi cînavka “ma” re têkildar dibe û rengî /-îme/ digire.

Cînavkên kesê sêyemîn ê yekjimar ê her sê zaravayan jî têkildarî hev in. Di kurmanciya jêrîn de bi tenê ew heye di cihê awayê tewandî de jî cînavkê kurtkirî /-î/ tê bikaranîn. Dema peyv bi dengdêrê biqede ew /-î/ dibe ye. Di kurmancî de jî awayê xwerû yê vê cînavkê “ew” dema cihê navdêreke tewandî digire, qertafêr tewangê /-î/ û /-ê/ digire û dibe “ewî/ewê” di demê re ew /e-/’ya serî ketiye bi tenê “wî/wê” li holê maye. Cînavka kirmancî li gorî zayendê diguhere û bo tiştîn nêr “o” û bo tiştîn mî “a” tê bikaranîn. Li gorî devokan hinek deng lê zêde bibin jî di bingeha wan de tu guharîn çenabe. Têkiliya di navbera wan û cînavkên zaravayê din de jî diyar e. Nîvdengdêra /w/ hatiye dawiya cînavkên kurmanciya jêrîn û kurmanciya jorîn, di hin devokên kirmancî de jî nîvdengdêrên “w, h, y” tê ber û pişt dengê /o/ û /a/. Ev jî nîşan dide ku bingeha cînavkên kesê sêyemîn di her sê zaravayê kurdî yek e.

Di encamê de mirov dikare bibêje ku heke li têkiliya di navbera zaravayê kurdî û bingeha wan baş bê rawestandin û li binyata wan bê kolîn dê gelek aliyê zimanê kurdî yêni di tariyê ronî bibin û dê di warê nêzîhevkirina zaravayan de gavêr baş bê avêtin. Li vir em hinekî li ser cînavkên kesane û pêrebestî rawestiyan. Lewre li ser cînavkên pêrebestî dîtineke hevbeş nîn e, me xwest dîtin û ramanê xwe li ser vê mijarê diyar bikin. Zelalkirina têkiliya di navbera cînavkên kesane û pêrebestî yêni zaravayê kurdî de gelekî pêwîst e. Ji ber ku bi taybetî cudatiyeke bingehîn di nava zaraveyê kirmancî û kurmancî de ev cînavk in. Ronîbûna vê mijarê, kilita berbihevanîna zaravayan nîşanî mirov didin.

ÇEND ŞİRETÊN

SEÎDÊ KURDÎ

SEÎDÊ KURDÎ

(Amadekar û werger: Kerem Soylu)

Ey gelê kurd, di yekîtiyê de hêz û jiyan, di biratiyê de xweşî û qencî, di dewletê de selametî heye. Benê yekîtiyê, zencîra ji hev hezkirinê zexm bigirin da ku we ji belayê biparêze. Rind guhê xwe bidinê ezzê ji we re tiştekî bibêjim. Hûn bizanin ku sê heb cewherên me hene, paras-tina wan ji me dixwazin. Ya yekem, İslamiyet e ku berdêla wê bi hezaran xwîna şehîdan e. Ya duyem, mirovatî ye. Divê ku em li ber çavêن gel



xebatek zanistî, egitî û mirovatiya xwe bi hemû cîhanê bîdin nîşan. Ya sêyemîn, gelper-weriya me ye ku mezinahî daye me. Yê di beriya me de bi qencî û rûmetên xwe dijîn. Yê ku bi kêrî xwe têن, neteweşa xwe diparêzin, ev yek ruhê wan di gora wan de şad dike. Ji xeynî van, tiştê ku me têk dibe, sê heb neyar in. 1) Xizanî ye, cil hezar barkêşen (hemal) Stenbolê delîla vê yekê ye. 2) Nezanî û bê perwerdeyî ye. Bi hezaran ji me nikarin rojnameyan bixwînin Ev jî delîla vê ye. 3) Neyartî û dubendiya di navbera me de ye. Ev jî hêza me kêm dike, me dixe bin dest, lewre heku-meta bê însaf zulmê li me dike. Heke we ev gotin seh kiribin, bizanibin ku çareya xilasiya me ev e; divê ku em şûrê sê heb almastan bidin destê xwe. Lewra heta ku em wan hersê cewherên xwe bi dest xwe

nexin, em nikarin van hersê neyaran ji ser xwe rakin.

1- Edalet, zanîn û xwendin.

2- Yekîti û ji hev hezkirina neteweyî.

3- Xwe bi xwe kirina karê xwe, baweriya bi hêza xwe û bawerî pê neanîna bi belengazan. Şireta dawîn ev e:

Xwendin! xwendin! xwendin!..., destê hev girtin! destê hev girtin! destê hev girtin!.

Gotina Dawîn

Heke ku ji zarokên netewe-ya xwe re jî li vê derê çend gotinan nekim, li gor dîfina min, mijar kêm dimîne.

Ey kurdên ku di dema Asûrî û Kiyaniyêن Cihangir de xwedî par û xwedî leşkerên e-gît û kurdên şêr bûn! 500 sal e ku hûn razane. Bes e êdî şiyar bin, sibe ye. Heke hûn şiyar nebin wehşet, xeşîmî û xewarî wê di çolistana bê agahîyê de êrîş bînine ser we.

Hekmeta Xwedê ye ku jê re maşîna gardûnê ya bi rêk û pêk tê gotin. Ew a ku wek xeta têlê dirêjî ba temamî ger-dûnê û wan qanûnên wê yên bi çiq û nûranî bûye. Tiliya qederê bilind dike û ji we re ferman dike.

Mêranî û fikra xwe ya nete-weyî û hêza xwe ya ku wek dilopên avê ji hev qetiyaye û

winda bûye, dibin fikr û bira-
tiya İslamiyetê de bikin yek.
Bi hev ve bizeliqînin û wek
molekulên, bi cazîbeyeke
dilkêsiya tevahî, neteweyî gir-
seyek kurdan a herî mezin
çêkin. Ku wek kureyê ku li
dora xwe bizivire û di nav ro-
ja İslamiyetê de wek stérkek
herî ges ronahî bide. Divê ku
hûn vê balkêşî û yekîtiya te-
vahî û neteweyî biparêzin.

Ew sultanê azadiyê ku li
ser serê çiyayê Sîpan û Agi-
riyê pir bilind rabûye piyan,
ketina bin destan û zilm û zo-
ra li ser mirovan qedexe kiriye
û xwe sipartîye qanûna xwe-
da, bi dengek bilind bang di-
ke. Dibê ku neteweyek wek
we, yê ku di newalêne pêva-
joyêن bîhûrî de bê agahî çav-
girtî û ji hev û din belav bûyî
maye.

Ji bo li hember derketina
nezanî û xizaniyê û ji bo
pêşveçûna fen û pîse û ji bo
destavêtina çekê, fermaña êri-
şa we dike; pêş kevin! Pêş ke-
vin!

Hem jî di bin wan perdeyên
rastîn de, perdeyên zordestî û
tunekirinê ji holê radibin. Bi
vê aweyê jî tebeqeya ku neza-
nî û bê agahî ye li ser milan
hinek sivik dibe û xeberbêjê
herî rast rabûye ser piyan ji
we re, di her aliyê de agahda-
riyê dide ku ew çandinîya
destê qederê ye di derbarê ras-
tiya geltiya we de ku qederê
derdixe pratîkê û ew exlaq û
xûyên ku rastiya neteweya we
tê de veşartiye, bi ava jiyanâ
perwerdehiyê bidin avdan.
Heke hûn wilo nekin ew

dar wê hişk be an jî ewê win-
da be.

Him jî bavê şarezahîyê û
damezrînerê serkeftinê ku
ustadê pêwîstiyê ye. Sîla xwe
bilind kiriye, li we hikim dike
ku an hûnê jiyan û azadiya
xwe di vê çolistanâ hovîtiyê
de bidin winda kirin, an jî di
qada şarezayiyê de fen, pîse,
li balon û şîmendiferê siwar
bin. Di pêşerojê de wan
tewrên xwe yên belav bavêjin
û bi lez û bez birevin bi ba
kabeya serkeftinê da.

Him jî netewîtiya ku ji ne-
walên demên derbasbûyî û ji
çolistanenê niha, ji çiyayên
pêşerojê ye. Yê wek Rus-

temê Zal û Selahedînê Eyûbî
kurdên dahî û leheng di dî-
rokê de rûniştine ew wek mal-
batekê ne. Ew fikra we ya ne-
tewî ku fêkiyê jiyanâ herî
bilnd e û her kesekî bi şeref û
heyseta wî dide rûmetdarki-
rin, ji we re bi fermanek vebir
ferman dike. Heta ku her yek
ji we bibe neynika jiyanâ temamî
gel û parêzvanê temamî gel,
xwedîyê temamî berje-
wendiyêñ gel û temamî gel di
xwe de bibînin, bibin yek. Wê
demê wek niha hûn ne bi tenê
ne, hûn wek neteweyek mezin
in. Dema ku fikr mezin bibe
hêz jî mezin dibe û bi coşa ne-
teweyî exlaq jî tê seranseriye,
bi her awayî serkeftin çêdibe.

Him jî ew meşrûtiyeta ku
sebebê bextewariya gelan e û
hukumkirina neteweya dide
pêş, bi xwe re maşîna jiyanê ya
ku iradeyabicûk a di
azadiyê de ji zorbetî û
dagirkerryê dide
rizgarkirin. Bi
şêwirandina şer'î tê tê
havên kirin. Ev civaka
meşrûtiyeta meşrû
bangî ber bi azmûnê ve
dike ku hûn gîhiştin ba
salê kemilandinê û
wasiteyên mirovahiyê
dixwazin ku
hewcedariyên we
bibînin.

Belê; di çolistanenê derbas-
bûyî de tiştên ku bûne hinceta
kêşmekêşî û gengeşıya di

navber we de, axatî û xwidbînî, ezîti ye. Di vê demê de wêwergere bal koşka azadî û xweşiyê û afirandina fikra şarezahî û serxwebûnê. Heta ez dikarim bibêjim ku li gor medreseyê hin neteweyêndin ê bê deng, medreseyê we yêni bi geremol işareteta mecli-sa mebusan ya zanyarî nîşan dide.

Bi xwendina fatiheyê li pey ìmam, gineginêne we yêni se-mawî û ruhanî bi mezheb, bi medrese û bi neteweyî di sira we ya meşrûtiyetê ya ku dêwere amade kirin de, nîşana qederê heye.

Tu tişt ji bo însan herwe çenabe, lê her tişt li gor keda wî tê pê.

Di wê ayeta pîroz de ferмана teşwîqa kesayetî û neteweyî heye.

Cesaret û namûsa neteweyî ya ku parêzvan û damezrî-nerê her serkeftinê ye weha ferمانа dike: Çawa ku heta ni-ha di navbera dil û mêtî de we rîyek vekir û we dil û mêtî ki-re yek, we zanîna xwe jî ji xetên cewher yên şûr girt. We cesareteke nedîti nîşan da. Ni-ha jî ji dil ber bi ramanê ve rîyeke zirav vekin. Hêzê li hawara mêtî ji bo piştgiriya ramanan bişînin. Ji bo ku di qada şarezzayîya mejîyê bi cesaret de namûsa neteweyî paymal nebe, divê ku şûrê we ji cewherê fen û pîşeyê bê çêkirin.

Hem jî zimanê maderî neynika ronahiya netewî ye. Ew

dara wêjeyê ya bi fêkî ye û ava jiyanê ye, cetwelên zanatiyê rûmet û serkeftina we ye. Raste rast di hember wijdana her kesî de rê vekiriye. Ji sedem kemasiyên we, tê de gelek tevlîhevî çêbûne. Di çiqên zimanê we de gelek kobûn çêbûye.

Dara zimanê we yê wek dara tubayê bi secere û çiqên xwe ve dibûya ku xwe bida xwiyan. Lê, ji sedem ku wek darek hişk bê fêkî mayî, perîşan û ji zimanê şarezahiyê "ku wêje ye" paş de mayî ye, zi-

kek li ser xwedî derketina zi-manê neteweyî nîşan bidim: Xelil Xiyaliyê Motkan çawa li temamê şaxên neteweyî xwedî derketiye wisa di qada şaxa zimên de jî parastin û zexîre çêkiriye. Zimanê me yê bin-gehîn "ku elîf ba, û giramer e" anîye holê. Heta ez dikarim bibêjim ku di qirna xwedî derketinê, xîret û fedakariyê de yekîtiya xwe ya menewî daye çêkirin. Bi rastî jî madenêne Kurdistanê dema ku rastî cewherek weha bê, pêse-roja me wê bi umûda gelek

Hem jî zimanê maderî neynika ronahiya netewî ye. Ew
dara wêjeyê ya bi fêkî ye û ava jiyanê ye, cetwelên zanatiyê rûmet û serkeftina we ye. Raste rast di hember wijdana her kesî de rê vekiriye. Ji sedem kemasiyên we, tê de gelek tevlîhevî çêbûne. Di çiqên zimanê we de gelek kobûn çêbûye.

manê we bi xecîlî, bi xwedî derketina neteweyî we didegilî û gazin kirin. Di jiyanâ mirovan de sikeya qederê ziman e. Sûretê mirovatiyê jî di rûpelê zimên de nexşê daxû-yaniyê dide wêne kirin. Zi-manê dayikê jî ji ber ku xwe-zayî ye bê gazîkirina peyvan tê hişê mirov. Dan û sitandin, ji ber ku bi tenê ne di gotinê de dimîne, hişmendî duserî nabe. Û ew zanîna ku dikeve zimên wek nexşê li ser kevir tim dimîne û bi wê xemla zimanê neteweyî ci were dîtin jî mirov pê re li hev hatî dimîne.

Niha jî ezê ji we re mîna-

kesen mîna wî, bi gelek cew-heran bêne ronîkirin. Wî zatî nimûneyek ji lê xwedîderketina neteweyî daye xûyakirin. Ew layiq e ku meriv xwe bispêriyê. Wî di derbarê zimanê me yê neteweyî de ku pêwîstiya wî bi têgîhîştinê heye xîmek avêteye. Ji temamî lê xwedî derketina neteweyî re wesiyet û şîreta min ewe ku herkes li ser rîçika wî here û li ser xîmê wî avahîyan çêke.

Bedîuzeman Seîdê Kurdi
Çavkanî: Rojnameya Kurd Te-
'awun û Terakî,
Hejmar: 122yê Teşrîna
duwem 1908

ÇIYA MAZÎ

Carinan em dibêjin zimanê kurdî pir dewlemend e, pir kûr û bi reh e. Lê hê baş nehatiye zimên, ka dewlemendiya kurdî ji ber çi ye û çawa ye. Ji ber çi fireh e, ev tiştê ku zimên xurt dike çi ye? Ez di vê nivîsara xwe de, dixwazim hinekî rave bikim û nîqaşekê li ser vê mijarê vekim. Divê zanistên rêziman jî li ser vê mijarê ramanê xwe bibêjin û binivîsînin.

Gelo tenê bi hebûna peyvê an forma peyvan e ku ziman dikeve pergalê û xurt dibe. Helbet pîrbûna peyvan, *devokan* jî bandorê çedike û ziman dewlemend dike. Lê ya herî bi bandor, ziman dewlemend dike û bi hev û din ve

BIWÊJ, GOTINÊN PÊSIYAN Û GOTIN

girêdide, xwes dike û dixe pergaleke bingehîn, biwêj û gotinênu ku di ziman de cih digirin in. Dema biwêj, gotin û peyvên pêsiyan tune bin, çiqas peyv hebin jî, bi sed hezarân peyv hebin jî dîsa ne bes e. Wekî genimê di zeviyê de be û heta neyê çinîn, neçe êş û nebe hevîr sûdeya wî tune ye. Peyvên di ziman de jî, bi biwêjan, têgih, peyvên pêsiyan û gotinan dibin hevîr û ew hevîr dibe ziman. Wê demê netewe û gel jê sûdê werdigire, têkili û dîaloga mirovan bi hev û dû re çedike. Têkiliya ziman, yekîtiya ziman dibe yekîti û birêveçûna jiyana mirovan.

Em dibêjin peyv, biwêj û peyvên pêsiyan. Gelo ka ev çi ne? Mirov ji çi re dibêje peyv an dibêje biwêj? Em dê hinekî li ser van bisekinin.

PEYV

Peyv: Di tirkî de dibêjin "sözcük", di erekî de dibêjin kelam. Wateya wan: Ji kiteyan pêk tên û bi wate û peywir in.

Wateya wan a rastîn: Wateya wan a rastîn, a ku di serî de di hişê mirovan de cih girtiye.

Wateya wan a bingehîn: Wateya ewîlî ji bo peywîrekê derketiye.

Wateya wan a duyemîn: Bi girêdana wateya bingehîn re û bi hinek şibandin û têkiliyan derketina wateyeke din e. Ev peyv bi taybetî di biwêjan de tên bikaranîn.

Hin peyv jî bi temamî ji wateya bingehîn û wateya rastîn cihê ne ev jî wateya wan a mecaz e. Wekî wateya duyemîn.

Têgih: Devokên ku bi taybetî di pişekariyê û di zanistiyê de têne bikaranîn (terîm) mînak: Enflasyon, bihayî, erzanî, aborî, tip nexweşxane û hwd.

BIWÊJ

Hevokên bi kêmâyî ji du peyvan pêk tê û bi piranî jî ji wateya bingehîn cihê û di nava gel de qalib in.

Taybetiyêwan

- 1- Bi kêmâyî ji du peyvan pêk tên.
- 2- Bi piranî wateya wan a duyemîn e (mecaz in)
- 3- Di nava zimanê gel de bûne qalib.
- 4- Ne darazî ne, nependîne.

5- Netewî ne, malê gel in.

Mînak: Guh giran, Hur filitî, Bin çav, Guh dan, Pişt hebûn, Çav lê gerandin, Bin dest, Ser dest, Dest sivik, Û hwd.

Dema mirov dibêje guh giran, wateya bingehîn nayê bîra mirov. Wateya bingehîn ku "guh wî bi weznê giran e" lê wateya biwêjî an wateya duyemîn wekî "ker e" tê fêmkirin.

Dîsa ku mirov dibêje "guh bidê" ev jî tê wateya "guhdarî bike" Her wekî em dibêjin "pê sivik, di wateya ku zû bi rêvê dihere, dimeşe tê bikaranîn.

Biwêjîn dirêj ku ji gelek peyvan pêk tên jî hene. Wekî "ma siwara daye ser pişa te" (tu çîma ecele dikî) û wekî "agir ji dev dihere"ango (pir nexweş dipeyîve an rexneyên tûj dike)

Taybetiyek wan jî ew e ku netewî û gelêri ne. Ji ber ku gelêri ne û her biwêjîn ziman xwedîyê taybetiyekê ne, wergera wan a li zimanekî din pir zor e. Ji xwe dema yek bi yek tên wergerandin wateya xwe ya di zimanê

netewî de winda dikin.

Mirov dikare bi çend beşan ji hev û din veqetîne.

1- Nifir: (*Bedûa*)

Mînak: Mala te xera bibe (malixerab). Mala te mîrat bibe (malmîrat). Kezeba te reş be. Tu hilê, tu nemîne û hwd.

2- Fort: (*gef*)

Ez dê bi bêvila te bigirim. Ez kewê ribat im. Ez beranê çar gurçik im. Gamêşê mîran. Ez bavê ferhat im. Tu hê ferxik î û hwd.

3- Qerf (*henek*)

Wekî mirov henekê xwe bi hinekan bike. Mînak: Tu yê nava şekalan î. Wekî petêxê xerabûyî ye. Li şenîya mezin nebûye. Çeleka bi ga ye. Bi mirîşkan re dihere lîs û hwd.

4- Pesn:

Mînak çiqasî li ser erdê ye, ewqasî di bin erdê de ye. Çavên wê wekî yê xezalan e. (çavxezal e) Kevirê qazibir e. Û hwd.

5- Şibandin:

Mînak wekî xilt e, wekî hudhukan e, wekî kuçikê ser kormê ye. Teyrê baz e. Keleka li ser avê ye. Wekî kund e, wekî hêlîna çigçigokê ye.

6- Yê ser miriyan (zêmar) por kurê, kezî kurê, lê rebenê, lê qirikê. Dil bi kulo, lê gûlî bîrê, lê dêranê. Ruh tê nema, ruh pê hat û wd.

7- Yê din:

Pî ber hatin. Dest vala. Dest sivik. Hiş berdayî (aqil berdayî). Dil ketî. Barê wî giran e. Serê wî bûye wekî tara bêjingê. Dev avêtin. Sond xwarin û wd.

PEYVÊN PÊŞIYAN

Hevokên bi darazî û bi pendî li nava gel ji bo vegotin û rexneya tiştekî bi kurtî ye.

Taybetiyêن wan

1- Darazî û hukmî ne.

2- Hevokên bi qalib in.

3- Malê gel in, nivîskarê wan ne diyar e.

4- Bi hindikî du wateyan derdixin.

5- Yê di wateya rastîn de jî hene.

6- Pendî ne ji bo mirovan dibin pend û ronahî û şîret.

7- Netewî ne.

Pendîbûna wan:

Carinan bav ji lawê re dibêje "lawo; golikê malê ji gayê malê natirse" ev tê wateya ku mirov

ji lêzimên xwe fedî nake an bi hêsanî mirov dikare yê nêzîkî xwe rexne bike. Di vê derê de bav li lawê xwe şîretê dike û dibêje, "divê tu li yê herî nêzîkî xwe miqate bî".

Mînakek din jî: "ga dikeve erdê, kér pir dîbin" Ev tê wateya ku yê ketî herkes qerfê xwe pêdike. Bav ji lawê xwe re dibêje "divê mirov nekeve, ku mirov ket an mirov qels bibe, hêza mirov nemîne wê gelek mirov êrişî ser mirov bikin û her wekî ji van gelek wateyên din jî derdikevin.

"Bi gur re dikuje, bi xwedî re şînê dike" ev tê wateya an rexneya ji bo mirovên durû.

Peyvîn pêşîyan di nava gel de bi demê re bûne qalib û bi kafiye hatine zimên. Wekî "jin çûn hewara mîr ketin kewara" "şêr şêr e, ci jin e ci mîr e", "menêr li mirûz, binêr li gurûz". "tiştê bi nêvî, jê neke hêvî", "çavê li deriya xwelî li seriya" "bira bira ye, hesab li derê ha ye", "bûk li hespê ye, kes nizane rizqê kê ye" û wd.

Peyvîn pêşîyan hukum dikan, darazî ne: Mirovan didarizîne. Wekî "xeta xwar ji gayê pîr de ye", Di vê peyvê de mirovên serok, rêveber têne nirxandin. Dîsa wekî "nok tê li kokê", Di vê derê de jî pêşdarazî heye û wekî bavê zarok xerab be, ew jî wê xerab be. An bav baş be dê ew jî baş be. Dîsa wekî "Havînê got xişt û mişt, payîz hat li ser rûnişt, zivistanê got ma te ci ji min re hişt"

Ü mînakine din: "Caw çawê we ye, cawbir cawbirê we ye", "mal mala te ye, lê belê bi nava fîraqan de ne re." "kerê ku barê te ne lê, najo" "tu pê li cihê şil nekî, tu naçerixî" "kesê xêrê nayê dêrê" "rez berê ne tu rez bû, terezê jî lêxist", "navê gur derketiye bi notî" û hwd.

CUDAHIYA BIWÊJ Û PEYVÊN PÊŞIYAN

Pêşî mirov dikare bibêje biwêj ketine nava zimên û wekî haya mirovan jê tune be û peyvan bi wateyeke din bi kar tînin. Lê peyvîn pêşîyan, ku dema têne gotin her kes lê hay dibe ku ew ji bo bûyerekê an rexneyekê hat gotin û diyar e.

Cudahiya wan

Peyvîn pêşîyan

1- Hukmî û darazî ne.

2- Dudu û hê pir wateyan derdixin

3- Pendî ne (şîret in)

4- Nivîskarê wan ne diyar e.

5- Qâideya wan a gelempêri heye.

BIWÊJ

- 1- Ne hukmî û ne darazî ne.
- 2- Wateyekê vedibêjin.
- 3- Nependî ne (şîret in).
- 4- Qaîdeya wan a gelempêrî tune ye.

GOTIN

Hin biwêj hene ku mirov lê dinhêre nêzîkî peyvên pêşîyan in, lê ne li gori taybetiyêن peyvên pêşîyan in. Li gor taybetiyêن biwêjan jî ne biwêj in. Di navbera herduyan de dimînin. Di tirkî de ji van re "özdeyiş" tê gotin. Em dikarin ji van re bi kurdî bibêjin "Gotin"

Carina di nav guftûgoyan de dibêjin: "gotinek heye, wiha ye" wekî: "Hişê sivik barê giran" "Dizan ji dizan dizî erd û ezman pê hesiyan", "berûyê ji qêlik bazda, got, dev çendî mezin e" "qey roviya xwe xwariye" "silavan li Hesenê Mûsa ke" "Hesil di müsîlê re derbas bû" "Hesiko ji bajêr xeyîdî, "Yêñ şer dikin azad dibin, yê azad dibin xweşik dibin", "Heta we hilatî lêxist me şikeva kir û wd.

Evêñ li jor ne peyvên pêşîyan in bi baweriya min. Lê ne biwêj in jî. Ji ber ku hukum heye, hem pendî ne û hem darazîne û hem wateyekê tenê vedibêjin, hin ji wan û nivîskarê wan jî diyar e. Mirov ji van re bibêje "Gotin" bes e. Ji xwe ew jî malê gel an malê kesan in. Ev gotin pir in. Li gor demê û li gor kar û têkiliya mirovan xuya dibin, carinan hin ji van gotinan, tenê di herêmekê de bi wate ne. Heta bi tenê di gundekî de bi wate ne. Lê dema mirov wê peyvê li derê wî gundî bibêje kes tu tiştî jê fêm nake. Wekî "ma şemê Çeqçeqê ye çi ye" û wekî "ma ƙaniya Mêmelaskê ye", "mineta te li serê Guhera Dîna be û wd.

ÇÎROK-ÇÎÇÎROK, DESTAN-EFSANE

Di weşanêñ kurdî de, ev demeke dirêj e ku çîrok û zargotin têne weşandin. Ev, bi taybetî di weşanêñ bakurê kurdistanê de bi navê wekî çîrok, destan, efsane, zargotin in. Lê bi baweriya min tevliheviyek di binavkirina wan de heye. Mînak: Dema çîrokeke Helîm Yusiv jî tê weşandin jê re çîrok tê gotin û dema çîçîrokê gelêrî wekî "rovî û gur" jî tê weşandin ji wan re çîrok tê gotin. Dîsa hin efsane û destan jî bi navê "çîrok" têne weşandin. Lê belê di lîteratura wêjaya dinê de ev giş ji hev û din cûda têñ

binavkirin. Em dê hinekî li ser van bisekinin û bikin mijara nîqaşê.

Pêşî em dê wateyêñ wan vebêjin û ji hev cihê bikin:

ÇÎROK: Li ser bûyeren di jiyana rastîn de qewimîne an li ser jiyana rastîn hatine xeyalkirin. (Bi erebî "ehkîk" tê gotin.)

Taybetiyêñ wan

- 1- Malê kesan in û nivîskarê wan diyar e.
- 2- Li gorî jiyana rastîn an ristina xeyala li ser jiyana rastîn in.
- 3- Cih û demêñ buyera wan diyar e.
- 4- Kesêñ di nava çîrokê de ne, rast in an teqlîta yêñ ku dijîn in.

ÇÎÇÎROK: Bûyeren ji xeyalêñ gel derketine û ev bûyer di jiyana rastîn de nayê dîtin. Bi kesayetiyyêñ nedîfî û bûyeren nedîfî neqîskirî ne. (Bi tirkî "masal" tê gotin), (Bi erebî 'mesel' tê gotin).

Taybatiyêñ wan

- 1- Malê gel in.
- 2- Nivîskarê wan ne diyar e.
- 3- Ne li gorî jiyana rastîn in.
- 4- Kesayetiyyêñ tê de cih digirin ne rast in, an dûrî rastiyê ne.
- 5- Cih û demêñ wan ne diyar in an cih û warêñ xeyalî ne.

DESTAN: Bûyeren di serê gel an qehremanêñ gel re derbas bûne û bûyeren ku pir bandor li ser jiyana gel çêkirine ne.

Taybetiyêñ wan

- 1- Bi piranî nivîskarê wan ne diyar in.
- 2- Cih û demêñ wan ne diyar in.
- 3- Malê gel in.
- 4- Bûyeren mezin yêñ ku bandor li ser jiyana gel çêkirine ne.

EFSANE: Çîçîrokêñ ku li ser jiyana gel û xwezayê bandor çêkirine û bi demê re ji jiyana rastîn dûr ketine ne.

Taybetiyêñ wan

- 1- Çîçîrokêñ mezin û bi bandor in.
- 2- Nivîskarê wan ne diyar e û malê gel in.
- 3- Ji jiyana rastîn bi dûrkette û bi xeyalêñ mirovan hatine neqîşandîn.
- 4- Kesayetiyyêñ wan ne li gor jiyana rojane ne.

MÎT: Dî dîroka mirovahiyê de, çîrokên ku baweriya mirovan, çîroka çêbûna mirovan ve dibêjin, têkiliya wan û xwezayê û serpêhatiyêن wan ên qehremanî vedibêjin. Ji van re mît tê gotin, bi giştî jî mítolojî tê gotin. Efsane jî besek ji mítolojiyê ye angô mít e.

Di dû naskirina wan û taybetiyêن wan em dikarin hinekî din berfireh li ser danasîna wan bisekinin. Wekî me li jor jî got di weşanan de navê çîrok û çîçîrokan pir tevlihev dibin. Mirov dikare bibêje çîçîrok dikeve nava zargotinê. Ji vê yekê jî ji çîrokan cihê dibe. Heke mirov bibêje çîrok "öyüü" jî zargotin e, divê mirov ji romanê jî re bibêje zargotin. Çîrok ji ber ku malê kesan in, li gor raman û xeyalên wî hatine nivîsandin. Lê ji ber ku çîçîrok "masal" malê gel in di her demekê de hin pevv an hevok lê zêde bûne û di her demê de mirovan ji xwe re tiştek bi ser ve kiriye û bi aliyekî de kişandîye.

Min di kovara **ZEND** ê hejmara çaran de nivîsek darêjtibû. Di vê nivîsê de bi taybetî li ser çîrokan ez sekînîbûm. Lê bawer dikim ku ew xelet hatiye fêm kirin. Ji ber ku di sergotara kovarê de wekî zargotin hatîbû danasîn. Ew mijar li ser çîrokan bû.

Çîrokên ku heta niha bi kurdî hatine nivîsandin, ku mirov bi nav û beş bike wiha ye: Mînak, çîrokên Helîm Yusiv ne çîçîrok in bi tenê çîrok in. Her çiqas çîroka wî ya bi navê "Komara Dînan Şermola" wekî çîçîrok e jî, ji ber ku li gor roja me û bûyerên diqewimin hatine ristin, ew jî çîrok e.

Wekî din jî yên Hemdila Baqî, Hesen Zinar, Pîr Rustem. Dîsa pirtûka Suzan Samancî ku bi navê "Bajarê mirinê" li kurdî hatiye wergerandin jî giş çîrok in, ne çîçîrok in

Ji çîçîrokan jî em dikarin van mînakan bidin: Wekî Serpêhatiya "gur û rovî", pirtûk bi navê "Zargotin" a ku Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê çapkiribû "Rindo" û hér wekî bi sedan ên wekî van bi navê zargotin têne weşandin.

Çîrok bi piranî nêzîkî destana nin an ew û destan nêzî hev in li gorî hin taybetiyêن wan mirov dikare nivîskarê destanê bibîne û cih û demên wê hîn bibe.

Îro çîrok jî ji bo bûyeran têne nivîsandin destan jî li ser bûyerékî hatiye hûnandin.

Destan di dîroka netewyan de çîrokên herî kevn in. Gelek ji wan hîn dibe ku netewe ji ku hatiye û cih û warêن wan ku der e. Ji ber ku bi devkî hetine gotin ne wekî çîrokan bi awayekî rastîn bi cih û war in. Wekî destana "Memê Alan" Di vê destanê de taybetiyêن kurdan tê de xuya dibin, cih û warê kurdan tê de xuya dibe û jiyanâ kurdan û ya wê demê radixe ber çavan.

Destana Memê Alan ji çîçîrokê û efsaneyê bi dûr dikeve. Ji ber ku mêtjûya wê mirov dikare fêm bike û şexsiyetên wê jî ne derî mirov û xwezayê ne. Ji çîrokeke rastî derketiye. Ji ber vê yekê destan hatiye gotin.

Di efsaneyen de mêtjû bi piranî ne diyar in. Di çîçîrokan de jî mêtjû ne diyar e û şexsiyetên wan derî edet û mirovan in, derî xwezayê ne.

Dîsa wekî ku tê zanîn çîrokeke min bi navê "agir jî dîl bû" xelata handanê stend. Ev çîrok e, ne çîçîrok e. Li ser bûyerek rastîn hatiye nivîsin û tiştekî derî xwezayê û kesen derî mirovan tê de tune ye û mêtjû jî diyar e.

Çîçîrokeke ku min berhev kiribû bi navê "gurê ehmeq" di Azadiya Welat de hate weşandin. Ew çîçîrok e ne çîrok e û fabl e. Ji ber ku diyaloga sewalan tîne zimên.

Wekî tê zanîn fabl jî çîçîrok e. Lê ji ber diyaloga sewalan tê zimên ji wan re fabl tê gotin. Wekî fablîn Jîr Dilovan.

Mînak: Xalxalok û sîsirk" mirov nikare ji vê re bibêje çîrok. Ji ber ku di jiyanâ rastîn de sewal naþeyîvin. Lê ji bo perwerdehiya zarokan wiha hatiye hûnandin. Dîsa wekî çîçîroka "guri" ev çîçîrok bi gelek cûreya û bi gelek navan li nava gel têne gotin. Ji bo perwerdehiya zarokan an mirovan û ji bo tirsandina zarokan tê hûnandin. Bûyerên ku tê de cih digirin bi piranî ne li gor jiyanâ rastî ne.

Her wekî çîçîrokên "cin" an an "hût" an. Ev giş çîçîrok in û mirov nikare ji wan re bibêje "çîrok". Wekî di çîçîrokên "1001 şev"ê ne çîrok e, lê çîçîrok e. Mirov dikare van mînakan pir bike. Divê êdî di weşanêن kurdî de jî bi vî rengî ji hev û din bêne cihê kirin û bêne nasandin. Di vî warî de yên ku ramanêن wan cûda bin jî, divê ramanêن xwe di weşanan de bînin zîmîn, qene ev cûreyêne wêjeyê li ser hîmê xwe rûnîn.

li ser gelsêن me yên vekîteyê

Di warê nivîskî yê zimanê me de vekîteyekê me ya hevgirtî nîn e. Her derdoreke me ya siyasi û ne siyasi ne tenê xwedî rastnivîsekê her wiha xwedî alfâbeyekê ne jî. Ev rewşa heyî dibe sedem ku em li ser van mijaran rawestin û serê xwe biêşînin. Xwezî em ne bi van mijaran lê bi mijarêñ dîtir ên zimanê xwe bilî bibûna. Lê em çi bikin ku ev babetêñ hanê di warê zimanê me yê nivîskî de dibin sedemê gêjahî û tevliheviyê. Ji ber vê yekê me xwest ku em careke din vegeerin ser van mijaran, ku berê jî em li ser van rawestiyabûn.

Beriya her tiştî, ez pêşê hewce bi ravekirina vekîte û rêzimanê dibînim. Pişt re ez dê ramanêñ xwe derpêş bikim. Ka em bala xwe bidinê bê vekîte ango rastnivîs çi ye. Bi awayekî kurt vekîte wiha tê ravekirin: Ji rêzikên zimanê nivîskî yê zimanekî re tê gotin ku divê kes riayetî wan bikin. Baş e, ev rêzik çawa têñ peyitandin? Bi piranî, bi saya rêziman bingeha vekîteyê tê danîñ û qayde û rêzikên wê xuya û zelal dibin.

Her wekî ku tê zanîn, rêziman (gramer) li ser hêmanêñ zimanekî yên mîna deng, teşe, tewandin, peyv û hwd. radiweste, wan vedi-kole, disenifîne, têkiliya di navbera wan de diyar dike, rêzikên zimêñ diselmîne (tespit dike) û awayen rast ên hevokan dide xuyakirin. Tê dîtin ku, ya ji vekîteyê re rê vedike rêziman e, nexwe em nikarin rastnivîsê ji rêziman cuda hîzr bikin. Em bi hêsanî dikarin bibêjin ku, kilîta rastnivîsê ango rênivîsê rêziman bi xwe ye. Ha, em vî jî aşkere bikin ku, rêziman bi tena serê xwe her tiştê rastnivîsê çareser nake.

Ji bo vê yekê, em bi nimûneyekê mebesta gotinêñ xwe zelal bikin. Carinan di hin nivîsaran de em rastî çend awayê heman peyvê têñ, wekî /bihîstin/ û /bihîztn/. Di vir de pirs ev e, teşeya rast kîjan e?

Di wê peyvê (lêkerê) de, gelş di dengê /s/ û /z/yê de ye. Îcar bi saya rêziman em tê derdixin ku teşeya rast /bihîstin/ e. Çawa? Di lêkerêñ me yên ku dawiya wan bi /-stîn/ê diqede de, dengê /s/yê di dema niha, dema bê û raweya fermanî de li dengê /z/yê dadigere: wekî; *bibihîze, ez dê bibihîzim, ez dibihiżim...*

Ji bo demêñ borî, kêşana heman lêkerê; *min bihîst, min dê bibihîsta, min bihîstibû...* Ji bo ku babet hîn bêhtir diyar bibe, em çend lêkerêñ din jî bicivînin. Lêkerêñ me parastin, perestin, gestin:

diparêzim, dê biparêzim, biparêze, min parast, min dê biparasta, min diparast...

diperizim, dê biperizim, biperize, ez perestim, ez dê biperestama, ez pê perestibûm...

digezim, ez dê bigezim, bigeze, min gest, min dê bigesta, min gestibû...

Îcar du aliyêñ vekîteyê hene, yek nivisîna peyvan û yek jî nivisîna hevokan e. Ji bo hevokekê jî em nimûneyekê raber bikin. *Meha tîrmehê;* di vê hevokê de /a/ bi /meh/ê ve û /ê/ jî bi /tîrmeh/ê ve hatiye nivisandin. Di vê mînakê de /a/ vegetandeka binavkirî ya yekejmariya zayenda mî ye û /ê/ jî tewanga binavkirî ya yekejmariyê ya zayenda mî ye, ji lew re divê ku bi peyvan ve bê nivisandin. Pir xwes tê dîtin ku rêziman bi xwe jî, ji bo

rastnivîsê rêzikan datîne.

Me daxuyand ku rêziman ji bo vekîteyê her tiştî nikare çareser bike, niha em ji bo vê gotina xwe serî li hin ravekan (îzahan) bidin. A ku dide xuyakirin ku wê xal (nuqte), bêhnok, nuqtepirs, baneşan, tîpa girdek û hûrdek, kîjan bêje ango peyv bi tîp û herfa girdek, kîjan jî bi ya mezin dest pê bike û hwd. bi riya vekîteyê têne peyitandin. Têkiliya rêziman bi van xalan nîn e. Bi gotineke din, ev rêzik pişt re têne danîn.

Digel van yekan, rêzikên vekîteya zimanekî bi senahî dikare xwe bispêre sê prensîban:

1) Vekîteya denganiyê (rastnivîsa fonetikê)

Alfabeya zimanê me alfabyeke fonetik e, ango ji bo her dengî tîpek tê danîn û deng bi wê tê nimandin. Em piçek ronî bidin ser mijara xwe. Em bala xwe didinê ku heman (eynî) peyv dikare bi çend cureyan, bi çend çeşîdan bê nivisandin. Nimûne: *sitirandin, sitrandin, strandin... an jî xesû, xwesû, xesi ... an jî filitîn, felitîn...* Awayê rast kîjan e? Me got ku li gorî alfabya me divê ji bo her dengî tîpek bê bikaranîn. Nexwe bi zelalkirina fonetika zimanê me, ev gelş hel dibe.... Bi rastî tu li kîjan xebata rêzimanî ya Kurdî dinêrî, tu li newekheviya senifandina jêderkîn dengê zimanê kurdî tê. Bi kurtî em diyar bikin ku hîna em ne xweyê senifandineke hevgirtî ya fonetika zimanê Kurdî ne. Ji lew re arîseya nivîsîna awayen peyvan li ber me heye...

2) Vekîteya etîmolojîk

Li ser rayek û kokêne peyvan radiweste, di vekîteya peyvan de (yên biyan jî tê de) serî li bingeh û hîmê peyvê dide, rastiya wan derdixe holê û wisa bi kar tîne. Mînak: Çarlep, çalepk, çaplûk, çapelük... Em van peyvan dahûrînin, lê hema em bi kurtasî bibêjin. Peyv ji sê hêmanan hatiye pê, ji /çar/, /lep/ û /k/yê. Ev her sê hêman hatine nik hev û peyveke hevedudanî anîne pê. Nexwe ya

rast çarlep k e, ne yên din in...

3) Vekîteya kevneşopî

Ji nav jî çawa xuya dibe, di mijara rastnivîsê de serî li awa û şêweyê rastnivîsa kevneşopî, ya adetî tê xistin... Ew berhemên me yên klasîk, ên berê, ji bo me dibin rênîşander...

Em bi van sê riyan dikarin hîmekî xurt û tekûz ji vekîteya zimanê xwe re çêkin û kêmasyiyê ku hene ji navê rakin.

Sûdgirtina ji tecrûbeyan

Niha em alfabya latînî ya kurdî bi kar tînin (bi giştî kurdên bakur), ev jî tiştekî suriştî ye gava ku tu alfabyekê bi kar bînî, bivê nevê tu dê di bin bandora hin rêzikên wê alfabyê û vekîteya wê alfabyê de bimînî û heta tu dê hin ji wan rêzikan jî, ji xwe re bipejirînî. Gelo em dikarin bibêjin ku na em bi teyahî ji wan cihê ne? Hem tu dê alfabya wan bi kar bînî û hem jî tu dê xwe ji rastnivîs û rêzikên rastnivîsa wan bi temamî bi dûr bidî? Na ne gengaz e, çîmkî di ví warî de hin bîryarêne gelempêr têne standin û konferansên rastnivîsan têne lidarxistin.

Niha kurdêne me yên ku alfabya erebî ya kurdî bi kar tînin dikarin bibêjin ku em ji sedî sed vekîteyeke xweser bi kar dihênin?

Îcar ku em li ser vekîteyeke xweserî zimanê xwe israr bikin, dîsa em dikarin serî li berhemê kevn ên ku bi alfabyeke xweserî zimanê me hatine nivîsin, bixin. Da ku heta ji me bê em rastnivîseke xweserî zimanê xwe pêk bînin. Ji bo vê yekê Mishefa Reş û Cizwe nimûneyê baş in. Hêjayî pirsê ye ku em bipirsin, gelo ew alfabe û rastnivîsa ku zimanê me pê hatiye nivîsin çiqas xweser in? Divê mirov baş li wan bikole û lê mêze bike bê ka rastnivîseke hevgirtî jî di wan de ye, an na...

Vekîteya Celadet Bedirxan

Em tev pê dizanin ku Celadet Bedirxan ji hêla bilêvkirinê (telafûzê) ve, devoka Botan ji zimanê me yê nivîskî re hilbijartiye. Em tev

jî qet nebe, bi awayekî teorîk vê yekê dipejirînin. Lî ku mesele hate kete pratîkê, em tersî vê rewşê dikevin. Gelo çîma?

Gere em vê nuqteyê ji bîr nekin ku, her hêrêmeke me xwedî bilêvkirinekê ye, heta di heman herêmê de bilêvkirinê cuda jî hene. Jixwe em nikarin ji fonetiķeke homojen a zimanê kurdî behs bikin. Em bi bîr bînin ku tu netewe ne xweyî fonetiķeke hevgirtî ye. Paşê radibin ji xwe re cihekî mînanî navend qebûl dîkin û dengê zimanê xwe li gorî jêderka wan tesnîf dîkin.

Gava ku em ji aliyê fonetiķê ve li mijara xwe hûr bibin, divê ku em vê yekê ji bîra xwe qet dernexin.

Ku ez rabim ji layê bilêvkirinê, ji xwe re herêma Serhedê bigirim, ez dê tersî Celadet Bedirxan bikevîm. Eger ez wisa bikim, mafê yê din jî heye ku ji hêla herêma xwe an jî herêmeke dîtir ve, li ser meseleya fonetiķa kurdî raweste. Wekî nimûne hin hêrêm *çav mînanî çehv, ç'ev*, hin hêrêm *zivirîn* nola *zîvirîn*, hin herêm *hesin bîna h'esin*, hin herêm *xwê fîna xwey....* bi lêv dîkin. Em dikarin bi ci teherî xwe ji vê aloziyê rizgar bikin?!

Tê gotin ku gel çawa dipeyîve em jî wisa rastnivîsa xwe saz bikin. Em pirs bikin, ma gelê me bi awayekî homojen dipeyîve, ma gelê me xwedî fonetiķeke pişdar (muşterek) e? Em baş dizanin ku her herêmek heman dengî bi tonekî din bi lêv dike. Yek /s/ya di /sed/ de bi awayekî şede bi lêv dike, yek hîn nermtir bi lêv dike...

Loma, an em dê li ser biryara Celadet Bedirxan bimînin ku bê çawa ji aliyê bilêvkirinê ve Herêma Botan ji xwe re nolî bingeh hilbijartiye, an jî divê ku em herêmeke dîtir. Eger ez raya xwe derpêş bikim, gerek mirov li ber biryara Celadet ranebe. Çimkî, ku em vê mijarê ji nîqaşê re vekin, em ji binî dernakevin. Cihê dax û mixabînetê ye ku di me de hîna hestê neteweyî di vê mijarê de jî bi pêş neketiye, herêmparêzî û di hin kesan de jî herêmperestî

serdest e û bûye perde ketiye ber çavê wan

Di ziman de hin tişt dikarin li derveyî rîzikan bimînin. Yanê wekî awerte tişt dikarin derkevin ber me. Em jî dikarin bi çavekî din li wan binêrin. Gotinek bi navê "xeleta mensûr" heye, em jî dikarin di vê çarçoveyê de li hin rîzikan binêrin. Yanê dikare ew tişt tersî gramerê be, tersî vekîteyê be, lê ji ber ku ji aliyê maneyê ve tu şâşıyek çenabe, tu guherînek dernakeve himatê, mirov dikare qet dest nedê.

Li ser rastnivîsa terkîban

Piştî van daxuyaniyan îcar ez dikarim bêm ser mijara xwe. Mijara me ev e, peyvîn me yên ku bi dengdêrên /a/ û /e/ diqedin, gava bi peyveke din re terkîbê çedikin û /y/ya kelijînê tê paşıya wan gelo dikevin an jî nakevin. Bi rastî gava ku em guh li zimanê devkî didêrin, em dibînin ku em hinan kurt dîkin û hinan jî nakin. An jî, heman peyv li herêmekê bi kurtkirî tê bi lêvkirin, li herêmeke din jî bêyî ku bê kurtkirin tê gotin.

Nimûne:

*keya keyayê gund an jî keyê gund
rojname rojnameya hefteyî an jî rojnama
hefteyî*

mele meleyê medreseyê an jî melê medresê

Çawa di nimûneyên me de jî xuya bû, ji aliyê bikaranînê ve du şêwe hene. Niha ji aliyê wateya hevokan ve tu gelş nîn e. Li ser van nimûneyan çaxê ku em rawestin, em dibînin ku ji hêla wateyî ve tu gelş nîn e. Wate winda nabe. Mebest diyar û eşkere ye. Lî ji layî rîzmanî ve gelş heye. Gerek dike ku deng neyîn xistin. Çimkî ev rewşa hanê ji aliyê binyadî (bastûrî, bunyewî) ve di ziman de naqewime. Ne tewang e û ne jî rîzikeke zimanê me ye. Tenê ji aliyê lêvkirinê ve rewşike rasteqîn heye li pêşîya me. Ev yek jî, ji aliyê vekîteyê ve di warê nivîskî de gelemşeyê derdixe ber me. Dibe sedemê dubendiyê. Ez bi awayekî kurt ramana xwe derbibim, ji bo ku yekîtiyek, hevgirtinek di

rastnivîsa me de hebe, meyla min li ser awayê ne kurtkîrî ye.

Mijara me ya duduyan ev e, gelo beriya dengê /y/yê dengê /i/ tê an nayê? Celadet Bedirxan dibêje ku nayê. Di di warê nivîskî de hin ji me riayefî vê rîzikê dîkin hin ji me ji nakin. Ji lewre ji, newekheviyek di warê vekîteyê de diqewime. Pirtir ji ev gelşa hanê di peyvîn ku dawiya wan bi dengdêra “i” yê diqede de, derdikeve. Dengdara “y” yê ji, mîna tîpa kelijînê/pêwendiyê bi erka xwe radibe. Em vê ji bibêjin ku di zimanê me de sê dengdar bi erka tîpa kelijînê radibin: *h, w* û *y*.

Ev her sê dengdar ji, di zanista fonetikê de wekî nîvdeng têne pejirandin. A jixwe ji ber vê yekê ye ku gelşa /i/ û /y/yê tê li ber me disekine. Gava ku dengdêra /i/yê tê pêşîya dengdara /y/yê, asîmilasyonek tê pê û dengê /i/yê nema mîna xwe dimîne.

Nimûne:

derî	<i>deriyê biniya malê</i>
tirî	<i>tiriyê rezê gund</i>
malî	<i>maliya meleyê gund</i>

Niha ez li gorî fonetîka herêma xwe, dikarim bibêjim ku dengê /y/yê hîkariyeke mezin li dengê /i/yê dike û nema dengê /i/yê wekî xwe dimîne. Eger ew deng sedî sed li dengê /i/yê danegere ji, ew ji sedê sed ne /i/ ye ji. Bi kurtasî, guherîneke berbiçav tê de çêbûye. Ji bo selmandina vê yekê min bi xwe kesen ji herêma Botan ji dan axaftin. Min dît ku ew ji wekî dahûrîna me dengê /i/ ya li pêşîya /y/yê bi lêv dîkin. Belê, Ew deng ne tam /i/ ye û ne ji /i/ ye. Dengekî wisân e ku di navbera her duyan de ye. Di vir de çawa me li jorê ji got, em bi meseleyeke asîmilasyonê re rû bi rû ne. Ev yek di bastûra ziman de diqewime. Hemin ku dengê /i/yê bîna xwe namîne, peyta Celadet Bedirxan di cih de dibînim û ji lew re dibêjim ku divê beriya /y/yê dengê /i/yê neyê...

Mijara me ya sisîyan ji li ser dengê /ê/yê ye. Dîsa dengê /y/yê derdikeve pêşîya me. Çaxê ku terkîbek tê pê û dengdêra /ê/yê tê

pêşîya dengdara /y/yê, guherînek di dengê /ê/yê de çêdibe. Çawa me li jorê ji diyar kiribû, ev qewimîn û rûdan ji ber dengdara /y/yê ye. Dengê /y/yê, /ê/ya li pêşîya xwe asîmîle dike. Li gorî Celadet Bedirxan divê dengê /ê/ an dê bibe /i/ an ji /el/. Wekî *diya min* an ji *deya min*. Lî ev yek di hemû terkîban de pêk nayê.

Nimûne:

rê	<i>riya navbera gund û bajêr</i> an ji <i>rêya navbera gund û bajêr</i>
dê	<i>diya min a pak</i> an ji <i>dêya min a pak</i>
çê	<i>tu çêya xwe dibêjî(!)</i>
sê	<i>kesê sêyemîn (!)</i>

Niha di karvaniyê de ez bi xwe rast li her du awayên bikaranîna dengê /ê/yê hatime, yanê *riya navbera gund û bajêr* an ji *rêya navbera gund û bajêr*. Meyla min li ser awayê bikaranîna /i/yê ye. Anglo “riya navbera gund û bajêr”, ji “rêya navbera gund û bajêr” çêtir dibînim. Lî wekî ku di her du nimûneyên dawî de tê dîtin -ku me nîşana baneşanê di nav kevanê de daniye paşıya wan- em nikarin /ê/ya wan li dengê /i/yê dagerînin. Bi gotineke din ez bi xwe nikarim di şûna “tu çêya xwe dibêjî” de bibêjim “tu çiya xwe dibêjî”

Der barê vê babetê de mirov dikare hin rîzikên awerte deyne, yanê rastnivisîna hin terkîpan ji rîzika gelempar biawertîne.

Di van her sê mijaran de ji bilî peyt û tespitê rîzimanî, pêwistî bi tercîhan ji heye. Ji ber ku di nav gel de hevgirtinek (standartek) tune. Ji ber ku nîn e, erk dikeve ser milê me ku em li ser şewekeyê biryara xwe bidin.

Wekî min berê ji anîbû ziman, beriya her tiştî hewce dike ku hay û agaha me ji bilêvkirina ku Celadet Bedirxan vekîteya xwe li serê ava kiriye hebe, ji lew re em ji bîra xwe qet dernexin ku em ne xweyê fonetîkeke hevgirtî ne!.

ber cahê serekê encumana

rastniyîsa zmanê kurdîra

Di rojeva vê cvînêda sererastkirina du tîpan heye. Ew her du tîp, tîpa "î, ê" ye. Ev her du tîp, gava bikevine pêşî bêdenga "y" yê, wekî "zeviya min, devîya darê şîlan; rêya gundê me, dêya bavê min" ka dê çawan bêne nvîsandin û xwendin? Divê bête zanîn ev yek, ne ji mîjara me ya di meha berfanbarêda hatî gotingo krine. Anglo di vêda kurtkirin an jî kêşana peyvan tune. Tenê têkilbûnek weha peywiste an na heye.

Gor hnekan, têkilbûn dixwaze û divê ew "î" yên bikevine pêşî tîpa "y" yê bibe "î", "Zevîya min" bibe "zeviya min", "devîya darê şîlan" bibe "devîya darê şîlan" û ew "ê" yên di vê rewşêda, divê an bibin "e" an jî bibin "î", di vê tentêlêda, "rêya gundê me," an bibe "reya gundê me" an jî "riya gundê me". "Dêya bavê min" an bibe "deya bavê" min an jî bibe "diya bavê min" dibêjin û bê sedemên ku em pê dizanin, bi îsrar jî li ser gotinên xwe radiwestin. Heger "zmanê filan gel û netewên Hind û Ewropî weha ye, divê yê me jî welê bit" dibêjin. Bê hzirîn divê bê redkirin. Lê heger "Di zmanê meda awertên weha hene" bibêjin. Divê mrov pêşî "gelo!" bibêje û paşî qasek li ser biponije. Digel vê yekê, vê mjarê, bi du sê hevokan şirove bikîn, têda xêr û havil heye.

Xwezay ez di vê têkilbûnêda, ji wategran-kirina nvîsandin û xwendinê, herifandina peyvan, xopandina zmên û nenasîna zmanê Kurdî zêde tu havilek (wecek) nabînim. Lê tevlîhevbûna peyvan, hişkirin û kurtkirina zmanê Kurdî, bi awayek vekirî radixe ber çavan. Yek jî ew nerîmayî, drêjayî û ahengîya di wan kuncikên zmanê me da heyî ji holê radike. Tu heyberek ku ciyê wan bigire danayne. Lê tam dij û vajîyê wan, heyberên bê kês datînin. wekok:

Emê lêkerên ku raderên man "birîn û birin" e hildin destê xwe û şirove bikîn:

Borîya têdayîya radera birîn "birî" ye û ya radera birin jî "bir" e. Di vê kêşanêda tu tevlîhevî û zerar tune. Lê gava em li borîya dûdar binêrin. Kêşana radera birîn "birîye" ye û ya lêkera birin "birîye" ye. Dema tîpa "î" yê bête pêşî tîpa "y" yê û bibe "î" wusan tevlîhev dibe ku tu kes nikare van her du lêkeran ji hevdu bine. Lewra her du jî wek hevdu dibin "birîye". Yek jî dixwazim li ser peyva "mê" û "mî" yê rawestim. Çawan tê zanîn ku di binyata xweda peyva "mî, mih" e. Gor qaydêr zmanê Kurdî tîpa "h" yê ketiye tîp kurt jî ciyê xwe daye tîpa drêj. Bî vê rewşê "mî" bûye "mî". Her ci dibe? Gava em bi qaydêr kêşana nav û rengdêran, van her du (mê û mî) peyvan bikêşîn, Mêya reş û mîya reş derdikeve pêşber me. Lê gava tîpa "e" û "î" bibin "i" kêşana her dukan jî dibe "miya reş" û çara ji hev nasînê ji holê radibe. Yê weha, di zmanê meda gelek hene û gava têklayek weha bê holê pêşî li pêşveçûna zmên digire û dixitimîne. Kêfa zmên jî bi vê yekê dişkê.

Divê bê zanîn, Zmanê Kurdî zmanek nerme. Zmanênerim, dengêr drêj dixwazin. Haya mrov dikare "Zmanênerim, bengîyen dengêr drêjin" bibêje. Baş bala xwe bidinê; peyva tirih, rih, sih, cuh, Buhtan, çehv, kehnî û êd. zmanê Kurdî, ji bona wan dengêr kurtêr di hundirê van peyvanda dixwyêr drêj bikin, zmên ew "h" yên di binika wanda heyî avêtine û ciyêr tîpêr Kurt dane tîpêr drêj. Bêweku peyva tirih bûye trî, rih bûye rî, sih bûye sî, Buhtan bûye botan, çehv bûye çav, kehnî bûye kanî. Carek din jî bibêjin; Qenc dêna xwe bidinê, dema di peyvekda Tîpa "h" bi tîpek dengdirêra bixwiyê, bê zordan çara ketina wê tune. Wekok: Nahîd, nahêde, mahane, mehanî, mahû, Cîhan, avahî, weha, nîhan, nîhayet û êd...

Ji xwe ev nermayî û drêjayî, taybetîyek zmanê kurdîye û sedemek ji sedemên berxwedan û ne pişivîna wî ye. Di dîtina minda, heger ev nermayî û drêjiya zmanê me ne bûya, divan mercen granda, bi vê rewşa tekûz û drist, heyâ dema me dê nekarîya bîhatâ. Ji bo çi vê çeka hêja ji destê zmên tê derxistin nizanim? Bi kurtasî zmanê me lê dixebite ku dengen xwe yên kurt, drêj bike. Hnek ji kesen Kurd jî, ber bayên bîyanîyan dikevin ku beshek dengen drêj kurt bikin. Yek jî dibe ku di zmanê hnek bîyanîyanda tipa "y" nîv deng be, an jî bêhna drêjayê jê bê. Lê di zmanê me da xwerû tipêk bêdenge û wekî bêdengen dinê jî. Ango wekî wan bêdengen din, bê alîkarîya dengderek nayê bi lêv krin. çawan bê alîkarîya dengderek nayê bi lêvkirin wusan drêjayî jî têda naxwîyê. Heger taybetîyek nîhanî an jî razek têda hebe ez pê nizanim. Jixwe di zmanê me da, ji dengdêren kurt tipa "i, u" ne têne serê peyvan û ne jî dawîya peyvên Kurdi.

Digel vê şirova jorîn; "Ew "ê, i" yên têne pêsi tipa "y" yê, ku tu guhertin di dengen wan da nayen holé" nabêjim. Lê "Ew guhertin, tu gavê nazivirine dengek din û ji binyata xwe jî zehf dûr nakevin. Lewra ew dengen peyikin" bi îsrar dikarim bibêjim, çawan tê zanîn, ji tipen Latînî Elfaba Kurdî ya hatî pejirandin, 31 tip û pevdakeke. Divê bê zanîn ku ev tip tenê işareten dengen binyatînin. Ji bil van dengen binyatî, gelek dengen peyik ji di zmanê me da hene. Lê ji wan ra tu işaret ne hatine danîn. Lewra dengen peyik li ser binyata xwe têne hejmartin.

Di vê mjarêda dîtina min ewe ku bi tu rewse tipa "î" nabe "i" û tipa "ê" jî bi tu tipen dinra naguhere. Lê di hnek mercanda tipa "î" dikare bikeve û di mercnada ji her se "e, i, u" tipen kurt dikarin cîyên xwe bidine tipen drêj. Sedem di mjara me da tipketin cî negirtiye, li ser rawestan û şirove naxwaze.



Berî her karî dixwazim vê yekê bibêjim ku damezirandina vê encumenê ez gelek dilxwes, bextiyar û bextawer kirime. Dema her celeb hêz di dest û pê minda, serek xwes xebat li ser bedena min, di hundirê wî serida mejîyek cwanê zêhntûj heyî, karek weha rasî min ne hat. Gelek lê xebitîm ku encûmanek

weha damezirînim. Lê mxabin Ser ne ketim. Ne tenê ez, di wan demanda kesna jî Pêngav (teşebûs) ên ne serketî krine. Ew kes jî bi wan derdan mane û zehfê wan koçdawî krine. Guhertinek grîng di navber min û wan pêngavkeranda heyen; ew jî eve ku ez ghîşitime karek weha û min bi çavên xwe dît. Heger xebatek ji dil ne karim bikim jî ne xeme. Bawerîya min bi cwanê Kurd heyen dê ji me gelek çêtir van karan li rî bibin. Nha temenê min dervazê 72 salan bû û ji nû ev karê pîroz weha bi cvatî bi dest min ket. Heger bi qûnxusel (qûnkaşkî) jî be dixwazim li pê vî karî bikevim û qasî bikarim tecrîbe û xebatên xwe yên kevin bîra xwe bînim û pêşkêşê cwanan bikim. Hêvîdarim dê heval, havil jê bibînin.

Dixwazim qasek li ser taybetîyen hnek şaxen zmên rawestim: Zman wekî candarane. Candar çawan ji dayikek çedîbin û her yek di nav mercen xweda bi alî tekûzbûnêve diherikin. lê hnek ji wan zû an dreng nexweş dikevin, dimirin û yên nû ji dayikanra dibin. Zman jî wusan di nav cvatanda derdikevin û gor mercen dem, iqlîm û jîna wê cvatê bi alî tekûzbûnêve dişemitin. Peyvîn betalmayî û nexweş dimirin û yên kérnehatî ji zmên dikevin, yên nû dizên, tekûz dibin û di nav zmenda cîyên xwe yên teybeti digirin. Her dem çebûn û di nav zmenda cîbûna peyvan ji peyvîn ji zmên ketî zêdetirin. Lewra zmên rojbiroj zengîntir, tekûztir dibin û pêşvetir diçin. Yek jî candar, nemaze mrov çqas pêşve diçe, çawan çebûna wan ya fizikî, xweşiktir û tekûztir dibe. Wusan hişmendî, huy û perwerdiya wan jî bê rawestan, di tentêla tekûzbûn û pêşveçûnêdaye. Zman jî çqas dem pêşve diçe, çawan peyv û têgihêne wî zedetir dibin, wusan rewşa paragraf, hevok, peyv û kîtan jî tekûztir û watedartir dibin. Mrov, çawan gava bi xarina hindik xdayê xwe hilde, divê dev ji xarina pir berde. Bi kincen hindik bikare gerim û hênikîya xwe bisazîne, divê yên zêde li ber xwe neke. Wusan Zman jî gava bi peyvîn hindik hevok eynî watê bide, divê peyvîn zêde lê neyên barkirin û gava peyvek bi tipen hindik eynî watê bide dvê tipen zêde jê bêne avêtin an jî derxistin. Çawan ürfîşî û qelewî ji tendurustîya mrovanra kîrnayê û heger gelek pêşda here brek nexweşî jê têne holê. Wusan ji hevokekra çend peyv bixwaze û ji peyvekra

çend tîp bixwaze, jê zêdetir divê neyê werimandin. Heger peyv û tîpên zêde watê ne ruxîne jî, narînîya wan di herifine. Heger em watê motor û peyvan jî vîtes bihejmîrîn, ji motorêra çend dranok bixwaze ew qas li vîtesê tê artilandin (tê pêveðanîn). Çawan kêm kérnayîye wusan zêdejî.

Dixwazim bi rewşek din jî zmên hildim destê xwe: Çêbûna zmanan wekî dahêن (îcad) ên heyberanîn. Dema heyber têن dahênandin, parçen wî ji normalê gelek zêdetirin, girnûz, tantiros (kaba) û ne telaşfinin. Paşî rojbiroj parçen zêde jê têن derxistin, yên girnûz û tantiros têن telaştin û bi rewşek narîn derdikevin holê. Bi kurtasî her heyîn di binika xweda tekamûl dike. Xwezay Zman jî dervê vê rîzîkê nayê hzirîn. Hemine ku zman jî di rîzîk (ka-nûn) a tekamûlkirinêra dervaz dibe. Lewra ji vê rîzîkê revîn bi destê tu heyînê nakeve.

Tekamûlbûna zmanan bi tekamûlbûna gel, wêja gel û netewanra perelel dimeşe. Xwezay ev yek bi pêşveçûna cvatîra jî peywendare. Ji vê sedemêye ku zmanên cîhanê bi tanga hevdura tekamûl naake. Di eynî cvatêda jî (heger zmanê navendî ne hatibe sazandin) ji herêmek heya ya din hnek guhertin dixwêyên. Di eynî herêmeda jî, carna bi hevdura derfet naade guhertina hemî hevok û peyvan. Ango di hnek hevok û peyvanda paşve mayîn dixwiyên.

Karê tekamûlkirina zmên, hevok û peyvan ya gel bixweye di nav demek drêjda pêktîne. Lê dema gel vê peywirê pêk neyne, an jî kemasî têda bihêle, di berevanîya gelda aqademî radihijne vî karî û bi rewşek zanîstî sere-rast dîkin.

Ji tekamûlbûn û tekamûlkirina zmên, hevok û peyvan, mebesta me di vê şîrovêda, tene krutkirina peyvane: Di medresêda, seydayê me, dema rastî peyvekî Erebî ya kurtkirî bihata, Serê xwe hiltanî û “*Ereb talibê kurtkîrinêne*”, carna jî “*Dema peyva Kurt an jî Kurtkîri wata peyva drêj bide, bikaranîna ya drêj ne duruste*” digot. Piştî ghîştina min û xebata min ya li ser zmanê Kurdî, Min dît ku gelê Kurd jî (ji bil hnek xwendayêñ dbistanî) ji kurt kirina peyvan gelek hez dîkin û beşek peyv kurtkirine jî. Dema min li ser zmanê Kurdî pêgeran û dahûrandin bikartanî, bi peywistî li nav gel digeram û bi wanra daxi-

vîm. Di devernada dema min peyva drêj di ciyê ya kurtkirîda bikartanî, bê rawestan kes-na “*Te ew peyv çewt bikaranî*” digotin. Piştî dahûranekê drêj û gran min zanî ku kurtkîrina peyvna nişana pêşveçûna cvatane û xebitandina peyva kurt ji ya drêj gelek çêtir, rastir û durusture. Ji ber svikîyê, him xebitandina wê him hînbûna wê hêasantire jî.

Dixwazim vê mjarê jî hildim destê xwe qasek li ser rawestim: Tu carî têgih an jî peyvek kurt nayê drêjkirin. Lê hnekêñ drêj bi qaydan an jî bê qayde têne kurtkirin. Weku. HEP, DEP û HADEP ji Halkın Emek Partisi, Demokrasi Partisi û Halkın Demokrasi Partisi çêbûne. Yek jî, pêra, pevra, têda, lêkxistin, lêkdan û êd. ji bi wîra, bi hevdura, di wîda, li yêkxistin û li yêkdan hatine holê... Dixwazim li vir ristek Melayê Czîrî peşkêş bikim:

Li ber çokan û kaşoyan
Ji derba Tirk û Hindoyan
Dibazim her wekî Goyan
Dema ew têne meydanê

Dema ew tên bi bazı tên
Digel qesên Şîrazî têن
Çi mukarin di tazî tên
Bi de'we têne lêkdanê

vê şîrove kîrinê, êdî bi hêsanî dikarîn bêne li ser mebesta ramana xwe ya ji mera peywist:

Roja 20 ê meha berfenbarê, bi bankirina Enstituya Kurdî, gelek rîexistinêñ Kurd hatin nik hevdu. Di nav xweda û bi besdarîya hemî rîexistinan Encumenek ji bo durustkîrinâ Rastnivîsa Zmanê Kurdî damezirandin û di eynî rojeda cvîna xwe ya yekemîn li darxist. Bername û rojeva xwe sazandin. Bê rawestan, dest bi gotingoya rojevê krin.

Di rojevêda ew peyvîn bi tîpa “a” û “e” bi-qedin mîna banqa, bra û pere, name divê di qedînekanda çawan bête bikaranîn cî girtibû. Ev mjara han ji alî graniya gelê Kurdve, zûda hatiye pişkavtin û vê mjarê weha “EZ diçime banqê, brê min hat, ez ji banqê têm, min brê xwe şand û Perê min heye, nama kurê min hat, perê dibînim, namê dixwînim. Beşek ji endamên encumenê “xebitandina bi vê rewse êdî hêasantir, çêtir û narîntire” gotin. Yêñ din pêşber derketin û “Orîjîna peyvan dirixe di-vê peyv bê guhertin, dihemî kêşananda orîjî-

na wan bixwiyêñ" digotin. Gor wan, "Divê ez diçime banqayê, brayê min hat, ez ji baqayê têm, min brayê xweşand û pereyê min heye, nameya kurémin hat, pereyê dibinim, nameyê dixwînim bitin" ramanê xwe danîne bêş cvatê.

Ez bi fermî ji wan dipirsim. Di zmanê te-wangda, nemaze di yê Kurdîda pirsa kîjan Orîjînê dikin? Bla bibêjin em jî ser wext bîbîn. Orîjîna peyvê, "tirih" e, yan "tiri" ye, Gava ku bibêjin "tiri" ye, vêca dema ew bibe "tiriye reş"ango ew "î" bibe "î" ka orîjîna vê peyvê diruxe an ne?

Mînakek din jî ji du navan bidim. Yek ji wan "xal" û ya din jî "ap" bi van her du lêzimanra axaftin an jî di bankirinada, xalo û apo ti bikaranîn, gelo aw "o" orîjîna wan peyvan naruxîne? Gava di nav qedînekanda bê xebitandin, ji her du pyvan jî "o" ji wan dikeve û di ciyê wêda "ê" tê danîn. Di wê tentêlêda "Xalê min, apê min" an jî "Xalê malîya me pir başe, apê wê kerevanek mérane, gelo ev xalo û apo ku bûne xalê û apê ci anîne serê orîjînê? Ji van mînakan pirin."

Em qasek jî li ser lêkeran rawestîn

Rader	Qurmê lêkerê	Lêkera fermanê	Dema niho û freh
Hinartin	hinart	hinêr	bihinêre dihinêre
Kezaxtin	kezaxt	kezêx	bikezêxe dikezêxe
Çandin	çand	çîn	biçîne diçîne
Şandin	şand	şîn	bîşîne dişîne
Girtin	girt	gir	bigire digire
Geztin	gezt	gez	bigeze digeze
Kirin	kir	k	bike dike
Xistin	xist	x	bêxe dêxe
Nivistin	nivist	niv	binive dinive

Emê raderan danîne alîkî bla ji xwera qasek rawestin, qurmê lêkeran ango peyvan hil-dîn destê xwe û bi kêşanê lêkeranra bidîn ber-hevdu û ji orîjînêra sadiq bimînîn (!) Ka çawan dibe?

Gava peyva "hinart, kezaxt" hildîn destê xwe, "a" yêwan bûne "ê" û "î" yêwan jî windabûne paşî "hinêr, kezêx, bihinêre, bikezêxe û dihinêre, dikezêxe" jê çêbûne.

Li peyva "çand, şand" binêrin "a" yêwan bûne "î" û "î" yêwan jî xwe veşartine. Bûne "çîn, şîn û biçîne, bîşîne."

Baş dêna xwe bidin tabloya jorîn, Peyva "girt, gezt û nivist" jî her yek bi qaydêñ xwe guherîne. ca tu li peyva "kir, Xist" binêre, ji eslê peyvê tenê tîpa "k, x" mane holê.

Bi kurtasî, gor zanîna min, di zmanê te-wang nemaze zmanê Kurdîda li orîjîna peyvan geran ne karekî raste.

Gor zanîn û ramana min ji vê mjarê, bikan-ranîna birê min, perê te, jî banqê têm, biçime rojnamê çêtir, siviktir û narîntirê ji gotin û nvîsîna pereyê min, birayê te, ji banqayê têm, biçime rojnameyêye. Xwezay divê neyê ji bîrkirin ku ji alî gelê meve hê hemî peyvîn weha ne hatine guhertin û kurtkîrin. Ev kar maye benda aqademîyê û dibe ku awarte jî hebin û derkevin pêşber me. Îro li ser karek welê nikarî rawestîn.

Di rojeva vê cvînêda, Sererastkirina du tîpan heye. Ewher du tîp, tîpa "î, ê" ye. Ev her tîp gava bikevine pêşî tîpa bêdenga "y" yê, wekî zevîya min, devîya darê şîlan; reya gun-dê me, dêya bavê min ka çawan dê bêne nvîsandin û xwendin? Divê bête zanîn ev yek, ne ji mjara me ya di mehe berfanbarêda hatî gotinogo krine. Ango di vêda Kurtkirin an jî kêşana peyvan tuneye. Tenê, Têkilbûnek weha peywiste an na, heye.

Gor hnekan têkilbûn dixwaze û divê ew "î" bibe "î", zevîya min bibe zevîya min, "devîya darê şîlan" bibe devîya darê şîlan û ew "ê" an bibe "e" an jî bibe "î", divê tentêlêda, "reya gundê me", an bibe reya gundê me an jî riya gundê me. "Deya bavê min" an bibe "deya bavê min an jî bibe diya bavê min" dibêjin û bê sedemên ku em pê dizanîn, bi îsrar jî li ser gotina xwe radiwestin. Heger "zimenê filan gel û netewê hind û Ewropî wehaye, divê yê me ji welê bit" bibêjin. Bê hzirîn divê bê red-kirin. Lê "heger di zmanê meda awarte yêne weha hene" bibêjin. Divê mrov pêşî "gelo!" bibêje û qasek li ser biponije. Digel vê yekê, divê mjarêda, bi dusê hevokan mînakan bidîn xêr têda heye

Xwezay ez divê têkilbûnda ji wate grankirin û herifandina zmîn zêde tu havilek têda nabînim. Lê tevlîhevirkirina peyvan bi awayek vekirî dixwîyê Wekok:

Emê lêkerênu ku radera wan birîn û birine hildîn destê xwe: Borîya têdayîya radera birîn "birî" ye û ya radera birin jî "bir" e. Di vê kê-

şanêda tu zerar tune. Lê gava em li borîya dûdar binêrîn. Kêşana radera birin “*biriye*” ye û ya lêkera birin jî “*biriye*” ye. Dema “*i*” ya bête pêşî tîpa “*y*” yê bibe “*i*” tu kes nikare van her du lêkeran ji hevdu binase. Lewra her du jî dîbin “*biriye*” û yên weha gelekin.

Divê bê zanîn zmanê Kurdi, zmanek nerme. Zmenênerim, dengêr drêj dixwaze. Heya mrov dikere “*zmanênerim bengîyên dengêr drêjin*” bibêje. Baş bala xwe bidinê; Peyva tirih, rih, sih, cuh, Buhtan, çehv û êd. Ji bûna wan dengêr kurt ku drêj bikin Zmanê me ew “*h*” yên di wan peyvanda heyî avêtine dengêr kurt drêj kirine. Bêweku peyva tirih bûye tirî, rih bûye rî, sih bûye sî, Buhtan bûye botan, çehv bûye çav. Qenc dêna xwe bidin, dema di nav peyvekda tîpa “*h*” bi dengderek drêjra be, bê zordan çara ketina wê tune. Wekok: Nahid, mahî, mahane, mahû û êd...

Ji xwe ev nermayî û drêjî taybetîyek zmanê Kurdiye û sedemek ji sedemêr berxwedan û nepişivîna wîye. Di dîtina minda heger ew nermayî û drêjîya wî ne bûya, bi vê rewşa drist heya dema me ne dikariya bihata. Bi kurtasî zmanê me lê dixebite ku dengêr xwe yên kurt drêj bike. Hnek kesen Kurd jî, ber bayen bîyanîyan dikevin ku dengêr drêj kurt bikin. Dibe ku di zmanê hnek bîyanîyanda Tîpa “*y*” nîv deng be an jî bêhna dengdêrîyê jê bê, Lê di zmanê meda xwerû tîpek bê denge û weki bê dengêr dine jî.

Di vê mjarêda dîtina min, bi tu rewşê tîpa “*i*” nabe “*i*” û tîpa “*e*” jî, bi tu tîpêr dinra na-guhere. Lê di hinde mercanda tîpa “*i*” dikare bikeve. Sedem di mjara meda ev tîpketin cîne girtiye. Li ser rawestan û şirove naxwaze.

Ev rûniştin, dê roja 21 Adarê bihata li dar-xistin. Lê ji bo hînde sedeman hate paşvedan. dî ev rûniştin dê bi vê rojê bête navkirin. Di rojeva vê rûniştinêda liser du celeb daçekan dê bê goingo kirin: Daçeka “*bi*”, daçeka “*be*”.

1- Daçeka “*bi*” bi van her du rewşen jêrîn pêşkêş goingoya encumena me tê kirin:

Bi av, bi rûn, bi xwê, bi dar.

Biav, birûn, bixwê, bidar.

2- Daçeka “*be*” ev daçek jî wekî daçeka “*bi*” bi du rewşan ji encumena me tê pirsîn:

Bê av, bê dar, bê por, bê şekir.

Bêav, bêdar, bêpor û bêşekir.

Pêşî emê daçeka “*bi*” hildîn destê xwe û bi du rewşan şirove bikin:

a- Ya dikevine pêşî lêkera fermanê û yên ji qurmê lêkera fermanê pêktên.

b- Ya dikevine pêşî navdêran.

Ew daçeka “*bi*”, ku li pêşî lêkera ferman û ji bil dema niho yên ji qurmê wî têr kêşan cî digre, emê jêra daçeka fermanê bibêjîn. Lê di dîtina minda, ji daçekê zêde, jêra tewînek û tewîneka fermanê bê gotin rastir û çêtire.

Daçeka fermanê dikeve pêşî lekeran û bi lêkeran ve tê zeliqandin. Wekok:

Ferman Dema bê Bilanî Vêni Merc daxwaz

Bixwe dê bixwe bila bixwe divê bixwe ku bixwe Biçîne dê biçîne bila biçîne divê biçîne ku biçîne Bikenîne dê bikenîne bila bikenîne divê bikenîne ku bikenîne

Ew daceka “*bi*”, ku li pêşî navdêran cîyê xwe digire, bê kemasî, di rêzika daçekanda-ye. Anglo (awarte ne têda) çawan daçek ji peyvan cuda têr danîn. Hemine daçeka “*bi*” jî bê guhertina ji hevalên xwe dê cuda li pêşî navdêran bê cikirin. Wekok:

Bi kinc, bi çek, bi xêr, bi can, bi xanî, bi hiş, gerila bi rûyek spî peywira xwe didomîne û êd...

Lê gava navek an jî rengderek bîne holê, hinga wekî daçekên din, li pêşî û bi navan ve tê zeliqandin. Wekok:

Gerilayê bikinc û biçek hat. Ew jina bihûner kete şer û êd...

Daçeka “*be*”, ev daçek, ji daçekên neyîne yeke û dikarim bibêjîm yeka herî grînge. Ev jî wekî da çeka “*bi*” cuda li pêşî navdêran cîyê xwe digire û watêr erêni dike neyîn. Wekok:

Bê pez, bê dewar, bê nan, bê zat, bê dûgel (dewlet) gel di dîroka xweda najîn, bê çek ne-tewen bindest rizgar nabin û êd...

Lê dema bi navek xweserî an jî bi rengdêrane bête bikaranîn, bi navdêran ve tê zeliqandin. wekok:

Bênav ji gund hat, Bêşermî dîsa xwa kifş kir, Bêcan zû raket, Bêdar gundekî Kurdistânîye, mala Bêmal li Bêdere û êd...

Di derbarê van her du celeb daçekanda, ew şirova jorîn, ramanan û dîtina mine.

ji encama rastnivîsa

zmanê kurdî re

Em divên di pêsiya mijara me ya vê mehêde, li ser mijara pêsi hinek bisekinin. Her çiqas ku li ser wê mijarê biryar nehatibe standin jî, ji me weye ku her wekî biryareke xefheye.

Mijara berfanbarê; di dawiya peyvên ku bi "a" û bi "e" yê diqedin bikaranîna veqetandekan bû. Mîna: "Ez çûme rojnamê" an "Ez çûme rojnameyê", "Kongra Netewî" an "Kongreya Netewî"

Di civînê de hinekan mînaka yekemîn, hinekan jî mînaka duyemîn pejirandin. Yênu ku mînaka duyemîn dipejirandin jî di nava xwe de bibûne du bes. Beşek mînaka yekemîn bi vebir çewt didit, beşa din jî, her du mînakan jî rast didit, lê belê "bikaranîna mînaka duyemîn çêtir e" digotin. Yênu ku mînaka yekemîn dipejirandin jî, her du mînak rast didîtin, lê belê "bikaranîna mînaka yekemîn ji ya duyemîn çêtir e" digotin.

Bi kurtasî di navbera me de pirsgirêka veqetandekê wilo bû:

Yênu ku berevaniya mînaka duyemîn diki-
rin: Di hevokê de divê ku eslê peyvê (orijîna
peyvê) winda nebe. Mînak; di qedîneka
"Kongrä Netewî" de orijîna peyvan "Kongre
û Netewe" ye, "Kongr û Netew" nîn e. Heke
bi awayê "Kongreya Neteweyî" bê nivîsan-
din, orijîna peyvan winda nabe." digotin.

Rawestîna li ser vê pirsgirêkê girîng e.
Lewre ne tenê di veqetandekan de, di temamî
zmanê kurdî de pirsgirêkê mîna vê hene.
Sedema vê yekê, emê li jêrê, li ser vê mijarê
dîtin û ramanê xwe pêşkêşî we bikin.

1- Divê ku rêzman û rastnivîs di himbêza
hev de û di nav yekîtiyekê de bêne dîtin.
(Çend awerte vê yekîtiyê naherifine.)

a- Zmanê kurdî zmanekî tewang e. Di tay-

betiya zmanê tewang de orijîn dikare winda
bibe. Mixabin pir winda dibin. Mînak: pey-
vên "bajar, dîwar, zman, aş, welat, hesp, xu-
lam" di tewangê de dibine "bajîr, dîwîr, zi-
mîn, êş, welêt, hêsp, xulêm" Em mînaka he-
vokekê jî bidin: "Ez ji bajarê têm" tê gotin, lê
piraniya kurdan "Ez ji bajîr têm" dibêjin. Ev
yek jî ne bê qayde ye. Heke di nava navê nîr
de tipa "a,e" hebe, di tewangê de ev tip dibi-
ne "ê". Ev qayde jî pir hêsan e. Yênu ku dibê-
jin "gerek orijîna peyvê" winda nebe, divê
ku bi tu awayî "bajîr, dîwîr, zimîn, êş, welêt,
hêsp, xulêm" nenivîsin.

b- Orijîna peyvan di lêkeran de jî winda
dibin. Qurmê lêkera "kuştin" ê "kuş" e, lê
qurmê fermanê "kuj" e. Qurmê lêkera "ha-
tin" ê "hat" e, lê qurmê dema niha û dema bê
"ê" ye. Mînakên wekî vê pir in. Yênu ku orijî-
na digerin geleke di van waran de jî pê orijî-
nê bigerin.

c- Di zmanê me de "di û bi" gava dengdê-
rên xwe tavêjin, bi piranî dibine "t û p" . Mî-
nak: "Pirtûka min di dolabê de ye" "pirtûka
min tê de ye", "Azad bi trêne hat" "Azad pê
hat". Yênu ku pê dibêjin "Geleke orijîna pey-
vê neguhere" divê ku hevokên jorê weha bi-
nivîsin: Pirtûka min di ê de ye", "Azad bi ê
hat".

d- Di zmanê me de qertafa piranîyê (an) jî,
heke peyv bi tipa "a, e" biqede, ev tip dike-
vin. Mînak: Pere-peran, axa-axan, netewan-
netewan. Li vir pereyan, axayan, netewayan
nayê gotin. Yênu ku orijîna peyvan digerin vê
qaydê jî geleke biguherînin.

2- Zmanê kurdî bi gelemerî ji kurtkirinê
hez dike. Cînavkên "têve, têre, jêve, têde, pê-
ve, jê, pê, lê..." Ji kurtkirina nav an jî cînav-
kan çêbûne. Dîsa ew peyvên ku di kîta dawî

de tîpa “i” hebe, ew “i” di tewangê de dikeve û peyv kurt dibe. Mînak: şûna “kevirê çiyê” “kevrê çiyê”; şûna “bizina reş”, “bizna reş” tê bikaranîn. Kurtkirinê mîna van pir in. Heke ku em pê orijîna peyvê bikevin, geleke em van kurtkirinan nepejîrinin.

Kurtkirin herdem ne rast e. Heke kurtkirin di nav qaydekê rêzimanê de bê çêkirin û ew qayde jî peyvan neherifine rast e. Mînak; Kurd di peyvînê de şûna “Ez ji mal têm”, “Ez mal têm” dibêjin; şûna “Ji mal ve derket”, “mal ve derket” dibêjin. Bikaranîna han, çiye ku bê qayde ye zmanê diherifine. Lê belê, şûna “diajom”, “tajom”, şûna “diînim”, “ti-nim”, şûna “diarhe”, “tarhe” tê bikaranîn û ev kurtkirin jî rast e. Lewra, ev bikaranîn di nav qaydekê rêzimanê de pêk hatiye.

3- Armanca rêziman û rastnivîsê ji zimanê gel dûrketin nîne. Armanç, nasîna zimanê ye û bi nêzîkê axaftinê nivîsandine. Rastî jî, ne bikaranînen herêmî ye; bikaranîne gelempéri ye. Tenê dema ku bikaranîna gelempéri qaydên rêzimanê biherifine têne guhertin. Kes tenê bi serê xwe nikare biryareke gelmepéri bide. Ev raye di destê kesî de tune. Divê li ser navê gel encûmanek zanistî vê rayê bi kar bîne. Heke bi vê awayî nebe, wê zmanê me ji binî biherife. Ku herkes xwe rayedar bi-bîne, tevlîheviya rêziman û rastnivîsê dê ji iro pirtir bibe.

5- “Rojnama min”, “rojnameya min” herdu jî rast in. “Perê min”, “pereyê min” herdu jî rast in. “Ez diçime çiyê”, “ez diçime çiyayê” herdu jî rast in. Lê belê çiye ku di qerektera zimanê kurdî de hezkirina ji kurtkirinê heye, bi awayî kurtkirî bikaranîn êdî rastire. Rêzimanzanê me, ji Celadet Bedirxan heyâ Qanatê Kurdo, vî yekê wekî me pejirandine. Kesî negotiye: “bikaranîna kurtkirî ne raste”

Cîra,

Lewra awayî kurtkirî hêsantere, zimanê ji hînek barênu ku kêra tiştekê nayêñ rizgar dike, peyivîn û nivîsinê siviktir dike. Di derveyê van rastîyan de, kurtkirin bi tenê serê xwe dewlemendiyek zimanê me ye. Raya kes tu-

ne ku zmanê ji vê dewlemendiyê dûr bixe, jar bike... Kurtkirin jî ne di derveyê qaydan de ye. Qayde ev: heke ku peyvek bi dengdêra “e,a” yê biqede, ev tîp dikarin ciyê xwe bidine veqefînekan. Ev qayde jî qaydeke pir hêsan e.

(Awerte: Di tewangên navêñ xweser “taybet” de kurtkirin ne rast e.)

Pêşniyara me pejirandina kurtkirîye. Heke ev yek neyê pejirandin jî, bila biryarek din neyê hildan. Kî çawa dixwaze bila wiло bi kar bîne.

Em bêne li ser mijara “i” yê ku tê beriya tîpa “y” yê. Li ser vê mijarê rêzimanzanê hêja C. Bedirxan pir rawestaye. Lê belê Bedirxan ne gotiye di nivîsinê de geleke “i” bibe “i”. Ew di peyivînê de şûna “i” yê “i” yê rast dîtiye. Dîsa Celadet Bedirxan dibêje: “Heke di peyvînê de sekînekek hebe, “î” mîna xwe di-vê bête bikaranîn”

Li ser vê mijarê nîrîn û ramanê me

1- Rast e li kîj derê “y” bête pêşîya “î” yê, wê dengê nizim têxe. Ev rastîyekî gelempéri ye. Lê belê nizmaya “i” yê nagîhê dengê “i” yê. Di navbera “î” û “i” yê de dengek nû çêdike. Di rastnivîsa zimanê kurdî de qaydeke gelempéri heye: heke ku dengek di navbera du dengan de bimîne, bi denga bilind tê nivîsandin. Mînak: “Ç” ya “çem” ê ne “ç” ye û ne jî “c” ye, lê bi “ç” yê tê nivîsandin, kes jî wî tîpê bi “ç” ya hişk naxwîne. Dîsa “k” ya “kew” ê, di navbera “k” û “g” yê de ye, lê bi “g” yê na, bi “k” yê tê nivîsandin, dîsa kes vî dengê mîna “k” ya hişk naxwîne.

Wusa ne qayde weha ye: heke dengek di navbera du dengan de bimîne, geleke bi ya bilind bête nivîsandin. Ev qayde gelempéri ye û herkesê vê qaydê pejirandiye. Di qaydan de coterûfi nabe. An ev qayde di temamê zimanê de dê bête bi kar anîn, an jî ev qayde dê neyte pejirandin. Rêyek din tune. Sedema vê yekê ye ku ew “î” ya ku tête pêşîya “y” yê geleke mîna xwe bimîne.

2- Heke ku “î” mîna xwe nemîne wê çi bibe? Bi rastî em navê vê yekêbihêzirin. Lew-

ra zimanê me wê di binî ve biherife. Lêker û kêşana lêkeran wê di tev de têkilhev bibe.

Em li ser lêkera "kirin" û "kirîn" ê bisekinin

Kêşana lêkera "kirin" û "kirîn" ya dema borîya dûdar wehayê

Kirin	Kirîn
Min kiriye	Min kirîye
Te kiriye	Te kirîye
Wî-wê kiriye	Wî-wê kirîye
Me kiriye	Me kirîye
we kiriye	We kirîye
Wan kiriye	Wan kirîye

Emîr Celadet Bedirxan, Roger Lescot "Kürtçe Grameri" rûpel: 12-13, Weşanxane Doz.

Heke ku em "î" ya li pêşîya "y" yê bêxne "î" dê lêkera "kirîn" ê jî bibe mîna lêkera "kirin" ê. Bi vê awayî jî dê zimanê me ji binî biherife. Dê kî bizane "min kiriye" ji bo kîjan warê hê ye bi kar anîn. Wata wê "standine" an "pêkanîne" ?!

3- Gava ku "î" ya li pêşîya "y" yê bibe "î" kêşana lêkerên dema borî û demên hevedudanî jî diherife. Wan ji saziyê têxe û rêza kêşanê serobin dike.

Mînak:

QÊRÎN

Ez diqêrima
Tu diqêriya
Ew diqêriya
Em diqêrina
Hûn diqêrina
Ew diqêrina

KENÎN

Ez dê bikenîma
Tu dê bikenîya
Ew dê bikenîya
Em dê bikenîna
Hûn dê bikenîna
Ew dê bikenîna

Çawa ku di mînakên jorîn de jî dixwiyê di vê demê de qurim "qêrif" û "kenî" ye. Di hemû kesan de ev qurim naguhere. Lê gava ku "î" ya li pêşîya "y" yê bibe "î", dê ev qurim bibine "qêri" û "kenî" û ev yek jî ne rast e, heke ev yek rast be kesa duduyan û kesa sisêyan ya yekîneyê dê ji kesen dîtir biguhe-re, bi vê awayî him rêza demê û him jî qurmê

lêkera fernanê diherife.

Raya tu rêzimanzan an jî nivîsarê tune ku zimanê me, mîna mînakên jorê biherifine. Peywira rêzimanzan; di zmanan de pêkanîna herifin, şâşî û çewtiyân nîne.

Pêşniyara me neguherina "î" ya tê berîya "y" yêye.

Mijara duduyan jî mîna mijara yekane. Li vir jî "y" dengdêra pêşîya xwe nizim dike. Lê belê ew nizimbûn, dengê xilas nake. Celadet Bedirxan jî, di bilévkirinê de "reya min" di nivîsandinê de "reya min" çêtirtire gotiye. Di axaftinê de kî çawa dipeyive bila wîsa bipeyive, lê belê geleke nivîsandin neguhere.

Mînakên wiha di kurdî de hindik in. Tenê di tewangan de derdikeve pêşîya me. Ji bo te-wangê jî Celadet Bedirxan qayde danîye.

"Pê" di zimanê me de gava ku ditewe na-be "pîyê min" Lewra "pê" tiştek din "pî" tiştek dine. Jixwe li jorê jî me dabaş kiribû ku, divê "î" ya pêşîya "y" yê neguhere û "pîyê min" çewt e. Rastiya wî "pê min" e. "e" ya "pê" yê peywira tewangê jî dibîne.

Di baweriya me de "dê" an "dî" devokin. Bikaranîna kîjan devokê rast e? Li ser vê gen-geşî pêwîst e. Ev tiştek dine.

"Kî" "kê" ya kurdî zayendê kifşe dikin. Heke "e" ya li pêşîya "y" yê an jî "î" ya li pêşîya "y" yê bi awayekî bête guhertin û ev dengdêr jî cî bidine hev, ew gav zayend wenda di-be. Ev jî li ser zmanê me zilmeke giran e.

Çawa ku me li jorê jî, jê dabaş kiribû, "y" dengdêra pêşîya xwe nizim dike. Ev rast e. Lê dengê jî binî wenda nake. Heke ku bir-yara wendakirinê bête standin, geleke ew gav "y" bête pêşîya kîjan dengdêra bilind wê nizim bike û em ji wê ya nizim bikarbînin. Mînak: "rûyê min" û "mûyê pora min" bête ni-vîsandin. Di qaydan de coterûyî ne rast e!

Li ser van mijaran nêrin û ramanê me ev in. Em bawer in ku encûmana rastnivîs wê di van mijaran de biryarê rast bigirin.

Lî ser navê Weşanxana Komelê

Derbarê rastnivîsîna herfêن

-î, -û, -ê berya -y, -yê de

Çendî di rastnivîsîna bêjeyan de parastina koka peyvan/kelimeyan pêwîst be jî, gava peyv paşbendan digirin, bilêvkirin bandorê li nivîsandinê dike û koka kelîmeyan carna diguherîne. Bi rastî ev divê wanî jî be. Lewra çi tiştê tê nivîsîn, ji bo xwendinê; ji bo bilêvkirinê ye. Bilêvkirin jî çiqasî asan be, ziman wî çendî şayik û vekirî dibe. Ji ber vê jî meriv dikare bibêje; bilêvkirin li ser rastnivîsînê weke mîhengekê cih dilize. Belê tengasiya li ber vê qaîdê; li her derê mîna hev nayê pêkarkirin. Wek babeta -î, -û, -ê ya berya -y, -yê... Ji xwe babeta me jî ev e.

a) Rastnivîsîna -î, -yê berya -y, -yê:

Bi baweriya min -y bilindekên berî xwe nerm dike. Çendî li cihnan nerm nake jî, meriv dikare wan netê bihesibîne. Bi taybetî em vê nermbûnê li -î, -yê bêhtir dibînin. Li gor vê jî baweriya me ya di derheqê -î, -yê de nermkirina wê ye.

Nimûne: Tirî+yê reş = Tiriyê reş
Derî+yê malê = Deriyê malê

b) Rastnivîsîna -ê, -yê berya -y, -yê:

Bêguman herfa -y, -ê, -yê, jî nerm dike. Lê -ê vedigere -î, -yê rastê dîsa nerm dibe -î. Bêguman peyvîn bi -ê, bi dawî dibin gişt na, hinek ji wan werê dibin.

Nimûne: Dê + ya min = Diya min

Gava peyva diya min bi lêv dibê, xuya dibe ku dengê -î, -ya berya -y, -yê bi bilindek e, yanî nêzîkî -î, -yê, ye. Ji xwe cîderka -ê, -û, -

î yet e. Wek nimûne: Peyva qêrîn' bi awayê qîrîn, "şerîn" bi awayê "şîrîn" jî tê gotin û hwd. Ji ber vê sebebê qenaeta me, yan divê -ê wek xwe bimîne, yan jî eger emê nerm bikin divê vegere -î, -yê. Lewra gava "dê+ya min" bi şiklê "deya min" were nivîsîn, dibe ku bi hinek peyvan re were tevlihevkirin.

Nimûne: Deya min: Koma pûşê min
Deya min: Dayika min

Meriv dikare vê nimûnê li hemî peyvîn bi vî rengî bigire.

Baweriya me ya derheqê van herdu babetan de ev e.

Nûbihar

ALİ KARADENİZ

Wekî ku hûn jî dizanin hêj jî di gramer û rastnivîsa zimanê kurdî de hinek alozî û gengeşî didomin. Her çi heta îro li ser rêziman û rastnivîsa kurdî gelek tişt hatîbin nivîsandin jî ber ku heta îro di vî warê de otorîte-yek serdest pêk nehatîye em hêj jî negîhiştine encamekê bi dest bixin me xwest em fikir û dîtinêni li ser rêziman an jî rastnivîsê biweşînin. Em hêvidar in ku di dawiya van nîqaşan de em bigîhêñ encamê.

ENSTİTUYA KURDÎ YA STENBOLÊ

Sê berhemên nû ji Ensîfuya Kurdî



Em dikarin van her sê berhemên xwe yên nû bi riyêñ cur
bi cur bigihînin we

Ji Ensîfuya Kurdî bixwazin
Buhayê pirtûkan 1.000.000 TL
Nimroya Hesabê me ya Banqeyê:
Turabi Şen 1050300 Türkiye İş Bankası Aksaray Şubesi /
İstanbul

